

T.C.  
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ  
SANAT TARİHİ ABD  
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ BİLİM DALI

**ŞÊRZAD HESEN'İN 'HESAR VE BABAMIN KÖPEKLERİ ROMANI'NDA  
KARAKTERİN TEMELİ'**

YÜKSEK LİSANS TEZİ

HAZIRLAYAN: Sarhang Omar Ali ALI

DANIŞMAN: Doç.Dr. Vecihi SÖNMEZ

VAN – 2016

K.T.  
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ YA WANÊ  
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYÊ  
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

**BINGEHÊ KARAKTER DI ROMANA HESAR Û SEGÊN BAVÊ MIN YA  
ŞÊRZAD HESEN DE**

TEZA LÎSANS A BILIND

AMADEKAR: Sarhang Omar Ali ALI

ŞÊWIRMEND: Doç.Dr. Vecihi SÖNMEZ

K.T  
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ YA WANÊ  
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYÊ  
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

**BINGEHÊ KARAKTER DI ROMANA HESAR Û SEGÊN BAVÊ MIN YA  
ŞÊRZAD HESEN DE**

TEZA LÎSANS A BILIND

AMADEKAR: Sarhang Omar Ali ALI

VAN – 2016

## TEZA LÎSANSÂ BILIND

Sarhang ALI

ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ YA WANÊ  
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYÊ  
Haziran, 2016

### **BINGEHÊ KARAKTER DI ROMANA HESAR Û SEGÊN BAVÊ MIN YA ŞÊRZAD HESEN DE**

#### **KURTE**

Mijara lêkolîna me bi navê 'Bingehê Karakter Di Romana Hesar û Segên Bavê Min De' ya Şerzad Hesen e. Me di vê lêkolînê de rêbaza 'Teorî' û 'Şîrovekirin' bikaraniye

Karakter weke her regezeke din ê di nava romanê de cihekî berfireh di nava romanê de pêktîne. Ji ber ku weke kesayetiya mirov xwediyê taybetmendiyên xwe yên taybet e. Herwiha karakter beşeke serekî ya di nava teksta romanê de ye û rolekî giring di bingehê romanê de dileyîze. Ji ber beşdarkirina ligel beşên din ên navaromanê, diyar dibe. Pêwîste kesayetî eşkere û zindî bin, ligel fikrê romanê biguncin. Ev lêkolîn ji 4 beşan pêk tê û beşa yekemîn jî ji çîwar bendan pêktê. Di benda yekemîn de me pênaseya roman, pûxt û giştî ji bo romanê kiriye. Di benda duyemîn de jî behsa giringiya romanê hatiye kirin. Herwiha di benda sêyemîn de jî behsa pêkhate (çarçove) û mezinahiya romanê bi awayekî giştî hatiye kirin. Di benda dawî yanî beşa çaremîn de jî behsa plot hatiye kirin û hatiye şîrovekirin. Di beşa düyemîn de jî behsa 'Hêmayên Derve û Hundir ên Romanê' hatiye kirin. Ev beş jî ji sê bendan pêktê. Di benda yekemîn de bi çend xalan behsa Hêmayên Hundirê Romanê hatiye kirin. Ew jî evin; Çarçoveya Bikaranîna Hundirê Romanê. Benda duyemîn jî Çarçoveya Pêkhateya Romanê digire nava xwe. Di benda duyemîn de jî behsa Hêmayên Derve yên Romanê hatiye kirin, ew jî du bend û arasteyên cûda digire nava xwe. Ew jî evin: Gûşenîga û Corên Gûşenigayan. Ew jî 5 corên gûşenigayan hene. Corên wan jî evin: "Goşenîgaya Derve, Goşenîgaya Hundir, Goşenîgaya Vala (Sifir), Goşenîgaya Berçav û Nimayîşkirî (Niwandî), Goşenîgaya 'Min' a Hatî Vegotin" Di benda sêyemîn de jî behsa Biwêj û Corên Biwêjan hatiye

kirin. Corên wan jî evin; "Kesê Yekemîn, Kesê Dûyemîn, Kesê Sêyemîn ê Hemû Tiştê Dizane "

Min hewl daye ku di beşa sêyemîn a lêkolînê de beş û pênaseyên karekter lêkolîn bikin. Ev beş ji çar bendan pêktê. Di benda yekemîn de behsa pênaseyên karekter hatiye kirin. Benda duyemîn ji du xalan pêk tê, behsa giringiya karekter û karektersazî di nava romanê de hatiye kirin. Benda sêyemîn ji bo taybetmendiyên karekter hatiye veqetandin. Benda çaremîn jî taybet li ser corên karekter e û bi dû xalan behsa wan hatiye kirin. Xalên wê jî, 'Erkê Karekter Di nava Romanê De' û 'Pêkhatiya Karekter Di Romanê De.' Di van herdu xalên benda çaremîn de di warê erk de bi awayek teorî behsa Karekterê Serekî û Karekterê Navîn hatiye kirin. Herwiha di warê pêkhatiyê de behsa Karekterê Tê Gûhertin û Karekterê Nayê Gûhertin hatiye kirin. Beşa Çaremîn û ya dawiyê ya lêkolîna me jî ji praktîzekirina lêkolîna me pêktê. Bi awayek berfireh û dirêj behsa hemû karekter û kesayetiyên di nava romanê de hatiye kirin. Şêzad Hesên di romana 'Hesar û Segên Bavê Min De' giringî daye herdu karekteran, ango karekterê serekî û karekterê navîn. Bêyî cûdahî, rol, erk û pêkhatiya wê diyar kiriye. Herwiha di romanê de ji bilî karekterê romanê, ajal xistiye berî rolê karekter. Wek; seg, meymûn û pişik. Rojnamevan bi awayek serkeftî navên kurdî yên weke; 'Zûlêxa, Hebê, Rabî û Zîba' ji bo karekteran bikaraniye. Vegêrandina çîrokê jî daye karekterê serekî û ew jî kurê mezin ê bav e. Di romanê de navê wî nehatiye û weke bav bê nav e. Romannivîs tevî sûdwegirtina ji beş û teoriyên derûnî, sûd ji pêlên hiş wergirtiye. Romana Hesar û Segên Bavê Min, yek ji corên romana nûjen a Kurdiye. Xwendekarên romanê her ji despêka romanê ve digihin encama dawî ya romanê ku bavo dimire. Lê çima hest bi çawaniya wî karî, ber bi dawiya romanê ve diçe. Karekterê despêkê yê romanê, kurê mezin ê bav e. Her weke bav, navek jêre nehatiye diyar kirin. Şêzad Hesên di roman 'Hesar û Segên Bavê Min De' li hemberî deshîlata bavîksalarî (Deshîlatdariya Bav) radibe û bi rêbazên derûnî şîroveya Froydî di nava zererên vê pîrsgirêkê guftûgo dike. Ev romana kurt behsa bavek dîktator dike. Heta tû bêjî bi awayekî dîktatorî û dij-mirovane ligel zarok û jinên xwe tevdigere. Li aliyekî din jî heta serê çokên xwe di deryaya şehwetbazî (fehlbazî) û seksê de niqûm bû.

Kilîlê peyvvan : Hesar

Jimareyên rûpel : 82

Şêwirmend : Doç.Dr. Vechi SÖNMEZ

Yüksek Lisans

Sarhang ALI

YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ  
Haziran, 2016

**ŞÊRZAD HESEN'İN 'HESAR VE BABAMIN KÖPEKLERİ ROMANI'NDA  
KARAKTERİN TEMELİ'**

**ÖZET**

İnceleme konumuzun adı Şêrzad Hesen'in 'Hesar ve Babamın Köpekleri Romani'nda Karakterin Temeli' dir. Bu incelemede 'Teori' ve 'Yorumlama' tarzını kullandık.

Her tür gibi, karakter de bu romanda geniş yer tutmaktadır. İnsan kişiliği gibi kendine has özellikleri vardır. Ayrıca roman metninde karakter esas bölümlerden biridir ve romanın temelinde önemli bir rol oynamaktadır. Romanın diğer bölümlerine geçişte bu kendini gösteriyor. Kişiliklerin canlı ve açık olması ve romanın ana teması ile uyumlu olması lazım.

Bu inceleme dört bölümden oluşuyor. Birinci bölüm de 4 maddedir.

Birinci maddede romanın içeriğini ve genel hatlarını tanıttık. İkinci maddede romanının önemini anlattık. Üçüncü maddede genel olarak romanın büyüklüğü ve çerçevesini ele aldık. Dördüncü ve son bölümde de, romanın örgüsü (plot) konu alındı ve yorumlandı.

İkinci Bölüm, 3 maddeden oluşuyor ve genel olarak 'Romanın Dış ve İç Unsurları' ele alındı. Birinci maddede, bir kaç alt şıkta Romanın iç unsurlarını ele aldık ki o da; Roman içeriğinin çerçevesidir. İkinci maddede, Romanın dış unsurlarını ele aldık. Bu da 2 alt madde ve değişik yönelimler içermektedir ki, bunlar da; bakış açısı ve çeşitleridir. Bunlar da "Dış, İç, Görünmeyen, Görünen ve Gösterilen" olmak üzere beş taneden oluşuyor. 'Min' açısından üçüncü maddede deyim ve deyim çeşitleri konu edilmiştir. Bunlar da, Birinci kişi, ikinci kişi ve herşeyî bilen üçüncü kişi.

İncelemenin üçüncü bölümünde, bölümleri ve karakterleri tanıtmaya çalıştık. Bunlar da dört maddeden oluşuyor; Birinci madde, karakterin tanıtılması ile ilgilidir. İkinci madde iki alt bendden oluşuyor ki onda da, karakterin önemi ve romanda karakter oluşturmanın önemi üzerinde durduk. Üçüncü madde karakterin özelliklerine ayrılmış. Dördüncü madde de karakter çeşitleri üzerinde duruldu ki bunun alt bendleri “Romanda Karakterin Görevleri” ve “Romanda Karakterin Oluşumu” dur. Dördüncü maddede teorik olarak esas karakter ve ikinci karakterin görevleri konu edilmiştir. Ayrıca, oluşumları itibarı ile ‘Değişen Karakter’ ve ‘Değişmeyen Karakter’ konu alınmıştır.

Dördüncü ve son bölüm ise araştırmamızın pratikleştirilmesinden oluşuyor. Oldukça geniş ve uzun bir şekilde romanın karakter ve kişilikleri anlatılmıştır.

Şêrzad Hesên ‘Hesar ve Babamın Köpekleri’nde her iki karaktere ya da başkarakter ve orta karaktere önem vermiş. Ayrım yapmadan, rol, görev ve içeriğini ortaya koyuyor. Ayrıca romanda, roman karakterleri dışında, köpek, maymun ve kedi gibi bazı hayvanlara karakter rolü vermiş. Yazar, aynı zamanda Kürtçe isimler olan ‘Zûlêxa, Hebê, Rabî û Zîba’ karakter adlarını başarılı bir şekilde kullanmış. Hikaye anlatımını da başkarakter olan büyük oğula vermiş. Romanda o da babası gibi isimlidir. Yazar, psikoloji alan ve teorilerinden yararlandığı kadar bilinç dalgalarından da yararlanmış. ‘Hesar ve Babamın Köpekleri’ çağdaş Kürt roman örneklerinden biridir. Okur, daha romanın başında, romanın son kısmı olan babanın ölümünü öğrenir. Ama gelişim ve sebeplerini akış içinde öğrenir. Başkarakter büyük oğuldur. Baba gibi onun da ismi romanda geçmiyor. Şêrzad Hesên bu romanda ataerkil sisteme baş kaldırıyor. Freud’un psikolojik yöntemleri ile bunun zararları üzerinde duruyor. Bu roman özet olarak diktatör bir babayı anlatıyor. Çocuk ve eşlerine karşı çok acımasız ve zalimdir. Aynı zamanda şehvet ve seks bataklığına da boğazına kadar batmış durumdadır.

Anahtar Kelimeler : hesar

Sayfa Adedi : 82

Tez Danışmanı : Doç.Dr. Vechi SÖNMEZ

Master Thesis

Sarhang ALI

YUZUNCU YIL UNIVERISTY  
SOCIAL SCIENCES INSTITUTE  
June, 2016

**BUILDING CHARACTER IN SHERZAD HASSAN’S THE COTTAGE AND  
MY FATHER’S DOGS NOVEL**

**ABSTRACT**

The study subject is about building character in Sherzad Hassan’s (The Cottage and My Father’s Dogs) novel. In this study, both analytical and descriptive methods are used which also theoretically and practically has been worked on.

Character is included a wide range in a novel like any other features of novel because it has its own characteristics like human beings, also character is a main aspect in a novel context, it plays an important role in novel which is appeared with other aspects. All the characters must be clear and alive in order to fit the event and the idea of the novel.

This study consisted of a preface and four sections, section one is divided into four parts. First part includes a brief definition of novel generally. In second part, importance of novel has been discussed. In third part, the target is to talk about the structure and the size of novel generally. Finally, plot has been described and tried to analyze it. Second section, it is named as internal and external symbols of novel, is divided into three parts. In the first part, internal symbols have been discussed in two branches which are: utility frame of internal novel and structural frame of novel. In the second division of the second part, external symbols have been discussed in which it has broken down into two branches: line of vision and types of line of vision which also includes five types: external line of vision, internal line of vision, empty line of vision, pretending line of vision, and my narrative line of vision. The third section of this study discusses narrator and types of narrator (first person, second person, and third person who knows everything). In the third section, the term and



definition of character are studied; this section has divided into four parts. The first part is discussing and defining character, the second part is linked to two different branches of importance of character and characterizing in novel. The third part is prepared to characteristics of character. The fourth part is specialized to the types of character which includes two branches: character's duty in novel and character's form in novel, in both branches in terms of duty, major and minor characters are discussed theoretically; also dynamic and static characters are discussed. The fourth section which is the last section of this study is the practical of the study; it is widely discussed about all the characters and personalities in the novel. Sherzad Hassan, in *The Cottage and My Father's Dogs* novel, considered both characters, major and minor indifferently. He has set up the role, duty, and form of each character, also except human beings, animals played role of character such as: dog, monkey and cat. The novelist successfully used Kurdish names for the characters such as: Zuleykha, Habe, Rabi, and Ziba, the narrator is the major character who is the oldest son of his father, yet his name is not mentioned as well as his father. However, the novelist got benefit from the concepts and theories of psychology; he also got benefit from pedagogical waves.

*The Cottage and My Father's Dogs* is a kind of Kurdish modern novel, reader can get the results of the novel from the beginning which is about killing father, the feelings and expectations are ongoing along with the end of the novel. The narrator character is the oldest son of the father; he is not named as his father. Sherzad Hassan, in the novel, is challenging the man power which is used badly, he is trying to solve the issues of the cottage by Freud's method. This novelette is describing a tempered and a dictator father who is behaving in a bad way with his children and his wives, in addition to that, the man is very much addicted with sex.

Key Words : hesar

Quantity of Page : 82

Thesis Supervisor : Doç.Dr. Vechi SÖNMEZ

## SĪPAS KĪRĪN

Ez pir spasiya mamosteyên hêja û rêzdar ên beşê kurdî li Zanîngeha Yuzuncu Yilê dikim ku bi ked û dilsoziyeke herî mezin bi me re westiyan. Herwiha ez pir spasiya (Dr. Vechî Sönmez) dikim ku erkê serpereştiya vê lêkolînê li stûyê xwe girt û spasiyeke min a bêhed ji birêz (mihemmed orhan) re heye, pir alîkariya min kir. Herwiha ez spasiya wan hemû kesên hêja û ezîz dikim ku alîkariya min di nivîsandina vê lêkolînê de kirin. Li dumahî de ev xebat peşkeş bi hemî malbata xwe dikim û gelek sipasiye wan jî dikim.

**Sarhang Omar Ali**

## NAVEROK

KURTE .....	I
ÖZET .....	III
ABSTRACT.....	V
SİPAS KİRİN.....	VII
NAVEROK .....	VIII
KURTBÊJÎ.....	XIII
DESTPÊK .....	1
1. PÊNASEYA Û GIRINGIYA ROMAN .....	3
1.1. Pênaseya Roman .....	3
1.2. Giringîya Roman .....	6
1.3. Pêkhatin û Qebareyên Roman .....	8
4-Plot.....	10
2. HÊMANÊN NAV Û DERVEYE ROMAN.....	12
2.1. Hêmanên Çarçoveya Hundirî Romanê .....	12
2.1.1. Çarçoveya bikaranîna hundirî roman .....	14
2.1.2. Hêmanên çarçoveya pêkhatyê roman.....	14
2.2. HÊMANÊN ÇARÇOVEYE DERVAYÊROMANÊ EVIN: .....	15
2.2.1. Goşenîga .....	15
2.2.1.1. Cureyên gûşenîgayan .....	15
2.3. Biwêj.....	20
2.3.1 Curên biwêj: .....	22
3. ÇEMK Û PÊNASEYA KAREKTER .....	26
3.1. Karakter Çiye .....	26
3.2. Giringîya karakter.....	28
3.2.1. Karakter û çêkirina karakter di romanê de .....	29
3.2.2. Taybetmendiyên karakter .....	31
3.3. Curên Karakter .....	33
3.3.2. Karakter di warê pêkhatyê de.....	35
CÛRÊN DIN ÊN KAREKTERAN .....	38
A-Karakterên pir awayî.....	38

B-Karakterê nimayîşkirî (niwandî) .....	38
4. KAREKTER DI ROMANA " <i>HESAR Û SEGÊN BAVÊ MIN</i> " DE .....	40
YA ŞÊRZAD HESEN .....	40
KAREKTER.....	40
KAREKTER Û CIH.....	43
KAREKTERÊN ROMANÊ .....	44
KAREKTERÊ BIWÊJ 'KURÊ MEZIN' .....	44
BAV WEKE KAREKTERÊ DI NAVA ROMANÊ DE.....	50
XWIŞKÊN BIWÊJÊ KURÊ MEZIN .....	53
ZÛHRÎ .....	56
ZÎBA .....	57
BIRAYÊN BIWÊJÊ, KURÊ MEZIN .....	58
GUFTÛGOYÊN KAREKTERAN .....	59
ZÎWAN .....	62
KESAYETÎ RABÎ.....	64
KARESATA JIN ANÎNÊ KAREKTERAN .....	71
AZADÎ KAREKTERAN .....	72
CIHÊ MANA HEYWANAN (GOV):.....	73
REVA XWIŞK JINBAVAN .....	74
MÎRATÊN KAREKTERAN.....	75
HEWARA KAREKTERÊN:.....	75
DÛ DILIYA KAREKTERÊN:.....	76
GUHERTINA AJALAN WEK KAREKTERN .....	77
ENCAM.....	80
LÎSTEYA ÇAVKANIYAN.....	82

## **Pêşgotin**

Mijara lêkolîna me bi navê 'Bingehê Karakter Di Romana Hesar û Segên Bavê Min De' ya Şêrzad Hesên e. Me di vê lêkolînê de rêbaza 'Teorî' û 'Şîrovekirin' bikaraniye

Yek ji karakterên serekî yê romanê ye, rolek girîng û berbiçav di bingehê teksta romanê de dileyîze. Lewra behskirina her mijarek ji mijarên serekî yê romanê girêdayî karaktere û nabe karakter di nav de were paşguh xistin.

Li gor gûhertinên di despêka serhildana romanê de hatine serê romanê, karakter jî weke beşeke vê janrê para xwe ji guhertinê girtiye. Lewra di dema pênasê û beşan de, lêkolînavan û rexnegirên di warê romanê de dîtî û nêrînên cûda-cûda nîşan dane. Lê di encamê de di nava tekstê de karakter heman rolê xwe yê girîng leyîstîye û nabe bêyî wê roman were nivîsandin. Ji ber ku ger roman wênegirê jiyane be û ji hemû janrên din zêdetir derbirîne li êş, xem û xweşiyên mirov bike, wê demê karakter sedemê wê derbirîne ye. Romannivîs bi rêya wê ve, dîtî, nirxandin û gûşenîgaya xwe di nava tekstê de diyar dike.

### **Sedema Hilbijartina Mijarê:**

Herçendî di nava mijarên edebî û lêkolînan de hinek lêkolîn û mijarên zanistî li ser romanê bi giştî, rêgezên romanê bi taybetî û bi taybetir jî karakter hene. Lê bi hûrbîniyek li ser nivîskaran, ev tê diyar kirin lêkolînek germ di warê karakterê di romanê de hatiye kirin. Lewra min pêwîst dît ku li ser mijarek wiha binivîsim. Romannivîsek navdar ê Kurdistanê werbigirim û teza xwe ji wir destpê bikim. Ew jî romannivîs Şêrzad Hesên e. Ji ber naverokek ciwan û nêzî rastiyê ye, min romana 'Hesar û Segên Bavê Min' wergirtiye. Li vir jî navnîşana mijara me dibe 'Bingehê Karakter Di Romana Hesar û Segên Bavê Min' a Şêrzad Hesên de. Tevî ku li hinek cihan mijarên din xwe di lêkolînê de bi cih kirine, ev jî ji bo dewlimenkirin, dagirtin, qedandin an jî temamkirina mijarê ye.

### **Armanca Lêkolînê:**

Bêgûman armanca her lêkolînekê heye. Lewra armanca vê lêkolîna me jî nasandina romanê bi giştî û bi taybet jî karakter e. Armanca me dewlimendkirina pirtûkxaneyê Kurdî bi giştî û bi taybet jî ferhenga wêjeyî ye.

### **Astengiyên Li Pêşiya Lêkolînê**

Bê guman di her nivîsîn û mijarekê de, gelek pirsgerêk û astengî derdikevin pêşiya lêkolînan. Di vê lêkolînê de jî kêmiya çavkaniyên pêwîst ên li ser vê mijarê, bi taybet çavkaniyên bi zimanê Kurdî û kêmiya dema nivîsîna vê mijarê astengiyên serekî bûn.

### **Rêbaza Lêkolînê**

Di vê lêkolînê de me rêbaza 'Wesfî û Şîrovekirin' girtiye dest. Bi awayê ku di despêkê de bi awayek teorî me karên xwe qedandine û piştê jî bi awayek pratîkî. Ligel min ev rêbaz, ji bo lêkolînek bi vî awayî rêbaza herî serkeftî ye.

Di vê lêkolînê de ji bo rêxistinîna çavkaniyan; em dû rêbaz bikaranîne. Ya yekemîn, ku me zanyari jê wergirtine û me di perawêza rûpelan de bal kişandiyê ser: Ya duyemîn jî taybet li ser bendên di romanê de hatine wergirtin: Her li kêleka wan nave romanê û hêjmara rûpelan hatiye nivîsandin.

### **Beşên Lêkolînê**

Ev lêkolîn ji 4 beşan pêk tê û beşa yekemîn jî ji 4 bendan pêktê. Di benda yekemîn de me pênaseya roman, pûxt û giştî ji bo romanê kiriye. Di benda duyemîn de jî behsa giringiya romanê hatiye kirin. Herwiha di benda sêyemîn de jî behsa pêkhate (çarçove) û mezinahiya romanê bi awayekî giştî hatiye kirin. Di benda dawî yanî beşa çaremîn de jî behsa plot hatiye kirin û hatiye şîrovekirin. Di beşa duyemîn de jî behsa 'Hêmayên Derve û Hundir ên Romanê' hatiye kirin. Ev beş jî ji sê bendan pêktê. Di benda yekemîn de bi çend xalan behsa Hêmayên Hundirê Romanê hatiye kirin. Ew jî evin; Çarçoveya Bikaranîna Hundirê Romanê. Benda duyemîn jî Çarçoveya Pêkhateya Romanê digire nava xwe. Di benda duyemîn de jî behsa Hêmayên Derve yê Romanê hatiye kirin, ew jî du bend û arasteyên cûda digire nava xwe. Ew jî evin: Gûşenîga û Curên Gûşenigayan. Ew jî pênc curên gûşenigayan

hene. Curên wan jî evin: (Goşenîgaya Derve, Goşenîgaya Hûndir, Goşenîgaya Vala (Sifir), Goşenîgaya Berçav û Nimayîşkirî (Niwandî), Goşenîgaya 'Min' a Hatî Vegotin). Di benda sêyemîn de jî behsa Biwêj û Curên Biwêjan hatiye kirin. Corên wan jî evin; (Kesê Yekemîn, Kesê Dûyemîn, Kesê Sêyemîn ê Hemû Tiştê Dizane )

Min hewl daye ku di beşa sêyemîn a lêkolînê de beş û pênaseyên karakter lêkolîn bikin. Ev beş ji çar bendan pêktê. Di benda yekemîn de behsa pênaseyên karakter hatiye kirin. Benda duyemîn ji du xalan pêk tê, behsa giringiya karakter û karektersazî di nava romanê de hatiye kirin. Benda sêyemîn ji bo taybetmendiyên karakter hatiye veqetandin. Benda çaremîn jî taybet li ser corên karakter e û bi dû xalan behsa wan hatiye kirin. Xalên wê jî, 'Erkê Karakter Di nava Romanê De' û 'Pêkhatiya Karakter Di Romanê De.' Di van herdu xalên benda çaremîn de di warê erk de bi awayek teorî behsa Karakterê Serekî û Karakterê Navîn hatiye kirin. Herwiha di warê pêkhatiyê de behsa Karakterê Tê Gûhertin û Karakterê Nayê Gûhertin hatiye kirin. Beşa Çaremîn û ya dawiyê ya lêkolîna me jî ji praktîzekirina lêkolîna me pêktê. Bi awayek berfireh û dirêj behsa hemû karakter û kesayetiyan di nava romanê de hatiye kirin.

Di nivîsîna vê lêkolînê de me sûd ji çend çavkaniyan kevin û nû wergirtiye. Min ew çavkaniyan bi zimanê Kurdî, Erebî û Farisî di dawiya lêkolînê de bi awayek zanistî rêz kiriye. Di dawiyê de jî kurtiya (soje) lêkolînê bi zimanê Tirkî û Inglîzî hatiye nivîsandin. Hêvîdarim ku me karîbe bi vê lêkolînê çend peyv li ser ferheng û wêjeya Kurdî zêde kiribe. Bê gûman ti lêkolînek bê kêmasî nîne. Lewra ev lêkolîna me jî para xwe ji van kêmasiyan girtiye, lê nabe ev kêmasiyand bibin sedem ku ev lêkolîn bînirx bibe.

## **KURTBÊJÎ**

**Amd. : AMADEKAR**

**Ç. : ÇAP**

**S. : SAL**

**Dr. :DIKTOR**

**J. : JIMAR**

**R. : RÛPEL**

**Wer. : WERGER**

**h.w.d. : HER WEKÎ DIN**

**h.b. : HEMAN ÇAVKANÎ**



## DESTPÊK

Rewşa civakî bandorek berbiçav li ser hûner û beşên edebî dike. Ji ber edebiyatê peywendiyek bêyî ku bê qût kirin ligel rewşa siyasî û aborî heye, beşek zêde ya awa û beşên edebî, naverok û form sûd ji van herdu beşane wergirtine. Di vê derbarê de Lwîsin Goldmen wiha dibêje: Di nava beşên edebî de, roman forma herî taybetmend a edebiye ku peywendiyên rasterast ligel rewşa aborî heye. Ew romanê weke hemaseya mejî û mantiqê mirov datîne, ji bo afirandina cîhanek ku ew dixwaze û qehremanê romanê weke qehremanek 'Xwedî Pirsgirêk' bi nav dike. Goldmen dibêje: 'Kesayetiya Problomatîk' nayê wateya 'Kesayetiye Pirsgirêkê Diafirîne', belkî tê wateya pêkhatiya jiyan û li pêşberî pirsgirêkan datîne, çareser nake û nikare zanyariyên zelal li ser van pirsgirêkan bidestbêne. Goldmen vê taybetmendiye weke taybetmendiya herî bingehîn a ji bo cûdahiya qehremanê romanê ligel qehremanê trajediyê diyar dike. Hatina vê qehremaniyê ya di nava edebiyata Kurdî de, li gor edebiyata cîhanî taybetmendiyeke cûda heye. Bê gûman ev cûdahî çavkaniya xwe ji gelek rewşan werdigire. Di edebiyata cîhanî de roman berî çîrokên kurt serî hildaye, lê ev yek di edebiyata Kurdî de berevajiyê. Ango çîrokêbi salan berî di nava edebiyata kurdî de serî hildaye. Em dikarin behsa du sedemên serekî bikin.

Yekemîn Nivîsandina romanê ji ber form û awayên taybet xwediyê derfetên berfirehtir û rewşekî baştir e. Koçkirina neçarî ya ber bi Ewrûpa ve, heta astekê bêyî metirsiya siyasî li Ewrûpa bû sedemê yekemîn romana Kurdî. Erebe Şemo yan jî Erebe Şamîlof (1897-1978) yekemîn romana Kurdî bi zaravayê Kurmancî û bi navê 'Şivanê Kurmanc' an jî 'Şivanê Bakûr' li sala 1935'an li Ermenîstanê belav kiriye. Şemo ji Kurdên Rûsyayê bû û li navenda Rojhilatnasî ya Zanîngeha Lenîngradê bi karûbarên edebî û ferhengî ve mijûl bû. Bi berdehamî karê rojnamevanîyê dikir. Erebe Şemo weke bavê romana Kurdî tê bi nav kirin û berhemên wî neynika civaka Kurdî ne. Şemo ji bilî 'Şivanê Kurmanc' û romana 'Dimdim' ya tekane romana wî ya dîrokî ye nivîsandiye. Çîroka Kelha Dimdimê di edebiyata devkî ya Kurdî de xwediyê cih û giringiyek taybet e. Şerê Dimdim şerek di navbera Sefewî û Kurdan de bû. Ev şer li navçeya Biradost a li derdora Urmiyê qewimî bû. Ji romannivîsên rûniştvanên Yekîtiya Sovyetê, mirov dikare

behsa Elî Ebdûlrehman, Seîd Îbo, Hacî Cundî û Egîd Codo bikin. Pirtûkên van nivîskaran hemûyan jî ligel Îranê hatine çap kirin. Li başûrê Kurdistanê jî rewşa nexweş, aloziyên siyasî, dijberiya rejîma Baasê ya li beramberî her çalakiyekî ferhengî yên Kurdî, astengiyek herî mezin a li hemberî nivîskarên Kurd bû. Nivîskar û siyasetmedarê Kurd Îbrahîm Ehmed li sala 1956 romana 'Jana Gel' nivîsî. Lê ji ber rewşa xirab û zextên rejîma Baasê ya Iraqê heta sala 1972'an nekarî belav bike. Îbrahîm Ehmed beşeke romana xwe li Silêmaniyê di rojnameya Rizgarî de belav kir. Ji bo rizgarbûna ji bo sansor û piştgiriye, ew pirtûka xwe pêşkêşî şervanên El-Cezayîrî kir. Beşek zêde ya nivîskarên Kurd ji ber nebûna rewşa aram û bêderfetiye, berhemên xwe li Ewrûpa çap dikirin. Ev jî bû yek ji sedemên herî girîng ku gelê Kurd nekarî romanê baş nas bike. Rehîm Qazî yê ji Rojhilatê Kurdistanê romana xwe ya yekemîn li sala 1961'an li Îranê belav kir. Marûf Xeznedar û Cemal Nebez ji wan nivîskaran bûn ên berhemên xwe li Almanya û Mosko belav kirine. Piştî salên 1980'an, romana Kurdî bi awayekî zêdetir û germtir derket holê. Li aliyekê rewşa siyayî û li aliyê din jî zêdebûna asta xwendekarên Kurd û nivîsîna bi Kurdî, bû sedem ku nivîskarên Kurd bi awayek cûdatir romanên xwe binivîsînin. Vegerênadina pirsgerêkên civakî û siyasî bi forma realîzma cadûyî ya ji bo Bextiyar Elî û sosyalîzîm ji bo Şêzad Hesên, yek ji rêbazên rizgarbûna ji awayên berê bû. Ji nişkan ve naveroka beşek zêde ya romanên Kurdî cihê xwe ji pirsgerêkên penaberan, şideta li hemberî jinan, heskirin û hestên mirov re hişt. Şêzad Heynî di romana xwe ya bi navê 'Şewitîna Berfê-Sotanî Befir' û Enwer Mihemed di romana 'Dostê Segê-Seg Dost' de behsa pirsgerêkên penaberan dîkin. Şêzad Hesên di pirtûka 'Hesar û Segên Bavê Min' de li hemberî sîstema bavîksalarî (Deshilatdariya Bav) radiweste û bi rêbaza 'Derûn-Pîskoloji' şîroveya Froyd zererên vê pirsgerêkê guftûgo dîke

# 1. PÊNASEYA Û GIRINGIYA ROMAN

## 1.1. Pênaseya Roman

Roman wek çarçoveya herî kevin tê danîn û gelek kevnar e. Yan jî mirovan bi awayek bi berdewamî bi rêya vê vedigêre, bi awayekî nerasteras ji hev serpêhatî vedigotin û bi wê yekê ve mijûl bûn. Di vî warî de mirov dikare bêje dîroka vegêranê vedigere serdemên ku mirov fêrî axaftinê bûne..... Bûyer û serpêhatiyên wan bi awayên cur be cur ji hev re vegotine. Di wêjeya Romanî ya nivîskî ya Cemal Mîr Sadiqî de wiha tê gotin: "*Wêjeya Romanî (Fiction) ne amajeyeke ji bo nivîsên honandî û çî tişteke xeyalî hebin, zêdetir bi çîrok, roman û awayên cûda yên peywendî bi romanê ve hene, jêre 'Wêjeya Romanî' tê gotin. Vêca şerte ev biwêje (Destewaje), lîstika nameya honandî, germî (hemas), trajedî û komediyê nagire nave xwe. Yanî honandinên gotin û şahî yên bi awayê 'Weys û Ramîn' ên Fexredînê Gurganî, 'Xosrew û Şîrîn' ên Ebû Mihemed Ilyas Nîzamî, 'Ciwantî û Germî - Gencewî û Hemaseya' Şaname ya Ebûlqasim Fîrdewsî, ji wan re Romanên Toreyî nayên gotin. Ev şûnwarane di bazinê wêjeya 'Literature' ango taybet de tîn bi cih kirin.*"<sup>1</sup> Yan jî divê bi wê yekê bê pênase kirin ku "*hûnerekî zimaniye û bi hevokan derbirînê (Guzarişt) li naverokê dike*".<sup>2</sup>

Ji ber giringiya wê bi gelek awayan hatiye pênase kirin. R. Malbîrîs jî wiha dibêje: "*Roman hunerek cîhaniye û armanca wê cih girtina hemû hûnerên wêjeyî ye.*"<sup>3</sup> Eger li gor van pênaseyên jor be, ziman yek ji wan kerestiyên din ên girînge ku dibe bingehê pêkanîna tekstek edebî. Bi awayekî din roman ew hûnere ku armanca wê cihgirtina cihê hemû cûr û hûnerên din ên edebî ye. Di vê navberê de kariye bi awayek baş û berçav rol û giringiya xwe nîşan bide.

---

<sup>1</sup> Cemal Mîr Sadiqî, *Edebiyat Dastan*, Çapa Çarem, Behar, 1382,R10

<sup>2</sup> Mîr Celal Mihemed, *Binyatî Rûdaw Le Romanî Kurdî Başûr De*, Namey Master, 2008,R28

<sup>3</sup> R.M.Albîrîs, *Tarîx El-Rîwayet, El-Hedîf*, Wer: Corc Salim El-Baedet El-Maliwî, Mensûrat Erîdat, Beyrût, Libnan, 1967, R254

*Losyan Kuldman jî wiha dibêje: "Girtina wêneyê cîhanê bi awayê piralî ye." <sup>4</sup>*  
*Çarlîz Birêslêr jî " romanê weke pênaseya hûrîtiya wateya bandora takekesî û rasterast a jiyanê bi nav dike." <sup>5</sup>*

Mirov dikare piştgiriya van herdu pênaseyên jor diyar bike ku roman ew rêbaza edebî ya taybete ku li gor rêbazên din zêdetir giringiyê dide pirsgirêk û nakokiyên civakî. Hemû bandorên di nava civakê de vedigerîne ser rûpelên xwe, vê yekê jî bi dîtina romannivîs mirovekî sade yê di nava civakê de ye. Ji ber ku nikare xwe ji civakê cûda bike û kevneşopiyên civakê paşguh bixe.

Ji ber berfirehiya navber û mezinahiya romanê, mirov dikare mezinahiya romanê yekane cûr û berhemê edebîye ku xwediyê gelek mijarên cûr be cûre. Hemû pirsgirêkên kesan vebêje, bi awayekî dûbare bûyer, diyarde (fenomen) û serpêhatiya kesên di nava civakê de bi awayekî hûnerî û statîstîkî bilind darêjîne.

Herwiha di pirtûka 'Roman Çiye?' de ji aliyê gelek nivîskarên ve hatiye nivîsandin. Li gor dîtina gelek nivîskarên ku Cewad Mistefa wergera wan kirî, "*Roman awayekî taybet ê vegêrandin, dahênana çîroka dirêj û pexşaniye. Xwe dispêre realîzîm, berhemên ezmûn û xeyalên nû yên kesan.*" <sup>6</sup>

Îdward Morgan Forstêr jî di derbarê vê mijarê de wiha dinivîsîne: "*Roman vegotina bûyerên li pey hev e. Mînak; Nîvro piştî taştê (Kahvaltî) tê, sêşem li pey dûşemê ye, tunebûn (jinavçûn) li pey mirinê tê û her bi vî awayî.*" <sup>7</sup>. Weke me gotî roman ew cûreyê edebîye ku bi rêya vegêrandinê, komek bingeh û rêgezan ji çîrokê werdigirin. Bi piştî xwe girêdana bi çend bûyer û serpêhatiyên rastîn (realism), ligel wê jî nabe xeyal bê paşguh xistin û weke birbireya piştê ya romanê tê binav kirin. Bi wateya ku eger roman ji xeyal û fantaîzmê vala be, wê demê cûdahiyek mezin di navbera roman û

---

<sup>4</sup> Losyan Kuldman Waxiron, *El-Benîweyê El-Teekwîniyet*, Welneqît El-Edî, El-Naşîrî Mûesed El-Behat, El-Erebiyet, Çapî Yekem: 1984, R103

<sup>5</sup> Wer. Abdûlxaliq Yaqûbî, *Rexney Edebî û Qûtabxanekanî*, Pêşekiyek Bo Tiyorî Çarlîs Brêslêr, Çapî Dûwem, Hewlêr, 2007, R79

<sup>6</sup> Wer. Cewad Mistefa, *Komelêk Nûser*, Roman Çiye, Dezgay Mûkiryanî, Çapa Yekem, 2008, R73

<sup>7</sup> A. M. Forstêr, *Erkan El-Rîwayet*, Wer: Mûsa El-Asî, Dar, Çîrûsî, Çapa Yekem, Terablûs, Libnan, 1996, R32

berhemekî dokumenterî de namîne. Bikaranîn û arastekirina xeyalê jî girêdayî ezmûn û cîhana romannivîse ku ji romannivîsekê ji bo yeke din tê guhertin.

Di nivîsa çîroknivîsên despêkê de wiha behs tê kirin: "*Em romanê weke nivîsekê bizanin ku di romanê de bûyerên jiyane bi awayê bûyerên yek li pey yekê vedibêje. Dîtinên bi vî awayî yê ji bo romanê, gelek mijar ji ber xwe vê tînin gotin. Bi wateya roman hem çîroke, hem efsane û hem jî osture (Vehunandî) yan jî ne vehunandî ye û ji ber xwe ve tînin gotin. Hem jî çîroka bi awayê Ewrûpî, ango roman e.*"<sup>8</sup>. Ebdûlelî Destxeyb wiha behsa romanê dike: "*Roman (Kurt, dirêj an dûr) vegotîneke zêde nayê honandin, vegotina bûyer yan jî gelek bûyerên di cih û demên taybet an jî her niha de ye. Ew bûyer an jî bûyerên zêde, xwediyê gelek taybetmendiyên in û bûyeran ji bûyerên asayî cûda dike. Taybetmendiya herî girîng a dibe sedem û cûdahiya ji çîrokê, her bûyereke di romanê de ji ber bûyereke din û sedema bûyerên din e.*"<sup>9</sup>

Mirov dikare di vî warê de bêje taybetmendiyan romanê ewqas zêdene, lêkolînan nikare nîşanekê temam û zêde jêre dane. Ji ber ev rêbazekê edebîye. Ji ber ku di gelek aliyên de pantayîyek ewqas dûr û dirêj heye, ev jî wisa dike ku romannivîs di dariştina mijar û diyardeyan cûr be cûr de destvekirî û azad bin. Ev hemû jî wisa dikin ku roman xwediyê gelek bûyer, rastî û xeyalan be. Di bûyerên xeyalî û fantazî de, romannivîs gelek caran neçar dibe ku mijarên efsaneyî bike pergalek ji bo pêkanîna bingeheke teksta xwe ya edebî û armanca wî jî roman e. Di 'Hûnera Romanê' de wiha behsa romanê tê kirin: "*Roman ji hemû şûnwarên hûnerî yê nehonandî re tînin gotin ku berî zêdetir di warê dîroka rast de be. Xûliqandin û çêkirina hêza xeyalî, hizir û hûner nivîsandîye. Dibe ku roman li ser bingeheke dîrok û rastiyan bê danîn, yan jî bi giştî çavkaniya hêz, karîn, xeyal û hûnera nivîsî be. Di herdu rewşan de taybetmendî hatine cûdakirin. (Di nivîsên ne roman de) Fikra pênc hest û derûniya (pîskolojiya) xwendekar e"*<sup>10</sup> bi tam û bi sîd e. Romanên gelek mezin û berfireh xwendekaran pal (dehf) didin, lê armanca

<sup>8</sup> Reza Brahinî, *Qise Niwîsî*, Neşir El-Bîrz, Çapa Çaremîn, Tehran, 1368, R 40

<sup>9</sup> Tondro Salih, *Tofet Manî Skot*, Neşir Merkez, Çapa Yekemîn, Tehran, 1379, R 123

<sup>10</sup> Nasir Êranî, *Hîner Dastan*, El-Neşir Nî, Çapa Dûyemîn, Tabîstan, 1380, R 48

serekî ya hemû romanên ewe ku wê derfetê ji bo xwendekaran bafirîne ku her tiştê di cîhana romanê de hêjayî hestkirinê û bi xwe hest pê bike ye.

Pênaseyek din a cûdahiya navbera çîrok û romanê jî di nava xwe de bi cih dike, eve; "*Roman hûnerekeve vegotinê û cûdahiyên bingehîn heye. Pêkhatiyên klasîkî kom dike. Ango romanek li ser bingehê jiyana yek an jî çend kesên bûyerek hatine serê wan, li dijî hêzên derve û liberçavgirtina xebatê vedibêje. Heta digihe armancê, yan jî tevgerkirina dirêjîya demê û di çarçoveya rastiyeke romanî de. Bi xwe xwediyê gelek pêwendiyên sedem û bi armanca gihiştina dawiyek diyarkirî, bi xwe weke guhertinek mîsoger û bê vegeer e.*"<sup>11</sup>

Vegêrandin weke amêreke girîng di nava romanê de rol dileyîze. Eger mirov bi awayekî ne edebî temaşeyî vegêranê bike, tê dîtîn ligel ji dayîkbûna mirov vegêran jî her hebû. Dema ku mirovên despêkê nedikarin baxivin, bi rêya zimanê gewdeyî û dîtînê ve hewl dane ku bûyer û serpêhatiyên xwe ji bo kesên derdora xwe vegêrin. Piştî vegêrandin weke regez û bingehê hûnerî derbasî nava destan û çîrokan bû. Mirov dikare bêje romanê sûd ji çend rêbazên edebî û klasîkî wergirtiye. Bi awayekî din ê hûnerî û statîstîkê bergek din xistiye ber qonaxa vegêrandinê û kariye navê xwe bike 'Rêbaza Romanê'.

## 1.2. Girîngîya Roman

Gelek peyvan fêrî xwendekaran dike û zanist nikare wan fêr bike. Ne felsefe û ne jî ti fikrek din nikare wan fêr bike. "Wêje çavkaniya xwe ji derûn û hestên hunermend werdigire û dirije di nava derûn û hestên bêhempa de. Yek bi yek xwendekaran li pey hev tîne. Fîlozof, zanist û dîroknas nikarin karek ligel van çavkaniyan bikin, heta bikarin ligel baxivin û agehdariyan bide wan. Tenê destê helbestvan, rojnamevan û hunermendan digihe çavkaniyan û dikarin. Cozêf Konrad- "*Di xewnan de gihiştina hev, di xweşiyên de, di armanca û di hêviyan de, tirsê mirovahiyê dike yek an jî mirovan bi*

---

<sup>11</sup> Hûseynî Talîbyan, *Tewsîf Dir Dastan*, El-Neşîr Rişîs, Çapa Yekemîn, 1383, R 97

hev ve girê dide." *Jê fêm bike û bibîne, yan jî mirovan dilek hevbeş hene û ew keyfxweşiya daxwazên te bi xwe re têne ku tû çavê xwe li cîhanê bigerênî. Ev berteka (reaksyon, kardanewe) taybet bese, heta hûner, wêje û roman bibe xwediyê giringiya herî zêde. Herwiha tevgera herî zêde tamê dide hizra mirov e.*" <sup>12</sup> Yek ji taybetmendiyan romanê, rakêşana hizrên dîn, felsefe, dîrok û civakê ji bo xwendekaran û ji bo wan pal bide ye.

Yek ji taybetmendiyan din ên romanê ewe tamê bide ji ber ku xwendin an jî bihîstin dibe sedem ku dil aram bibe. Bi dîtina Arîsto şûnwarên hûnerê yên weke helbest, wêne girtin û peykertraşî tameke zêde didin. Fêrbûn tişteke ne tenê tama herî mezin dide dostên zanistê, belkî tamê dide eniya mirov jî.

Karîna hûnerî ya romana di warê agehdarkirina xwendekaran de, bi dîtina Arîsto xwediyê arancekî mezin e. Lê taybetmendiya hûnera romanê bi awayê neyê nirxandin û tiştê ji hunerên din zêdetir bi tam, wê derfetê ji bo xwendekaran diyar dike ku heta xwendekar xwe weke qehremanê romanê lê dike yan jî dixwîne. Heta di cîhana xeyalî de xwe datîne cihê qehremanê romanê û tû dibêjê qey ne di jiyana rast de dijî. Li aliyekî din jî bûyer, karesatên mezin û metirsiyên di jiyana qehremanê romanê de, bi taybet jî qehremanên romantîk (romansî) ên bûyerê ji bo xwendekar wek jiyaneke bi ahenge. Dibe ku westiyayî be. Qehremanên serekî yên romanê xwediyê tameke jiyaneke ya pir bi karesat, tejiyê têkbirin (sernefketin) û serkeftinên bê hempa ye.

Yek ji taybetmendiyan herî giring ên romanê sûdwegirtine. "*Di warê sûdwegirtina romanê de dîtina û nêrînên cûda hene. Yek ji wan dû nêrînan jî dîtina 'Hûner ji bo hûnerê tê dîtina û gel dike bihane, lê di rastiyê de tiştê ji huner û hûnermendiyê re tê xwestin, di xizmeta bîr û baweriyekî taybet de be. Yan jî di xizmeta dewletek xwediyê fikir û dîtînan taybet be... Dîtina din jî fikra (Nezriye) 'Hûner Ji bo Hûnerê' ye û ew jî diyar dike ku hûner awayê takekesî yê derûniye. Bi lihevdana 'Pirs*

---

<sup>12</sup> Nasir Êranî, *Hiner Dastan*, El-Neşir Nî, R 55-56

*Şêllî' straneke helbestvan tê gotin, heta 'Tenêbûna xwe bi guhertinên şîrîn dilgir bike û ji bilî xwe, ti armanceke wê ya din nîne.'*"<sup>13</sup>

Bi awayek giştî di nava lêkolînan û rexnegirên edebî de dû dîtînan cûda û dijî hev hene. Beşeke rexnegir û lêkolînanan li ser rol û erkê edebî zêdetir giringiyê didin dibistana 'Hûner ji bo hûnerê.' Bi dîtîna van rexnegiran pêwîste edebiyat tenê ji bo hilberîna statîstîk, tam û lezetê bê nivîsandin, ti nirx û bihayeke wê ji bo pirsgerêk û arîşeyên civakî neyê danîn. Li beramberî vê dîtîne, hinek rexnegir û filozofên din ên edebî xwe zêdetir ber bi aliyê 'Hûner ji bo jiyanê' ve dibin. Bi dîtîna ku tenê xwendekar ji bo tamwergirtin û sûdwergirtinê, mijarên edebî naxwînin, belkî xwendekar bi armanca zêdetir fêrbûn û asta zanyariyan bidestbênin dest davêjin van mijaran û hewl didin bixwînin. Yan jî dixwaze bi rêya rêbazên edebî ve çareseriyek kêrhatî ji bo pirsgerêk, xem, nexweşî û êşan bibîne. Ji ber ku me berê got, nivîskar û edîb bi awayek giştî giringiyê didin pirsgerêk û arîşeyên takekesî yên di nava civakê de. Lê bi dîtîna me corê herî baş ê teksta edebî, ew tekstin ên giringiyê didin herdu dibistanan. Hem dibistana "Hûner ji bo hûnerê" û hem jî dibistana "Hûner ji bo jiyanê". Ji ber ku divê edeb (wêje) xwediyê herdu mijaran be, di heman demê de tam û sûd bide xwendekaran.

### **1.3. Pêkhatin û Qebareyên Roman**

Yasayên 'Pêkhateyê' di sedsala 18'mîn de hatine pêkanîn. Ango tiştek ji bo sazkirina tiştekî din tê bikaranîn, bi taybet ji bo çêkirina tebel, berên koçikan, ber an jî kevîrê tebelan jê tê çêkirin. Ji bingehe wê re 'mezinahî' tê gotin. Tê wateya 'Bingeh û Mezinahî.' Wateya wê nêzî plotê ye. (Wergêr) "*Pêkhate, çarçove û stonên bingehên ên bûyeran in, çî sazkin û çî jî girêya kor be. Roman li ser vê yekê tê danîn. Di rastiya xwe de pêkhate nahêlin zincîra bûyeran bibe girêya biçûk û roman hevgerîna hûnerî bidestdixe.*"<sup>14</sup>

---

<sup>13</sup> H. B. , R 68

<sup>14</sup> Dr. Dawid Xetaş, *Qezaya El-Neqid El-Erebî Qedîmeha Hedîsaha*, Dar El-Seqafete Lîl Neşîr Wel Tewzêh, Emman, El-Erden, S.2000, R 66



Herwekî me berê bal kişandî ser, roman bi berhevkirina ligel helbestê xwediyê pêkhatiya herî mezine. Mezinahî û rûpîvana di nava romanê de wisa li romannivîs kiriye ku di rûyê pêkhatiyê de bingehe tekstê gelek pergal, regez û bûyerên cûr be cûr bi awayekê tevlî hev bikin. Piştî xwe dide regezên hûnerî yên weke, dem, cih, bûyer û karakter. Bi awayekî pexşanî hembêza xwe li pêvajoya vegêrandin û rêbazeke edebî ya weke romanê hilberîne.

*"Mezinahiyên bi hev re di nava bûyerên romanê de hene û bi awayê awazvanan tên vegotin. Mezinahî ne tenê bi dawî hatina bûyerane, belkî tevayî serûberkirina bûyerane".*<sup>15</sup> Xwe bi pêwendiyên gelek sedem û sedemên bi hev re hatine zeliqandin, bi wêne û nîgarekê hatine çandin. Mezinahiya romanê ber bi pêş ve dibe û diqedîne. Li gel hêmayên din peywendiyên xort heye. Hinek caran tona mezinahiyê di girêdana gotarê de, hinek caran di girêdana bûyeran de û hinek caran jî di kesayetî û daxwazên wan de tê çandin. Sedema ji bo encama kiryar, gotara kesayetiyên û çêbûna bûyeran, tê diyar kirin. Divê vehûnandî bin, ji ber ku her çendî mezinahiya wê zêdetir hûnandî be; roman zêdetir xortir dibe. Herçendî kêmtir be, roman lewaztir û aloztir dibe. Mezinahiya baş û mamostayane, mezinahiyek dikare bigihe gimik (lutke) û encamê. Mezinahiya romanê weke guldankê (Cihê gulê) ye ku pelên gulê li cihekê rawestin, pêşî li rijandina wê digire û dibe sedemêçilmisîna (Têkçêna) gulê. Mezinahî jî dibe sedemê bi hev ve girêdana bûyerên lezgîn û wan nêzî hev dike. Mezinahî di navbera bûyeran de pêwendiya awazvanan dadimezirîne û bûyeran ji şepirzeyî rizgar dike. Rengê hizirvanan dide wan û rengekekî din dide romanê. Mezinahî vegeêrandina bûyeran e, xwe avêtine ser alîkarî û pêwendiyên gelek sedem û berî sedeman e.

---

<sup>15</sup> Nîko Bext Niwrûzî, *Mûqayye Terhû Pîrîng Le Dû Menzûmey Bêjin û Menîzey Fîrdewsî Xosrewî Şîrîni Nezamî Da*, Fesilnamey Pez û Hîşekani Ilûmî Îslamî, Daniştgeha Zehra, Şimare 178, R 74-75

#### 4-Plot

" Navîna roman vegêrandina yek li pey yekê ya bûyeran a ji ber pêwendiya sedem û berî sedemê ye. Fîlozofê her romanekê li ser bingehê yek li pey yekê yê xwediyê gelek sedeman, berî sedema serpehatî û bûyeran e. Navîn an jî Plat, dirûstkirina hizir, mejî û derûniya romanê û xwendekar ber bi plotê ve balê bikişîne".<sup>16</sup> Temaşevanên yek li pey yekê yê fikirîna bûyeran, romanên û encama bûyeran, dikeve ber pêwendiyên. Plot girîngtirîn û naziktirîn bingehê romanê ye. herweha "Plot vegêrandina bûyerên bingehîn ên çîrokê, birêxistinîkirin û ciwanîkirina bûyeran e. Vegêrandineke ji bûyerên tekeziya sedem pêktê û tê encamdayîn, nekû rêxistina zimanê bûyeran an jî rêxistina li gor bûyeran e."<sup>17</sup> Arîsto plotê weke aram û xort bi nav dike, bi mercê despêk, naverok û dawiyêke ronî û zelal hebe. Di despêkê de kiriyarek be, bibe sedemê ber-tekek (kardanewe, reaskyon) din û bi xwe pêwîst be. Di naverokê de bi xwe tiştê diqewime ku tiştê din li pey xwe pêkbêne û her bi wî awayî dawiya plot encama kiriyara despêkê be. Piştî wê yekê jî êdî pêwîst nake ku bê gotin, daxuyanî yan bê dirêj kirin. Plot vegêrandina bûyerên bingehîn ên çîrok, rêxistin û ciwaniya bûyerê ye. Vegerandin ji bûyerên tekeziya sedem û encamê pêk tê, nekû rêxistina zimanê bûyeran an jî rêxistinîkirina li gor bûyeran. "Bi rewşek ku rêxistina kar û bûyerên çîrokan tê gotin, pêwîstî bi sedem û encamê heye".<sup>18</sup> her wisa li pertuka nivîskara "Lîzabîş Dîyl" wa behsa zaraveyê plot diki. "Zaraveyê plot bi awayek giştî bikaranînek berfireh heye û piraniya zimanên Ewrûpî li ser bikaranîna wê hemfikir in. Eşkereye ku plot weke bingehê çîrokê ye, lewra berhemên girîng ên Arîsto digire nava xwe. Arîsto zaraveyê plotê wek diyarî pêşkêşî edebiyat, wate û beşên wê kiriye".<sup>19</sup> Yan jî di hûnera helbestê de piraniya eşkerebûnê li ser vê mijarê ye. Ev jî dema behsa awayê texlîd kirina di trajediyên de dike, wiha dibêje: "Texlîdkirina plotê ji trajediyê pêk tê. Li vir armanca min a plotê, birêxistinîkirina kirina bûyer û tiştan e."<sup>20</sup> Plot jî weke pêkhatîyek din a romanê

<sup>16</sup> Sîrûs Şemîse, *Enwaa Edebî*, Neşir Fîrdews, Tehran, S. 1375, R 166 - 167

<sup>17</sup> Sedî Sibizyanî, D.Mîr Celaledîn Kîzazî, *Ferheng Nezariyet û Ennexde Edebî*, Çapa Yekemîn, Neşir Mirwarî, Tehran, 1388, R 382

<sup>18</sup> Mihemed Şerîfî, *Ferheng Edebiyat Farisî*, Întîşarat Meîn, Çapa Dûyemîn, Tehran, S.1387, R371

<sup>19</sup> Hesên Besrawî, *Beniyet El-Şekîr El-Rîwâî*, El-Merkez Seqafî, El-Erebî, Beyrût, S. 1990, R 33

<sup>20</sup> Wer. Ezîz Gerdî, *Hûnerî Şîrî Arîsto*, Çap û Pexşî Nîma, Silêmanî, S. 2004, R 128

di rêxistin û dariştina bûyeran de erk û rolekî giring dileyîze. Bi aresteya ezmûn, cîhana dîtin û xeyala romannivîs. Plot ew pêkhateyeye ku li ser bingehê sedem û berî sedema dawiya dariştina bûyeran dikeve stû. Bi wateyekî din plot ew girêye ku di encama komek sedem û encamên bûyeran de tê dîtin. Zaraveyê Plot: *"Plot di hûnerê wênegirtinê de tê xwestin û tê wateyê ku wênekêş (resam) li ser kaxezê wêne çêdikin û piştê diqedînin. Ev jî rengkirina avahiyê ye kuendazyar (mihendiz) dariştina wê çêdikin û avahiyekê li ser ava dikan. Di çîrokê de zaraveyê plotê tê wateya vegêrandina bûyerek li ser bingehê sedem û encamê."*<sup>21</sup>



---

<sup>21</sup> Sîma Dat, *Ferheng Îstilahat Edebî*, Neşril Merkez, Çap. Sêyem, S. 1385, R 100

## 2. HÊMANÊN NAV Û DERVEYE ROMAN

Li berçavgirtina wê yekê ku di bingehê xwe de wateyên fikra dawînameyê de hêmayên romanê ye. Despêkê sê curê hêmayên romanê tên pênasekirin û di beşa kiryarê de her ew yek liberçav tê girtin. Elbet liberçav girtina tişta roman ne hûnandîne, tenê hêmayên gewdeyê navê, derve û şûnwaran tên lêkolîn kirin.

### 2.1. Hêmanên Çarçoveya Hundirî Romanê

Hêmayên dirûstkirina çarçoveya romanê evin;

1-Mijar (Babet)

2-Tekst (Deq, Nawaxin)

1-Babet: Gelek diyarde (fenomen) û karestan digire nava xwe, romanê diafirîne û hêvênê nava wêne dike gotinên din." *Mijarê warek wisa afirand ku tû dikarî hêvênê nava xwe bibînê.*"<sup>22</sup>

Weke diyare teksta edebî ji aliyê rûxsar û naverokê ve pêkhatiye. Bi wateyekî din tekstên wêjeyî di nava xwe de du rehendên giştî hildigire. Rehendê wan jî ji rûxsarê ku zêdetir ji aliyê hûnerî û awayê dariştina tekstê ve vedigêre. Rehendek din jî ji aliyê naverokê yê xwe di mijaran de dibîne pêktîne. Armanc û behsa me zêdetir xwe dide aliyê mijarê de şor dike. Di vî warî de mijar ew bingehê giring ê tekstê ye ku ti romanek nikare paşguh bixe û mijarekê nake behsa serekî ya nava romanê de. Herwiha em dizanin gelek cûreyên romanê hene. Ew jî romanên dîrokî, civakî, derûnî, polîşî û hwd... Hemû cûreyên romanê li gor mijara romanê ji hev tên cûdakirin û navekî taybet lê tê kirin. Herweke me gotî, mijar jî ji mijarên dîrokî, civakî, polîşî û htd... pêktên. "*Mijarango ew tişta ku mîsogerî di her romanekê de hebe û heta hêmayên din li ser mijara wê*

---

<sup>22</sup> Cemal Mîr Sadiqî, *Edebiyat Dastan*, R 217

*bên rêkûpêk kirin. Mijar hêmayek bingehîne, xaniyê romanê datîne. Eger romanek ne mantiqî be, nabe behsa wê bê kirin."* <sup>23</sup>

2- Hêvênê hundir an jî di nava wê de: Ji hêvênê hundir û mijara her şûnwareke romanê re tekst an jî naveroka wî şûnwarî (cihî) tê gotin." Lêkolîna çêkirina derûnî (pîskolojî) lêkolîna şûnwar a di warê dû regezên hêvênê derûn û mijarê de ye. Naverok têkeleke ji hêvênê derûnê mijar û awayekê hûnerî yê taybet û ji xwezaya hûnerê ye. Çêkirina derûn an naverok li hemberî mezinahî û çêkirinê de, sûd jê tê wergirtin. Merce mezinahiya çêkirina me ji gotin û cihgirtinekê bigire ku naverok di nav de be. Yanî ew tişt cihê demê dagire.

*"Hêvênê Derûn bi xwe fikra serekî û di nava bermayeke wêjeyî de deshilat e. Xet an jî şelîteke di dema danîna şûnwar de tê kişandin, şert û mercên romanê bi hev ve girê dide. Hêvênê Derûn fikir û ramanekê, nivîskar di romanê de reng dideyê".* <sup>24</sup> Aliyê fikrî û têgihiştina nivîskar derdixe holê. Hêvênê Derûn hemû hêmayên derûn hildibijêre û babetê ligel hêmayên din ên romanê hevdeng dike. Nabe hêvênê derûn li gel mijarê weke hev bê zanîn. Hêvênê derûn tişteke ji mijarê tê wergirtin, şîrovekirin an jî dîtineke ji ber mijarê. Hêvênê derûna romanê ew tişt romanê dike yekparçe ye.

Hêvênê derûn ango tevahiya romanê. Çend fikrin û armanca serekî ya nivîskar a di romanê de ji bo xwendekaran derdixe. Hêvênê derûn bersiva pirsên roman ji ber çî û dixwaze çî bêje ye. Her hêmayek di romanê de: "mezinahî" girêdan, dîtin û mirov tevlîbûnek di hêvênê derûn de ne. Rêya herî baş a ji bo gihiştina hêvênê derûn ceribandina pir rengiya romanê ye. Weke gotinên nivîskar, gotinên kesê dibêje edîb gotinên mirovên di nava romanê de. Herwiha ew tişt bi rêya mezinahî, mirov û girêdanê pêwîstî pê heyî ye. Hêvênê derûnê lewaz, hêvênê derûnê bi awayê lertzok, ne zelal, nabe zû destbikeve, bê armanca û bê hêze.

---

<sup>23</sup> Hûsên Hêdad, *Birisî Henasir Dastan*, Tehran, S.1387, R 282

<sup>24</sup> Leyla Yûsifî, *Dîdet Zawyet*, Mûcelet Temûzeşî Zeban û Edebî Farisî, Şûmarey (46), S. 1381, R25

### 2.1.1. Çarçoveya bikaranîna hundirî roman

Mirov dikarê hêvên derûn bi dû tiştan pêşkêş bike; eşkere û ne eşkere. Piraniya nivîskaran di şûnwaran de bi derxistina hêvênê derûniya xwe, dema xwe bi romanan derbas dikin. Awayên nezelal (Ne eşkere) ji bo wênekari û zelalkirinê hildibijêrin. Ji bo wêneyê hêvênê derûniya di fikir, hest û xeyalê kesayetiya romanana de diguncênin. Xwendekar bi rêya lihevdana hizir, xeyal û komkirina berhemana, şert û mercê romanê di romanê de têdigihîne. Ji ber wê sedemê herçendî hêvênê derûniyê naziktir û nezelaltir bê pêşkêş kirin, zêdetir cih li ser xwendekar datîne.

### 2.1.2. Hêmanên çarçoveya pêkhateyê roman

Hêmayên pêkhateyê di çawaniya çarçoveya mezinahiya dariştina her şûnwarekî wêjeyî de ye. Tevî coreyên pêkhateyan, tevayî pêwendiyên hêma û beşên pêkanîna şûnwareke wêjeyî ya ligel hev e. Nirxandina gewdeyê derve yan jî çarçoveya şûnwareke romanê, nirxandina hêmayên pêkanîna şûnwar a weke mezinahiyê ye. "*Meydana nimayîşkirinê, awayê pêkhateyê (stîl), awayê derbirinê û nirxandina pêwendiyên wan hêmayan ligel hev, di girêdana yekparçetiya şûnwar de ye. Wêne yan jî çarçoveyek teji û bê pirsgirêk, ji bo derbirina naveroka şûnwar, sûd jî tê wergirtin. Ango awayê pêşkêşkirina naverok*".<sup>25</sup>

---

<sup>25</sup> Leyla Yûsifî, *Dîdet Zawyet*, R 24

## **2.2. HÊMANÊN ÇARÇOVEYE DERVAYÊROMANÊ EVIN:**

### **2.2.1. Goşenîga**

Goşenîga derdixê holê ku nivîskar çawa ligel roman û xwendekaran pêwendiyê dane û damezirîne. Awayê pêwendiya nivîskar ligel çîroka romanê, goşenîgaya di romanê de ye. Nivîskar bi sûdwergirtina ji goşenîgayên karesatên romanê vedigêre. Divê hîlbijartina goşenîgayan ligel mijara romanê xwediyê heman rêjeyê be. Goşenîga di kûrte romanê de bi zorî diyar e. Lê berevajî di romanê de dibe ku her beşek goşenîgayek cûda hebe. Bandora hîlbijartina goşenîgayan li ser hêmayên din ên romanê heye. Ango li ser çêkirina kesayetî, li ser berfirehbûn û pêşveçûna awayê nivîsîn û çêkirina di derbarê hîlbijartina goşenîga de giringe û xwediyê giringiyek pir zêde ye. Dîtin bingehê yekparçeyiya romanê ye. Sedema wê jî ew e ku di qonaxa yekemîn de hevdengiya (hevrêje)nivîskar ligel cîhana roman derdixê. Ew derfetê ji bo derxistina pergala parçe parçe yê romanê çêbike û bike yekparçe. Di qonaxa duyemîn de jî têgihîştina xwendekar a ji romanê rêbertiyê dike û di qonaxa sêyemîn de jî her ji ber vê sedemê behsa wê hatiye kirin. Bingehê serekî yê rexnegirtina li roman û nirxandina wê teji giringiya kirder e. Li gor lihevdanên jor goşenîga ne biwêje belkî pênasekirina deshîlata biwêjê ye. Ya baş ewe mirov wiha bêje, goşenîgaya cihgirê derbarê romanê de cihê biwêjê digire.

#### **2.2.1.1. Cureyên gûşenîgayan**

##### **Goşenîgaya Derve:**

Goşenîgaya derve tê wateya ku roman ji derveyî serpêhatiyê vedigêre, mafê biwêjê nîne biçê di nava hizrê ti kesayetiyên romanê de. Biwêjê sêyemîn ango kesê dibîne, dikare wênayek be ji goşenîgaya derve û xwe bi xwe şunwarên bêdeng bide pênasekirin. Di vê goşenîgayê de kiryar û gotinên kesên yekem, herwiha li pey qezenceke bûyeran ên weke film û wêne digire.

## Goşenîgaya Hûndir:

Di dîtina Jûrekî de roman di nava hizrê kesayetiyên romanê de digire û biwêj nikare li derveyî romanê be. Gelek biwêjên kesê yekem, kesê dûyemîn û ferdê (monolog) rasterast, bi dîtina goşeniya hundir vedigêre. "*Goşenîgaya hemû tiştê dizane, bi awayekî giştî ji bo wan çîrokaneye yên ku pêwîstiya wan bi dûdilî û dilgiraniya xwendekar nayê bikaranîn. Goşenîgaya hemû tiştê dizane, dîtinek aram û bîrmende. Lewra gelek sedemên din di çîrokê de kêmtir bikartîne.*"<sup>26</sup>. Li vir ew yek tê eşkere kirin ku "*Ev çîrokane şarezaiyekî giştî di bûyer, çawaniya çînîn, alozbûn û dema bûyeran de heye.*"<sup>27</sup>

Bi awayek din mirov bêje gûşenîgaya nav an jî hûndir, bûyer û mijarên di nava romanê de vedigêre yên ji bo gelek xwendekaran cidî û jîr hatibe nivîsandin. Ango romannivîs vedigere ji bo civakek xwediyê xwendekarên cidî û jîr. Ango romannivîs di vê cura romanê de, mijar û bûyeran bi awayekî ewqas aloz (tevlîhev) dinivîse ku hemû xwendekar nikare bi hêsanî û bi awayekî rasterast encamên wê bixe ber çavan. Çîrok û romanên bi vî awayî pêwîstî bi şarezaiyek giring û zanyariyên giştî hene.

Ew rêya ji bo çîrokê tê bikaranîn, "*derdikeve holê ku çîroka hemû tiştê dizane. Goşenîgaya hemû tiştê dizane, hest bi kesayetiyê vedigêre nake.*"<sup>28</sup>

Di romanên bi vî awayî de xwendekar bi hêsanî hest bi kesayetiyê vedigêre yê çîrokê nakin. Belkî çîrokbêj bi awayek ne diyar rolê kesê şahid dibîne. Bi vî corî jî çîrokvan dikeve derveyî qonaxa vegêrandinê

Herweha Mîşal Bor Tor dibêjî "*Belkî rolê şahidekê û tevî ku ne amade ye; lewra cihnavê ne diyarê wê li derveyî me tê hiştin.*"<sup>29</sup> ji tezê Rezan Osman jî de wa bihas goşenîgaya hûndir kira ye "*Ev goşenîga çîrokvanan li derveyî xwe dibîne, bandorên*

<sup>26</sup> Dîmonnayt, *Dastan Niwîsî Niwî*, Wer. Mehdî Fatihî, Neşir Çîşmeh, Çap. Dûyemîn, Tehran, S. 1388

<sup>27</sup> Rêzan Osman Mistefa, *Bînyatî Le Corekanî Rûdaw Le Romanî Kurdî Başûr De*, Çapxaneya Sbîrîz, Çapa Yekemîn, Hewlêr, S. 2010, R 156

<sup>28</sup> Elîzabet Dîbîl, *Pîrîng*, Wer. Mesûd Cehferî, El-Neşir Merkez, Çap. Yekem, S. 1389, R 143-144

<sup>29</sup> Mîşal Bitul, *Bihûz El-Fî El-Rîwayet El-Cedîdet*, Wer. Ferîd Întînîwîs, Menşûrat Dar Wîdat, Beyrût, Libnan, S. 1371, R 104



*derve di çarçoveya vê dîtina navendî de vegêrana bi rêya kesê yekemîn ê axaftvan digihe encamê.*<sup>30</sup> Mirov dikare derbarê gûşenîgaya hundir de jî bêje, ew gûşenîgaye ye ku kesê vedigêre yan jî kesê çîrokvan dikeve derveyî qonaxa vegêrandinê. Bi rêya kesê yekemîn û heta digihe kesên serekî yên di nava romanê de, bûyeran vedigêre. Ango çîrokvan ti rol û cihê di qonaxa vegêrandinê de nîne. Kesê yekemîn ê tekane bi awayek ku hemû tiştê dizane, diçe ser bûyeran û bi vegêrandina hemû bûyeran re mijûl dibe.

Dema nivîskarê romanê dest bi nivîsandina romanê dike û goşenîgaya navîn ji bo vegêranê bikartîne, *"armanca wî ne ewe ku jiyana xwe ya taybet vegêrîne û tomar bike. Belkî dixwaze rê bide kesayetiyên û ji bo bûyeran vegêrîne. Ji ber ku gêrandina axaftvan mamele ligel bûyeran nagire nava xwe, belkî rolê çêkirinê dibîne"*.<sup>31</sup> Li vir jî dîtinek din serî hildide, *"dîtina wê jî wisa ye ku goşenîgaya navîn; ew goşenîgaye ye vegêrandinê di navîna teksta romanê devedigêre digihîne encamê. Di vê goşenîgayê de kesayetiyê serekî rolê vegêrandinê dileyîze"*.<sup>32</sup>

### **Goşenîgaya Vala (Sifir):**

*"Goşenîgaya Vala an jî Sifir, behsa gelek biwêjên kesê sêyemîn ê zana yê sînardar, kesê sêyemîn ê zanayê giştî û takbêjiya nerastewxo dike û digire nava xwe"*.<sup>33</sup> Bi wî awayî biwê di dîtina vala de, dikare li derveyî serpêhatiyê de tiştan bigire nava xwe û çî dema pêwîst jî kir biçe nava fikrê kesayetiyên romanê û hizrên wan jî derbixe. Ji curên din ên goşenîgayê zêdetir behsa wê hatiye kirin û îro sîd ji corekê wê yê din tê wergirtin. Weke romanê gelek bi awayê yek li pey yekê û rêzkirina çend name, çend biwêjên cûda û tevlîkirina deman; bibîranîna biwêjê li pey hev e. Despêkirina romanê di dawiyê de, vegêrana romanê ji sîdwegirtina ji kesê yekemîn ê kom û herweke din tê nivîsandin.

<sup>30</sup> Rêzan Osman Mistefa, *Binyatî Le Corekanî Rûdaw Le Romanî Kurdî Başûr De*, R 154

<sup>31</sup> D.Morîs, Ebû Nazir, *El-Lesînet Wel Neqde El-Edebî Fî Nezeriyet Wel Mariset*, Dar El-Nehar Lî Neşir, Beyrût, S. 1979, R 118

<sup>32</sup> Rêzan Rehman Xidir, *Teknikî Gêranewe Le Romanekanî Abdûllah Serac Da*, Çap. Rohilat, Hewlêr, S. 2012, R 44

<sup>33</sup> Cemal Mîr Sadiqî, *Edebiyat Dastan*, R 117

### **Goşenîgaya Berçav û Nimayîşkirî (Niwandî)**

Biwêj di vî awayî de romanê bi nimayîşkirina rewşê, kiryar û gotina mirovan gel ber bi pêş ve dibe. Li vir nivîskar rasterast wesrî derûniya mirov dike. Lê hinek caran wesfîkirina derve bi awayek xwendekar ji rewşa derûniya mirov romanê agehdar bike. Ji bo wesfîkirina kiryarên lezgîn, yek ji kesayetiyên romanê û dîdiliya derûniyê nîşanî xwendekaran dike.

Nivîsîna romanê bi wî corê goşenîgayê, lihevçûnek wisa li gel niwandinê heye. Cûdahiya heyî jî ew e ku roman tê xwendin. Goşenîgaya biwêja bi vî awayî, nêzî meydana romanê û xwediyê pileyek aram e. Rexnegirê Çîkî (Czeck) Mokarofskî, taybetmendiyên vegêrandina berçavan wiha vedibêje; hemû rastî çî hêma û çî jî derûnî, bi awayekê ji bo xwendekar tê nîşan dan. Wisa pêdiçe ku bi xwe awayeke rasterast wan dibîne. Biwêj wê xeyalê çêdike ku weke dûrbînekê ku film hemû tiştêkê bi awayê zanistî û sade digire nava xwe. "*Di romanê de bi awayê tewandî tê nivîsandin, guftûgoyên serekî ji ber pêşveçûnê digire ser milê xwe. Mamostayê wê yekê vedigêre û axaftinek li ser xwe, awayê bi vî awayî yê di nivîsîna romanê de bi serkeftî tecrûbe kiriye*".<sup>34</sup> Romanên 'Kuştina Mirovan' û 'Tepolke Gelêkî weke fîl gelî çermû' ji şûnwarên J.D. Salêncêr jî nêzî wê yekê ye. Çend mînakên Îranî, 'Romana Dad' a ji nivîsên Sadiqî Çûbeke."

### **Goşenîgaya 'Min' a Hatî Vegotin:**

Goşenîgaya 'Min' ya vegotî ji kurte roman û gelek romanên de derdikeve ber çavan, di goşenîgaya kesê yekemîn de sûd jê tê wergirtin û nivîskar romanê vedibêje. Di wê çarçoveyê de vegêrana romanê bi awayê 'Ez' destpê dike. "*Ew 'Ez' bi serpêhatiya gelek rast, dîrokî yan jî xeyalî dibêje. Bi xwe afirîner, qehremanê serekî yan jî karesatek*

---

<sup>34</sup> Cemal Mîr Sadiqî, *Edebiyat Dastan*. R 96

*dîtiye. Bi mercê 'Ez' kesayetiye serekî ye romanê be, jêre 'Biwêj-Qehreman' tê gotin. Yan jî jêre 'Biwêj-Dîtin' tê gotin".<sup>35</sup>*

Bi wî awayî ji ber ku biwêj xwe û ji ber xwe ve daxive, di encamê de gotinên wî ji bo xwendekar dibin cihê baweriyê. Herwiha bi wî awayî biwêja romanê, kesayetiye serekî û neserekî dikarin bi zarave û awayên xwe yê taybet romanê ji bo xwendekaran vegêrin. Di encamê de vegotina ji rawêjiya wan xweştirê û xwendekar xwe zêdetir di nav de dibîne. Li aliyekî din jî di vî awayî de merce biwêj kesayetiye serekî be, ji ber ku li wir awayekî berçav nîne û bêyî aliyê romanê vedigêre. Gotinên wî zêdetir dibin cihê baweriyê û ji ber wê sedemê bi vî awayî nivîskar dikare pê naseya kes an jî kesan, heta dawiya romanê eşkere neke. "*Hê agehdartir dikare heta dawiya romanê, ji xwendekar veşêre. dîn û hare ew awaye ku 'Mercê me yan nemana yek ji kesayetiye romanê girîngtir be; nabe nivîskar wî kesê weke biwêjê hilbijêre. Ji ber li vir xeyalên xwendekar sade dibe, biwêjê di bûyerên romanê de giyan (rih, can) derbas kiriye û bi xwe kariye bi serhatî romanê vegêrêne".<sup>36</sup>*

### **Gûşenîgaya Hemû Tiştê Dizane**

Ji vê curê vegotinê ye 'Her Tiştê Dizane' yan jî 'Goşenîgaya Nivîskar' yan jî 'Goşenîgaya Pir Alî' tê gotin. Ev cor li hemberî awayê 'Goşenîgaya Zana ya Giştî ya Sînordar' kevintir e. Di wê pileyê de biwêj xwedayê romanê ye û di gotina hizrê jortir, nêzik û dûrî encam, fikir û gotarên kesayetiye gelek romanê ye. Di dema borî, niha û bê de, hestên wê eşkere û nehênîyên kesayetiye romanê, xwediyê agehdariye têr û zêde ye. Heta hinek caran li ser bûyer û mirovên di nava romanê de biryarê jî dide. *Piraniya şûnwarê klasîk, pirtûkên wan pîroz û romanên wan jî di goşenîgaya qehremanî û evîndariye de hatine nivîsandin. Merce biwêj fikir û dîtinên li beramberî kiriyariya kesayetiyan nîşan bide, jêre zanayê giştî ye destlêwerdide tê gotin".<sup>37</sup>*

---

<sup>35</sup> Cemal Mîr Sadiqî, *Edebiyat Dastan*, R 395- 396

<sup>36</sup> H. b. , R 97

<sup>37</sup> Reza Brahinî, *Qise Niwîsî*, R 38

### 2.3. Biwêj

Di dema xwendina her romanekê de dibe ku ev pirsyar ligel xwendekar çêbibin: Roman kê digire nava xwe? Yan jî roman çawa tê vegotin? Gotina herî sade û giştî, hatiye vegotin û ji tekstekê re tê gotin ku çîrokekê vedigêre. "Ji nasandina vegêrana dawiyê, Çawaniya yê vedigêre' hatiye afirandin. *"Li ser bingehe nasandina dû fikrên (Nizriye Pirdaz) bi navê Îskolz û Klag hemû tekstên wêjeyî bi xwe xwediyê hebûnê ne. Çîrok û di amadebûna çîrokan de, mirov dikare jêre bêje tekstek hatî vegotina ku ji bo xwendin an jî guhdarkirinê pêwîstî bi delalekê heye (dengek, ferdek an jî çavkaniyekê bigire nava xwe). Ji vê yekê re biwêj tê gotin".*<sup>38</sup> Herwiha "Mecîd" di pertuka xwe ya de dibêje "Vegêrandina bûyereke yan jî zêdetir, nûçeyek an jî zêdetir vedigêre. Êdî di kirokiya hatin an jî ji dahênana (îcatkirin) endîşe ve".<sup>39</sup>

Li vir mirov dikare bêje bûyerên di nava her romanekê de hem bûyerên rast in û hem jî rastiyan hatine gotin in. *"Eger mirov temaşeyî ferhenga 'Henbana Borîne' bike, wê demê "Vegêrandin, vegêrandin jî bi wateya behskirina gotina hatî kirine."*<sup>40</sup> Bi vê yekê jî pêwîstiya hemû tekstên edebî bi biwêjek hatî vegêrandin heye. Herwiha vegêrandin di warê vegotina tiştek giştî û cûr bi cûr de Timî vegêrandin ji aliyê biker ve çêdibe. *"Di rastiya xwe de vegêr ji awayê dariştin an jî bingehekî vegêranê yên weke karakter, dem û cih. Ew jî bi awayê mijara çîrokê".*<sup>41</sup> Li vir ew yek eşkere dibe ku roman di nava hewldanê de ye ku bi rêya afirandina çîrokbêjekê ve tiştan vegêre. Pêwîste di hilibijartina çîrokbêj de, *"li gor rolê yê vedigêre behsa wê bê kirin. Ji ber ku dibe ew çîrokbêje ji teksta çîrokêdernekeve û dibe ku yek ji karakterên di nava romanê de be".*<sup>42</sup> herweha D. Necim elewenî ji pertuka xwe ya de nivîsî ye *"Lewra li vir tê gotin ku çîrokbêj peywendiyekî rasterast bi hizrê hûnera çîrokê ve heye."*<sup>43</sup>

<sup>38</sup> Cemal Mîr Sadiqî, *Edebiyat Dastan*, R 111

<sup>39</sup> Mecdî Wehbet, *Meecem Mûstelahatil El-Edebî*, Mekteb Lubnan, S.1974, R 341

<sup>40</sup> Hejarî Mûkiryanî, *Henbane Borîne, Ferhengî Kurdî-Farisî*, Çapa Pêncem, Tehran, S.1385, R74

<sup>41</sup> Sîza Ehmed Qasim, *Bîna el-Rîwayet, Dîraset Meqarret El-Silasete Necîb Mehîûs*, El-Hîyete El-Mîhreyte El-Amete El-Kîtab, S. 1984, R 131

<sup>42</sup> H. b. R 131

<sup>43</sup> Necim Xalid Necmedîn Elewenî, *Bînay Kat Le Sê Nimûney Romanî Kurdî da (Janî Gel, Şar, Raz)*, Dezgay Çapî Serdem, Silêmanî, S. 2004, R 16

Roman bi awayekî asayî du corên edebî hene: Biwêj û kesayetiya her romanekê jî dû pêkhateyên ji hev cûda ne. Riwayet û gotar. Riwayet behsa karesat û kesayetiyan romanê dike. Lê gotar ya biwêjê ye û bi sûdwegirtina ji wê, pêwendî ligel xwendekar datîne û ji karesatên romanê agehdar dike. Lê biwêj kiyê? Timî kesek di nava dil û derûnê romanê de ligel kesek li derve daxive. Hinek car nivîskar ji zimanê xwe vedigêre yan jî ji zimanê kesek di nava romanê de vedigêre. Di her rewşekê de nivîskar kesekê ji bo vegêrana romanê hildibijêre. Jêre biwêj tê gotin.

*"Biwêj, di warê wateya peyvê de tê wateya bikerê (kirdar) tê vegêrandin. Destewajeya wêje û çîroka romanê ye. Biwêj kesayetiyeke nivîskar, bûyer û karesatên romanê ji zimanê wî ve vedigêre".<sup>44</sup>* Gelek awayên wê hene. Nivîskar dikare bi rêya wan romanekê ji bo xwendekaran binivîse. Her dibistanek li ser bingehe fikrek hizrê çîrokê tê nasandin û li gor baldarbûnê, bi bingehe hizrî nikare têgihiştinek sedî sed bidestbixe.

Hinek fikir di wê baweriyê de ne ku biwêj xwediyê pênasê, di amadebûna rast û li berçav di romanê de heye. Hinekên din jî bi biwêjê qayîl nabin û ji bo tekstên çîrokê, giringiyek zêdetir didin biwêjan. Romasman wiha behsa biwêjê dike. Rihê çîrokê ye û romanê bi keresteya rihê çîrokê tê vegêrandin. Rihek yekane (taqane) û li her cihek tê dîtîn, çarçoveya kesê sêyemîn romanê tê vegêrandin. Hinek caran jî di kesayetiya kesê yekemîn de xwe dibîne û di çarçoveya "Ez" de ji gotina kesayetiyan cur be cur ên romanê û cihên cûda cûda derdixin. Li hemberî fikra 'Tomas Man', Hamburg xwediyê fikrek din e. Bi baweriyê wî di çîroka kesê sêyem de, biwêj ne xwediyê kesayetiyan û pênasê ferdiye. Baweriyê wî bi xebitîna romannivîs heye. Xebitîna riwayetê ji afirîna kesan pêktê, karesat û bûyerên di nava romanê de ne. Li vir biwêj cihê kes û tiştên romanê nagire, belkî tenê kes û tiştan digire nava xwe. Rexnegirê Brîtanî Wayn Bos, biwêjê weke 'Ezê Dûyemîn' an jî 'Nivîskarê Dûyemîn' datîne. Bi awayek nerasterast û hevdem di heman demê de hebûna wê heye û di rastiyê de 'meczî' ye. Hersê fikir 'Rihê Çîrokî' ne. 'Xebitîna Romannivîs' û 'Nivîskarê Dûyemîn' tevî cûdahiyê jî, ji ber biwêj xwediyê dîtinek hevbeş e.

---

<sup>44</sup> Sîma Dat, *Ferheng Îstilahat Edebî*, Neşril Merkez, Çap. Sêyem, S. 1385, R 139

### 2.3.1 Curên biwêj:

Li gor liberçavgirtina goşenîgayan, biwêj ji van curên jêr pêk tê:

#### **Kesê Yekemîn**

*Di vê goşenîgayê de kesê wergir di nava çîrokê de ye û hemû tiştê dizane û ji 'min' werdigire. Behsa 'Wan tiştane' ye ku duh an jî beşeke ji wan bû ye.*<sup>45</sup> Biwêj di vegêrandina kesê yekemîn de, yek ji kesayetiyên romanê ye. Biwêj dikare kesayetiyên serekî yan jî yek ji kesayetiyên ne serekî be û çîrokê vegêre. Biwêja kesê yekemîn, yek ji wan biwêjane ku herî zêde sûd jê tê wergirtin û her di wê demê de jî ya herî dijwar e. Taybetmendiya wê biwêjê, di dilê yek ji kesayetiyên romanê de diçe û nivîsîna goftûgoyên derûnî, hestê kesayetiyên di şert û mercên pir awayî û zelalkirina gûhertinan de. Di encamê de sînorek zêde heye, di derbirîn û pêşkêşkirina bûyeran de û bi awayek xwezayî tenê dikare tiştê li ber çavê kesayetiyên heyî vegêre. Di wê rewşa hatî vegêran de, eniya karesatan û taybetmendiya kesayetiyên din ên romanê, bi dadwerî û dîtînen yekalî yên biwêjê, awayek rêxistinî û liberçav de ye. Tê pêşkêş kirin

Li vir ew yek eşkere dibe ku awayê herî hêsan ê ji bo nivîsîna romanê be. "*ji ber ku tû dizanî ji ber vî karî û ji ber sedema kesekê; 'Ez' nêzî her tiştî dibe û bide nas kirin. Li gel vê yekê jî sînordarî li holê ye*".<sup>46</sup> . Li vir dema xwendekar tiştêkê dixwîne, wisa dizane ku ji zimanê kesekê rast ve vedigêre û bêtir hest bi hebûna nivîskar bike. Lê divê çîroknas wê yekê bizane ku ew ne wergir e, belkî tenê çîrokê dinivîsîne. "*Bi wateya ku werger kesê yekemîn di çîrokê de û kesê te afirandî, li cihê wî ew afirandiye û biryar li ser daye. Rê bide ku ew çîroka tû ji bo xwe vegêrine, ev erkê te ye û divê li bîra te be. Ew ji bilî xwe, ne kesek din e*".<sup>47</sup> Ji bilî vê yekê kesê serekî di derbarê xwe de nabêje, "*divê kesê serekî çîrokê di hemû aliyan de amade nebe. Lewra wê demê pêwîstiya me bi goşenîgek duyemîn (neserekî) heye*".<sup>48</sup>

<sup>45</sup> Bûşra Kesnezanî, *Plot Le Çîrokê Kurdî Da*, Çapxaney Lerya, Silêmanî, S. 2012, R 257

<sup>46</sup> Dayn Watt Fayer, *Fen Raman Nîwîsî*, Wer. Mihemed Cewad Fîrûzî, Întîşarat Nîkah, Çap. Yekem, S. 1388, R 17

<sup>47</sup> Monîka Wûd, *Tewsîf Dar Dastan*, Wer. Nîlûfirarbabî, Neşir, Risiş, Çapa Yekemîn, S. 1388, R 130

<sup>48</sup> Lîwîs Basgir, *Finûn Emûzûş Dastan*, Neşir Ixtirat, Çapa Yekemîn, S. 1384, R 156

Xala bihêz a biwêja kesê yekemîn ew e ku pêregihîştina xwendekar dikare pêngav bi pêngav li cihê biwêjê pêşve biçê. Bi sûdwergirtina ji têgehiştina hestê gelek kesayetiyên romanê, xwe bi xwe di nava romanê de hest pê bike. Dijwarî û girêya kor a wê biwêjê ji wî alî ve ye ku divê nivîskar bi temamî kesayetiya romanê nas bike. Di dema nivîsînê de, bi xwe beşdarî romanê bibe û tenê bi kesayetiya behsa wê tê kirin, bê rawestandî. Li aliyê din jî nivîskar ji bilî gihîştin, liberçavgirtin û sadeyiya naveroka şûnwar, bi xwe derbirîna hestê gel, honandin an jî wênegirtina filozofan, hizirvan rewşa kesayetiyên, divê balê bikişîne ser awayê derbirînê. Bazinê peyvên û forma hevokan jî. Ji bo wêne merce biwêja wêne, zarokek an jî ger derûnî nexweş be. Divê gihîştin bi awayekê be asta têgehiştinê fêhma kesayetiyê yekemîn, bazinê peyvên û gotinên nivîskî, dîtînen karîn û li ser taybetmendiyên kesayetiyên behsa wan hatine kirin, bê wergirtin. Herwiha hinek caran roman ji zimanê biwêjê kesê yekemîn ê kom (Hinek kes) ve bê gêrandin. Bi wî awayî xwendekar, ji dîtina hinek kesayetiyên yekemîn ên hevrê agehdar dibin. Biwêja kesê yekemîn ê kom, dikare hestê derûnî û hevbeşiya civakê agehdar bibe û ji bo guhdarkirinê, wergire.

### **Kesê Dûyemîn**

Vegêrana kesê dûyemîn di qonaxa dûyemîn de, biwêj di dirêjîya romanê xwe dike guhdar û heta astekê weke biwêja kesê yekemîn lê tê. Xwediyê heman desthilatan e. Bi wî awayî dikare tevî vegêrandina cih û valahiyê, hest û hizrê kesan jî behs bike. Dema nivîskar ji zimanê kesê dûyemîn sûd werdigire, xwendekar dibe nava derûniya xwe û ji zimanê xwendekar, romanê ji xwendekar re vedigêre. Heta asta ku xwendekar bigihe wê baweriyê ku bi xwe nivîskarê romanê ye. Bi awayekî din dikare bê gotin *"ku biwêj destê xwendekar digire û di vegêrandina serpêhatiyê de dike hevbeş"*.<sup>49</sup>

Lê cûdahiya vê biwêjê ji biwêja kesê yekemîn, ji bilî guhertina kiriyara hevokan ewe ku ziman ber bi helbestvanîyê ve diçe. Romana 'Aora' ya Karlos Foentis wêneyekê baş ê wî awayê vegêrandinê ye. Di qonaxa dûyemîn de biwêj ligel xwe nabêje, belkî li beramberî wî yek ji kesayetiyên nava romanê ye. Vêca bi wî awayî biwêjê deshilata wê

---

<sup>49</sup> Nasir Êranî, *Hiner Dastan*, R 39

yekê nîne ku biçe nava mejiyê yê beramber û merc, tiştekan jî di nava mejiyê guhdar de bigere û ne weke dîtina wî ye. Vegêrandina kesê dûyemîn, awayê nameyekê ye ji bo yek ji kesayetiyên dinivîse. Tenê bi derbirîna hestê xwe û nivîsîna li hemberî kiryarên wê dike. Divê balê bikişîne ser wê xalê ku tenê dema ew biwêj wek kesê dûyemîn tê hêjmartin û yê li hemberî biwêjê bê kiryar be; dîtina û ramanên biwêje li hemberkirinê neyê wergirtin. Merce li hemberî biwêjê di cihê wî de li wir be, bibe nava gutebêja qonaxe kesê dûyemîn nîşan bide.

### **Kesê Sêyemîn ê Hemû Tiştê Dizane**

Ev curê goşenîgayane, kesê wergir keseke li derveyî çîrokê ye û hemû tiştan bi hûrî û dirûstî dibîne, çavekê wî agehdar e. Heta li ser corê tevgerkirin û fikirîna karakteran e, kesek karakteran radike; li ser hemû mijar û pêşniyaran de serdeste. Çîrok bi berdewamî bi rêya 'Ew' ê karakterê serekî ve derdikeve. "*bi awayê ku di çîroka klasîk de heye û ew çîrokzan hemû tiştê dizanin.*"<sup>50</sup>.

Bi Awayekî Giştî Kesê Sêyemîn, Bi taybetî kesê sêyemîn ê bi tenê gelek caran di dema vegeerînadina çîrokê de dibe vegêrê her tiştî dizane. Ev corê teknîkê zêdetir di çîrokên klasîk de diyar bûye. Lê çîrokên îro bi awayekî teknîkî giringiyê didin teknîka vegêrana pir dengî. Ango her karakterek li gor xwesteka xwe bûyer û serpêhatiyên vedigêre. Armanca kesê sêyemîn ê her tiştî dizane jî ewe ku çîrokvanên bi vî awayî hemû bûyer û serpêhatiyên di nava romanê de dizane. Bi wateyekî din zanyarî li ser naveroka hemû karakteran heye. Mînak, dikare biçe nava mejî û dilê karakterên di nava roman û zanyariyan de. Armanca wê veşartî, tiştên veşartî yên di nava dil û mejiyê karakteran de dizane. Yan jî berî bûyer rûbidin, çîrokvan nûçe û zanyarî li ser çawaniya rûdana bûyeran heye û pêşbîniya (texmîn) hemû bûyerên dahatû dike.

*"Li vir karîna nivîskar û çîrokê derdikeve. Bi wateyekî din bi rêya çîrokvanan ve lêhatûyî û karê nivîskar derdikeve holê. Ji ber ku 'Çîrokzanê her tiştê dizane, li vir xwe li*

---

<sup>50</sup> Nansî Krês, *Texniyat Kîtabete El-Rîxayet*, Wer. Zînet Cabir Idrîs, El-Dar El-Erebiyet Lîl Ulum Lînaşarûn, Çapa Yekemîn, Beyrût, S. 2009, R 297



*pêşiya goşenîgaya bê sînor çavdêrînekirina nivîskar dibîne.*" <sup>51</sup> Mirov dikare bêje çîroknasê her tiştî dizane. "*rolê nivîskar dileyîze. Ji ber ku çîrokvan dibe sedem ku tiştê pêwîstiya navborî pê namîne, berhema wê bibe nûçeyek û nivîskar nekare xwe li pêşiya çîrokvan veşêre*".<sup>52</sup> Biwêjê kesê sêyemîn ê zanayê giştî di kesayetiya romanê de nîne, belkî li derveyî romanê de ye. Lê nabe ligel nivîskarê romanê bi şaşî bê vegotin. Biwêj ji vegotina kesê sêyemîn ê giştî de, di şert û merca xwe ya herî serbilind de ye. Çi cihê pêwîstî pê hebe, li wire. Her çi dema pêwîstî pê hebe, diçe nava mejiyê kesayetiyan romanê, hest, fikir û dîtina wan dibêje. Di vê biwêjê de ti tiştêk veşartî nîne. Her kêlî li meydana derdikeve û diçe meydana din. Şert û merc wek berjewendî dibîne, her hesab ji hinek kesayetiyan re nake û eger bixwaze dikare nêzî yek an jî çend kesayetiyan dilxwaz bibe. Ev biwêj weke xwedayekê ye, dikare ji ber bûyeran romanê dadgeh bike û hinek caran jî peyamên baş dide. Di çîroka gelek kevin a xwediyê pêkhatiya (Plot) klasîk û herwiha efsaneyan de, bi awayek yasayî sûd ji vê biwêjê werdigire. Sedema wê jî ew serbestiya kirdarî ya ji bo derbirîna hemû tiştêkê ye. Lê îro di romana nû de, bi giringî sûd ji vê biwêjê tê wergirtin. Ji ber ku ew peyv di vegêranê de ji bilî fîlozofî û cidiyeta romanê, dibe sedemê hevsengiya xwendekar a ber bi pêş ve birina roman û awayê dîtina wê Nebûna sînor di deshilatên biwêjê de, destê nivîskar vekirî dihêle. Lê şertê kes ezmûnek baş li ser nivîsîna çîrokê nebe, dibe ku bibe sedemê têkbirina vegotinê û xirabkirina xeta serekî ya çîrokê.

---

<sup>51</sup> Îbrahîm Cindarî, *El-Xezae El-Rîwaî Înde Cebra Îbrahîm*, Dar El-Şiûn El-Seqafiyete El-Amet, Çapa Yekemîn, Bexda, S. 2001, R 150

<sup>52</sup> Yemnî El-Îd, *Teqniyat El-Sirt El-Rîwaî Fî Zûl El-Menhec El-Benîwe*, Dar El-Farbî, Çapa Yekemîn, Beyrût, S. 1990, R 93-94

### 3. ÇEMK Û PÊNASEYA KAREKTER

#### 3.1. Karekter Çiye

*"Karekter yek ji xalên serekî û giring ên romanê ye. Ti romanek bêyî wê nayê nivîsandin û hemû bûyerên romanê pêwendî bi jiyana, kar û kiryarên wê ve heye. Herwiha cih, dem û heta reqabet(milmilanê) û plotîromanê, hemû ji bo derxistina kesayetiya karekter datînin".*<sup>53</sup>

Bi dîtina felsefîk mameleya taybet a ligel karekter, ji diyariya ferdekî karekter pêktê. Piştî Dîkart ewqas giringî da pêvajoya endîşe (bîrdozî) ku bi xwe hişyariya ferd de ye, meseleyên felsefeya Şunasîferd jî zêde bûne û cihê wê yekê ne giringiyeke mezin bidinê. Mînak; Lok, Keşeyê Batler, Barkilî, Hîym û Rêd li Brîtanya behsa van corê meseleyane kirin. Heta rewş gihişt wê astê ku gengeşe derbasî rûpelên rojnameya Spîktîtor jî bû. Wekheviya kevneşopiya Endîşeya Realîstî û Nûbûnê, formên roman nivîsên pêşeng eşkere ne. Hem filozof û hem jî roman nivîs giringiyeke zêde dane ferdên taybet ên kesayetiyan. Elbet giringiya zêde ya romanê, bi taybetmendîkirina karekteran, bi xwe ewqas mijarek berfireh e. Em li vir tenê aliyeye wê lêkolîn dikin. Di wî alî de her kesekê di jiyana rast de daxwazek taybet heye. Roman nivîs jî bi nav anîna karekteran, hewl didin bi taybetî nîşan bidin. Meseleya şunasî ferdî, di aliyê lojîkî de pêwendî nêzik ligel cihê Epstimolociya di nava taybetmendiyan de heye. Ji ber ku li gor gotina Hobiz, taybetmendî tiştêkê eşkere dikin, lê bi giştî tiştên cûda cûda tînin bîra mirov.

Di jiyana civakî de navên taybet heman rolî dileyîzin. Ango pêşniyara gotinên taybet ên kesan in. Lê ew rol leyîstina di nava taybetiyan de, cara yekemîn di wêjeyê de di nava romanê de bi temamî bi cih bûye. Elbet karekter di coreyên berî romanê de jî bi awayekî asayî xwediyê navên taybet in. Lê di rastiyê de ev navane derbirînê (guzarişt)li wê yekê dikin ku nivîskar ne li peye ku bibe tevahiya karekterên weke bîranîn 'Tak' nîşan bide. Nivîskar giringiyê didin wê yekê ku bingehê rêbaza di edebiyata klasîk û

---

<sup>53</sup> D.Necmedîn Xalî Elewenî, *Karketersazî Le Êwarey Perwaney Bextiyar Elîda*, Çapxaneyê Mûkiryanî, S. 2009, R 9

serdema Ronesan da, navê dîrokî yan jî nimûneyî (Typical) ji bo karekterên xwe hîlbijêre. Ev jî li gel bîngêhên rexneyên wê serdemê bûn. Bikaranîna navê dîrokî yan jî nimûneyî, dibe sedem ku ji bo karekteran li benda tiştên mezin bin. Bi awayê serekî çavkaniya xwe ji wêjeya borî werdigire û heta digihe naveroka jiyana serdemane. "Arîsto di got, heta di komediyê de jî karekter bi awayekî asayî ji dîroka borî nayê hîlbijartin, belkî çêkiriyê zihniyeta kesên komedî nivîsin in. Wisa xîz dikin ku navê karekteran bi taybet tîn nivîsandin. Heman ev xîz kirin piştî serhildana romanê jî, heta demekê jî berçav bû. Di çîrokên pexşanî de zêdetir ew nav dihatin bikaranîn ku bi awayekî din ne realist bûn û derbirînêli kesek taybet ne dikir. Ev navane çend sîfetên taybet diyar dikirin, weke di berhemên nivîskarên weke Kerebilî, Sidnî, Pûnîn.

*"Despêke divê ev yek bê zanîn ku kesayetiyan di nava romanê de kesayetiyan wêjeyî û hunerî ne. Roman nivîs afirandiyê, lewra şaşê ger bi çavê rastî û asayîtemaşeyî wan bê kirin. Vêca ger wekheviya wan ligel jiyane hebe yan jî nebe".*<sup>54</sup> Lewra pêwîste ew kesayetiye vekirî, zelal û zindî be. Lige bûyer û fikra romanê hev bigire. Herwiha tiştêkî hêsane ku kesên di nava romanê de aliyê erênî û nerênî hebin. Ne şerte ew kes tenê mirov bin. Belkî gelek caran jî nezindî ne. Romannivîs di hîlbijartina kesên di nava romanê de azade, li gor xwesteka xwe wan dixê tevgerê û li gor fikra jêre tê, bergê zindî li ber wan dike. Lewra wêneyê kesên di nava romanê de reng dide, taybetmendî û xwezaya wan kesane ku di jiyane de rastî wan tê; ligel tevdigerin. Ev jî vedigere ser karîna û jîrîtiya romannivîs. *"Armanca romanê bîngêhdanîna kesayeti û bûyeran e"*<sup>55</sup>

Lewra pêwîste ew kesayeti eşkere û zindî bin. Divê li gel bûyera fikra romanê hev bigire. Herwiha tiştêk asayîye ku kesên di nava romanê de, aliyê wan ê erênî û nerênî hebe. Ne şerte ew kes tenê mirov bin, belkî gelek caran jî ne zindî ne. Roman nivîs di hîlbijartina kesên di nava romanê de azad de. Li gor xwesteka xwe wan dixê tevgerê û li gor fikra jêre tê, bergê zindî liber dike. Lewra wêneyê kesên di nava romanê de, dengvedan, taybetmendî û xwezaya wan kesane ye yê di jiyane de rastî wan tê û ligel

<sup>54</sup> Ebdûllah Seraç, *Berew Astaney Roman û Gûşenîgakan*, Dezgeya Çap û Pexşî Serdem, Silêmanî, S. 2007, R 12

<sup>55</sup> A. M. Forstêr, *Erkan El-Rîwayet*, Wer: Mûsa El-Asî, R 38

tevdigere. Ev jî vedigere ser jêhatî û karîna roman nivîs. “*Giringiya kesayetiya di nava teksta romanê de, dibe sedem ku ew regez û pêkhatyên din ên romanê bi hev ve bîn girêdan û ber bi pêş ve bibin.*”<sup>56</sup>

Karakter tuxmekî serekî yê romanê ye û roleke serekî di bingehdanîna romanê de dileyîze. Ji ber wê sedemê bûyeran ber bi jor û jêra xwe dibe.

Herwiha D. Perêz Sabîr li Bînyatî Hûnerî Çîrokî Kurdî, Le Seretawe Ta Kotayî Cengî Cîhanî Duwem dibêjî “*Em dikarin bêjin bingehê kesan ji aliyê nivîskar ve, timî cihê giringîdanê ye. Ne ji rêbazekê ber bi rêbazeke din, belkî heta ji nivîskarekê ji bo nivîskarek din jî cûda û tevlîhev e.*”<sup>57</sup>

### 3.2. Giringiya karakter

Roman, Honandiyek çîrokî ya dirêj, piraniya demê behsa kiryarên qehremanî û bûyerên giring ên çanda helbestên nivîsandî ye. Herwiha roman dikare behsa gešta kesek an jî gelek kesan bike. Êdward Hêrş di pirtûka xwe de wiha dibêje. “*Roman vehûnandiyekî çîrokî ya dirêje, di awayê xwe de bilind û di mijarê de qehreman e.*”<sup>58</sup>

Hinek mînakên romanê: Îlyade û Odîse yên Homer, Aneydî Firçil, Romana Gilgamêş û Komediya Îlahî ya Dantî. Karakter: Kesê serekî yê romanê yanî qehremanê romanê ye. Bi taybetî ev bihayê çanda xwe derdixe, weke Odiyes di romana Odîse de behs dike. Karakter, êş û xanedane, dibe ji bo destkeftiyên mezin an jî ji bo bûyerên mezin xebat li ser tê kirin.

Giringiya Kesayetî Vêrcîna Wilf di derbarê giringiya kesayetiyan de wiha dibêje: “*Kesayetî bingehê romanê ye û roman jî ji bo derbirîna wan kesayetiyan hatiye avakirin.*” (Cimîs û Kunradu. Exrun) Giringiya kesayetiye wê demê diyar dibe ku ziman bi tenê û bêyî kesayetiye zehmete ku bikare rolê xwe bileyîze. “*Bi heman awayê bûyer jî*

<sup>56</sup> Rêzan Rehman Xidir, *Teknikî Gêranewe Le Romanekanî Abdûllah Serac Da*, R 99

<sup>57</sup> Perêz Sabîr, *Bînyatî Hûnerî Çîrokî Kurdî-Le Seretawe Ta Kotayî Cengî Dûwemî Cîhanî*, Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Silêmanî, S. 2001, R 141

<sup>58</sup> Êdward Hêrş, *Enwae Şexsiyet*, Neşir Sixn, Tehran, S. 1377, R 56

*tenê di dema nebûna kesayetî de zehmete ku rolê xwe weke pêwîst bileyîze. Ji ber ku her kesayetî wan bi merc dike, wan bilind û nizim dike".<sup>59</sup>*

### **Li vir emê bi çend xalan behsa giringiya karakter de bikin**

1-Karakter ligel romanê gelek giring e, ji ber ku kesê serekiye û çîrok li derdora wî/wê dizivire.

2-Qehremanê romanê ji kesê asayî (normal) zîrektir, bihêztir û jîrtir e.

3-Qehreman li pey tiştek binirx digere.

4-Piraniya caran zilamê xirab ê naveroka çîrokê, ji qehremanê wê gelek neciwan û xirabtir e.

5-Cîhana Xwedayan (Îlahî) dest li bûyerên çîrokê werdide.

#### **3.2.1. Karakter û çêkirina karakter di romanê de**

Mirov û karakterî (characters) her çîrokek bingehê giring ê wê ne. Roman ji her çarçoveyeke hûnerî ya din zêdetir ligel mirov û kesan de dem û sewda heye. Mirov dikare bêje roman bêyî karakter ti hebûna wê nîne. Karakter beşeke ji çîrokê nayê qût kirin. Ji ber ku roman bêyî karakter serî hîlnade. Karakterê romanê kesin, bi awayekî din hatine nava cîhana romanê û bûne xwediyê jiyaneke nû. Eger wisa be, karakterên romanê li ser bingehê xwe, xwediyê exlaqek, gotin û encamên mirovên rast dixûliqîne. Di pirtûka bi navê 'Ji ber Karakter û Çêkirina Kesayetî' de wiha behsa wê tê kirin; "*Kesên hatine çêkirin (Hatine xûliqandin), bi xwe di roman û nimayîşkirina nameyê de derdikevin, ji vê re karakter tê gotin. Kes li şûnwarên hatine vegêrandin an jî nimayîşkirina ferdekê ye, çawaniya derûnî û exlaqê wê; di pratîkê de tişta dibêje yan jî*

---

<sup>59</sup> Rêzan Rehman Xidir, *Teknikê Gêranewe Le Romanekanî Abdûllah Serac Da*, R 131

dike, *xwediyê hebûnê be*".<sup>60</sup> Afirandin û kesayetiyan wiha ji bo xwendekarên romanê, bi nêzîkbûnek zêde rastiyan derdixe û ji vê yekê re çêkirina karakter tê gotin.

*"Karakter keseke nivîskar weke mamosta û hêza afirînerê hebûn dixûliqîne, bi wateyek din kesekê afirînerê mejiyê nivîskar e"*.<sup>61</sup> Li ser vê yekê wiha dibêje: "Giringtirîn hêmaya biwêja girêdana roman û giringtirîn bikerê mezinahiya romanê ye. Kesayetiyan romanê nêzî piraniya hemû romanên, di berfirehkirina mezinahî û girêdana xwe ya kesayetiyan, gelek roman an jî bi awayekî yasayî mirov sût jê werdigirin. Arîsto jî wiha dibêje: "Kesayetiyan, çiyetiyan (mahiyet) û xwezayî, di beşdarbûna trajediyê de dide nasandin. *"Kesayetiyan, çiyetiyan segek an jî çend kesên di roman, kar an jî kiryanan de dike ye. Kesayetiyan bi awayekî asayî dîtinek giştiye. Ji ber hebûna mirov jî tê pêşkêş kirin û me ber bi wî alî ve pal (deh) dide. Samirsêta Miwam li ser wê kesayetiyan wiha dinivîsîne: "Hinek caran nivîskar mirovek asayî weke wêneyê karê xwe hildibijêre. Ji wî kesayetiyan wêrek û mezin diafirîne. Gelek tişt di wê yekê de tên dîtin û ji dîtina serdemane dûr maye."*<sup>62</sup> Kesên di nava romanê de di eniya bûyerên romanê de bi dû awayan dijîn. An heta dawiya romanê nayên guhertin an jî di dawiya romanê de bi awayekê tên guhertin. Di awayê yekemîn de kesayetiyan romanê di dawiyê de her ewbû ku di despêkê de bûye weke kesayetiyan di nava çîrokan de. Şah Xûrşîd, qehremanê çîroka dûr û dirêj a Semekî Eyar kesayetiyanê nayê guhertin û rawestiyayî heye. Çi cihê ew biçeyê û her karê bike, di kesayetiyanê yekemîn de guhertin nayê kirin. Lê şerte ku kesayetiyan romanê di eniya bûyerê de bi awayekê were guhertin an jî di dawiya romanê de bibe mirovek cûda. Jêre kesayetiyanê tê guhertin tê gotin.

Ger wisa be em dikarin bêjin, kesayetiyan di çîrokê de berteka (reaksyon) xeyalî û fikrên nivîskar bi afirandina kesê jîngeha derdora xwe ye. Anîna wan a ji bo nava romanê, bi xwe hewl dide ku li cihê yên li beramberî xwe pêwendiyê çêbike, baxive û her bimîne. Bi awayê ku hizir û kiryanên xwe di nava xebitînên kesayetiyan romanê de datîne.

<sup>60</sup> Cemal Mîr Sadiqî, *anasr Dastan*, nişaret sixn, Tehran, çep çiharim, S.1380, R 182

<sup>61</sup> Yonis Ebrahim, *hînr dastan niwîsîf*, neşir El-merkez, Tehran, S. 1369, R 52

<sup>62</sup> Hûsên Cemal, *Merahhelî Roman*, Întîşarat Şibahing, Çapa Yekemîn, Tehran, S.1380, R 247

Gelek xwedî dîtin û rexnegirên biwêja romanê, kesayetiye weke giringtirîn hêmayên romanê datînin. Yonsî di vê derbarê de wiha dibêje: "*Giringtirîn bingehê girêdana romanê û sedema herî giring a pêkhatiyê, mezinahiya romanê û kesayetiya wê ye*".<sup>63</sup> Ji despêkê ve mirov bi rêya kesayetî, hizir û hestyariya xwe bi agehdarî yan jî ne agehdarî aniye ber çavan. Yan jî lêdana baranê têne, heta ku mûbedêk pêngav ber bi sînore mirinê ve tavêje û xebera piştî mirinê aniye. Ji wî kesê ser spî heta xwedanasê li derdora wî geriyayî û li derdora keebeyê dizivirî, ji ciwaniya xezalê çokên xwe xist jêra xwe. Li bajarê Koçkistan û Zayîr Mihemedê çek li ser milê wî û têhnî "Wêstlend" Bi awayekî din ê kesayetiye û bûyerên romanê dinirxîne û dibêje: "*Di romanên serketî de roman û kes bi ti awayî nabin ji hev ben diyar kirin. Herdu diyarde bi hev re tèn danîn û ger wiha be; nivîskar rastiya wê tiştê weke alîkarê henegeke neçaverêkirî yan jî taybetmendiyek din veşartî û divê xwendekar sedema wê bibîne.*"<sup>64</sup>

Ger wiha be roman nivîsî gelek kesayetiyan di afirîne, rastiya li ber çavê wan li kolan û bazaran de tê dîtin. Kesayetiyan romanên xwe ji kesên civakî werdigire. Forstêr 2 di bersiva pirsyarek ji ber rastiya kesayetiya romanên de wiha dibêje: "*Kesayetî şûnwarên min, ji yên fikrê min ji wan hez dike yan jî kerba min ji wan diçe, hatine hilbijartin. Yan jî dibe ku dane ji kesayetiya min an jî ez bi xwe bim.*"<sup>65</sup>

### 3.2.2. Taybetmendiyên karekter

"*Ger wiha be, romanek di warê pêkhatiya kesayetiyan de bikeve ber lêkolîna yekemîn û pirsyarên herî pêwîst ku pêwîste mirov ji xwe bipirse, evin; Ev romana çîroka kê ye? Pêwendiya di navbera kesayetiye serekî û kesayetiyan din de çiyê? Kesê serekî heta çi astê weke kesên din e û heta çi astê cûda ye? Gelo kesayetiye serekî hêjayî têgihîştinê ye, gelo bi wî awayî dibe û çêdibû despêkiyê bidinê? Gelo hevxiyê*

<sup>63</sup> Yonis Ebrahim, *hinr dastan niwîsî*, R 63

<sup>64</sup> Pîtir Wêstland, *Enwae Destan Niwîsî*, Wer. Mihemed Hûsên Ebasî, Portemîcanî, Întîşarat Mîna, Tehran, S. 1371, R 123

<sup>65</sup> Mihemed Henîf, *Merahelî Xelqî Dastan*, Neşir Tehûrî, Tehran, S. 1372, R 111

*xwendekar dadirêje? Yan jî kiryar û azirandin mirovê serekî yê awazvan e?* <sup>66</sup>Elbet, “*Di kesayetiyê ti pirtûkê de ne kesayetiyek rast e. Kesayetiyên romanê weke kesayetiyên rast in, di heman demê ne wekhev in jî.*” <sup>67</sup>

Karakterê xwediyê gelek çarçoveyan, ‘Karakterê gelek ên ji ber vegêrandina keşfa kesên din bin. Di xwe de ti kesayetiyek nîne, berî hev naskiriye. Berî dîtîne gotinên wan hêjane, awayê vekirinê diyarkirî, rê û rêbazekê bikartîne. Ji vir û pê ve em dizanin ji bo wêne, keseke texlîdê hûnerê sînemayeke navdar dike. Ev jî kesayetiya çarçove derdixe. Kesayetiya çarçove ya zêdetir hatî nas kirin û li ber çavan tê dîtî, ji ber ku mirovên li kolan û bazaran wan dibînin, xwediyê gelek taybetmendiyên in.

### **Bi sê awayan dikare taybetmendiyên karakterên romanê diyar biken**

1-Nav

2-Şîrovekirin û Pesindayîn

3-Guftûgo û Kiryar

**1-Nav:** Herî zêde nav ne tenê derdixe holê ku karakter çi kesin, belkî wê yekê pêşkêş dike ku tiştê nîşanî te dike. Nav kilîla ji bo têgihiştina taybetmendiyên karakterê romanê û cihê civakiya wan e.

### **2-Şîrovekirin û Pesindayîn**

Karakterê romanê dikare bi ragihandina rewş an jî wêne dayîna hev, hevûdin bi hev bidin nas kirin. Nivîskar eşkere dike ku karakter kîne, ji kûderê ne û hinek caran jî çi tê serê wan. Riwaletî û jîngeha (ekolojî) derdora wan bi baldarî eşkere dike. Tiştan ew dorpêç kirine û pêkanîna kesayetiya wan nîşan dide.

---

<sup>66</sup> Mehmût Fitûhî, *Terhî, Pezû Hîşî Nexdît Edebiyat Dastan*, Cehat Daniştgahî, Tehran, S. 1376, R 56

<sup>67</sup> Rabirt Sikûliz, *Henase Dastan*, Wer. Ferzane Tahîr, Neşir Merkez, Tehran, S. 1377, R 19



### 3-Guftûgo û Kiryarî:

Mirov gelek weke di dilê serpehatiyek taybet tê danîn. Bi derxistina bertekan û taybetmendiyên wê, xwe derdixe holê. Karakter bi rêya tiştên xerîbiya wê dikî, tê gotin û tê kirin. Bi rêya tiştên kesên din ji wan re dibêjin û ji ber wan dibêjin, tên naskirin. <sup>68</sup>

### 3.3. Curên Karakter

Bi giştî dû Karakterên Romanê hene:

#### 3.3.1. Karakter di warê ekê de

##### A-Karakterê serekî

Karakterê serekî ji navê xwe diyare, ew karaktere ye ku piraniya kar û bûyerên serekî encam dide û giringiyê dideyê. Lewra karakterê serekî, "*Bûyerên di nava romanê de pêş dixê û wan ber bi pêş ve dibe.*" <sup>69</sup> Lewra rolê serekî di nava romanê de dibîne. Karakterên din di warê tevgerkirin, hemû pirsgirêk, astengî û hêskariyan jêre dike. Ji ber ku karakterê serekî rolê serekî di nava romanê de dileyîze. Lewra zêdetir behsa wî/wê tê kirin, zêdetir teknîkên vegêranê ji bo hûrtiyên jiyane eşkere dike. Di vê demê de jî karakterê serekî, "*Ew kesê naskirî û diyare ye romannivîs hewl dide zêdetir derbixê pêş.*" <sup>70</sup> Ji ber vê şîroveya jor ji me re derdikeve holê ku karakterê serekî rolekî berbiçav di nava teksta romanê de dileyîze. Herwiha mirov dikare bêje, ji hemûyan zêdetir çavê romannivîs li ser e. Di warê diyar bûn, tevgerkirina bûyeran û xistina wan a di nava zextê karakterên din. Herwiha kesayetiya mijara romana kurt an jî romanê ye, baldariya xwendekarê romanê dikêşe ser xwe. Ji vê yekê re "*Karakterê Serekî yan jî Karakterê Navendî ya Romanê' tê gotin.*" <sup>71</sup> Di mezinahiya romanê de mijar û navîna romanê,

<sup>68</sup> Mehmût Fitûhî, *Terhî, Pezû Hîşî Nexdît Edebiyat Dastan*, R 55

<sup>69</sup> Mihemed Hesân Ebdûllah, *El-Rîh Fî El-Rîwayet El-Erebiyat*, Sîlsîleta Alem El-Erfet, Dewlet El-Kiwêt, S. 1983, R 55

<sup>70</sup> Hemze Fadil Yûsif, *Hereket Neqîd El-Qiset Fî El-Êraq (1968-80)*, Rîsalet Macêstêr, Camîet Silahedîn, S. 1988, R 74

<sup>71</sup> Mîşal Bitul, *Bihûz El-Fî El-Rîwayet El-Cedîdet*, Wer. Ferîd Întînîwîs, Menşûrat Dar Wîdat, Beyrût, Libnan, S. 1371, R 70

Karakterê hemû bûyeran û kesayetiyan dide nas kirin. Wê mijara giring ber bi pêş ve dibe û ji her tiştê giring çarenivîs û dawiya serpêhatiya wan dibe xwedî giringî. Em ji kesayetiyeke wiha re dibêjin, Karakterê yekem an jî Karakterê serekî. Bi wateyekî din kesayetiya herî giring ê romanê, Karakterê mijarê ye. Ew jî tevayî mezinahiya romanê dide nasandin; sûd ji derxistina çarenivîsa wî/wê werdigire. Mijara bûyeran li ser encamê vedike, hizir û hestên wî hatiye girtin û rawestiya ye. Karakterê serekî têhilkişîna xwe li gel zincîreyek ji bûyeran ber bi pêş ve dibe. Yan jî plot an pêkhate, yan jî lihevkirina vegêrana romanê pêktîne. "*Karakterê serekî hêvênê herî giring ê derûnî, peyama an jî hestê romanê vedigêre. Herî kêma di vegûhestinê de rolê serekî dileyîze*".<sup>72</sup> Karakterê serekî hinek çarçûmê jêre tê gotin 'Qehremanî Serekî.' Tevî ku ne pêwîste Karakterê serekî timî xwediyê taybetmendiyên qehremanê sereke be.

Karakterê serekî zêdir bi rêya kiryar û tevgerkirinê xwe ve tê nas kirin. Ev jî wisa dike ku karakter zindî bibe, ji ber ku kiryar û helwest aliyê erênî û nerênî karakter baştir diyar dike. Wisa li xwendekar dike ku helwestekê werbigire. Nekû ev pesnê ku ji aliyê çîrokbêj an jî karakterên din ve dike. Ji ber ku kiryar, tevgerkirin û helwest pêwîstî bi anîna belgeyan nîne. Li ber çavê xwendekar dibin bûyer û xwendekar zû baweriya xwe pê tînin. Herwiha kiryar û helwest zêditir di fikrê xwendekar de dimîne.

### **B-Karakterê neserekîyan jî karakterê navîn(lawekî)**

Giringêdana romannivîs a ji bo karakterê serekî û zêdetir di nava bûyeran de derxistina pêş, nayê wateya ku karakterên din bên paşguh xistin û ne giring bin. Ji ber ku ligel romannivîs hemû karakterên serekî û yên din, tevî erênî û nerênîbûna xwe giring in. Ew jî ne li ser bingeheke kar, paldan an jî çêkirina bûyeran; belkî ji ber ku ji îcata wan e. Romannivîs bi xwe wan dixûliqîne. Roman ji "*Wêneyê jiyane ye bi awayê piralî*"<sup>73</sup> pektê. Jiyan jî hemû piralîye û hemû cûreyên mirovan di nava de hene. Herwiha gelek çarçûmê karakterên neserekî rolek bi bandor di eşkerkirina gelek aliyên veşartî û nediyar

<sup>72</sup> Kamus Mehdî, *Enwae Şexsiyet Ha Cihan Ra Dastan*, Neşir Nî Tehran, S. 1377, R 28

<sup>73</sup> Hemze Fadîl Yûsîf, *Hereket Neqîd El-Qîset Fî El-Êraq (1968-80)*, R 103

ên romanê de digêre. Dema hinek aliyên veşartî yê karekterê serekî eşkere dike û piştî balê dikişîne ser aliyên ne diyar. Herwiha di nava karekterên romanê de yek ji hemûyan zêdetir derdikeve pêş. Lê di heman demê de gelek karekterên din jî hest bi hebûna xwe dikin, rol û bandora wan di jiyana de heye. Di bingeh de pêşveçûn diyar dibe. Bi vî awayî di vî demê de karekterên neserekî rolekî berçav di pêşvebirina bûyeran û karekterên din de dileyîze. Bi taybetî jî ji wê demê de karekterê serekî kar encam dide û karekterê neserekî jî karekterên serekî çalak dike. "*Hinek kesên din li beramberî 'Kesayetiye Serekî' de derdikevin an jî 'Kesayeti ne ligel bûn' baştir an xirabtir nîşandin. Ji vê re kesayetên Rûbirû tîn gotin. Kesayetiye hevraz, kesayetiye ne serekiye, bi xwe baweriya kesayetiye/a serekî werdigire û tiştên veşartî jêre dibêje.*"<sup>74</sup>

### 3.3.2. Karekter di warê pêkhateyê de

#### A-Karekterê tê gûhertin

Çêkiriyeke aloz û xwediyê pêkhateyê veşartiyê. Di çawaniya fikirîn, aliyê civakî û derûnî de. Xwendekar nikare berî xwendina romanê, biryarê li ser bide, yan jî berî dema çarenivîsê diyar dike. Karekterê Tê Gûhertin ew karekterê ku reaksiyonek li ser pêşvebirina çawaniya bûyer û karekterê Tê Gûhertin heye. Kesê tê guhertin, "*Bi rêya gelek bûyerên li pey hev tê holê. Qonax bi qona eşkere dike, guhertin di nav de rûdidin û bi dawîhatina karên hûnerî bi dawî dibe.*"<sup>75</sup> Di encama alozbûn û pêşvebirina bûyeran de, ber bi pêş ve diçe û digûherîne. Lê dema romannivîs dixwaze kesayetiyeke Tê Gûhertinnîşan bide, lê dema romannivîs dixwaze kesayetiyeke Tê Gûhertin nîşan bide, hemû aliyan nîşan nade. "Hêdî-hêdî eşkere dibin, li gor bûyeran pêş dikeve û di encama xebitîna berdewam a ligel wan bûyeran dibe." Ji bo xwendekar bi temamî kesayetiya wî nas dike, ev jî dibe sedem ku karekter bi berdewamî di nava guhertin û pêşketinan de be. Li vir jî kesayetiyeke Tê Gûhertin di nava romanê de bingehê aloz e, ji ber ku timê kar û pîşeyên nû jê tîn çaverêkirin.

<sup>74</sup> Cemal Mîr Sadiqî, *Edebiyat Dastan*, R 71

<sup>75</sup> Mihemed Hesana Ebdûllah, *El-Rîh Fî El-Rîwayet El-Erebiyat*, , R 137

Karakterêke bi berdewamî bi bûyerên tê serê wî/wê tê gûhertin. Aliyekê kesayetiye dîtin an jî taybetmendiya Karakterê Tê Gûhertin û dibe ku ew gûhertin kûr bibin an jî kûr nebin. Pêşiya wê zêde yan jî kêr be.

Ji ber ku kesayetiye/a tê gûhertin, ji bo xwendekar awazvane û ger baweriya hêja be, divê nivîskar sê şert û mercan di gûhertinan de li berçav bigire:

1-Gûhertin divê asta lêhatina wî kesayetiye be yan jî bi xwe dibe sedemê wan gûhertinan.

2-Gûhertin divê di asta pêwîst, berî şert û mercên kesayetiyan bin.

3-Divê dema pêwîst hebe, heta wan gûhertinan li gor giringiya awayê dîtina jîr rûbidin.”<sup>76</sup>

Afirandina karakterên bi vî awayî ji aliyê roman nivîs ve karek aloz, sade û ne hêsane. Belkî şarezayî û lêhatina asta rewşenbîrî û ezmûnên romannivîs diyar dikeve. Li wir komek taybetmendiyên karakterekê diafirîne. Lewra pêkhatiya aloz a karakter vê red dike. “*Bikarî bi hevokan an jî çend hevokên kêr, gûzarişt li kesayetiye bike.*”<sup>77</sup> Belkî divê romannivîs balê bikişîne ser, her carê beşek pirsgerêkan eşkere bike. Ji bo xwendekar jî şarezaiyan jê peyda bike.

Taybetmendiya vê karakterê ji me re eşkere dibe ku qonax bi qonax pêşdikeve. “*Li gorhelwest, di helwestekê de reftarekî nû û aliyekî veşartî ye kesayetiyan ji me re eşkere dike.*”<sup>78</sup> Ango ev karakter bi berdewamî tê gûhertin û tiştên jê nayê çaverêkirin dike. Bi wê wateyê timî tiştên nû jê tîn çaverêkirin, ji ber bi xwe biryarê li ser asta helwestan dide. Karakterê tê gûhertin zindîbûnek zêdetir dide romanê û ji ber cûrê xwe hewestên

---

<sup>76</sup> Cemal Mîr Sadiqî, *Edebiyat Dastan*, R 96

\* *Me li vir cînavkên 'Wî, Wê' bikaranîne. Ji ber ku em nîzanin ew karakter nêr an jî mê ye. Ji ber ku di zaraveyê Kurmancî Jêr (Sorani) de ti cûdahî di navbera nêr û mê de nîne. Lewra me di herduyan de nivîsandîye. Lê di Kurmanciya Jor de nêr û mê hatiye cûdakirin. Ji bo nêr, 'Wî' û ji bo mê jî 'Wê' hatiye bikaranîn.*

<sup>77</sup> Mihemed Emîn Ebdûllah, *Şakas Le Romanî Kurdî-Kurdistanî Êraq Da*, (1990-1997), Namey Master, Zankoy Selahedîn, S. 2000, R15

<sup>78</sup> Îdward Morgan Forstêr, *Cenbanekani Dastan*, Wer. Mûhseni Sûleymanî, Neşir Negahe, Tehran, S. 1369, R138

cûda yên berhev ligel karakterên din, bala xwendekar dikêşe nava bûyeran. Vê yekê jî peywendî bi xwezaya mirov ve heye. Li gor cûdahiya dîtina wan a jî bo bûyer û pêşveçûnên li derdora wan ên bi awayekî rêjeyê tîn wergirtin, herwiha mirov bi xwezaya xwe jî guhertina hez dike û bi awayê jiyaneke nayê guhertin bêzar dibe. Herwiha vê guhertinê de jî di nava romanê de xwe nîşan daye.

### **B-Karakterê nayê guhertin**

Karakterê Nayê Guhertin, *“Karektereke di pirsgirêkan de sadeye, ne aloze, xwediyê soz û taybetmendiyeke ye. Ji despêkê heta dawiyê her weke xwe dimîne.”*<sup>79</sup> Ev jî wisa li karakter dike ku li beramberî bûyeran helwestek hebe. Herwiha "Ebdûlhalik Mirtaz", karakterê wiha pênase dike; *“Karekerek sadeye, li ser hev berdewam dibe û bi giştî guhertin li ser jiyana wî de nayê.”*<sup>80</sup> Li vir jî me re eşkere dibe ku karakterê nayê guhertin xwediyê taybetmendiyeke ye, heta dawiya romanê xwediyê heman taybendiyê ye û li beramberî bûyeran ti helwesteke wê ya din nabe. Herwiha *“Kar di bûyeran de nayên kirin. Romannivîs kesayetiyêke bi temamî û kamilbûnê bi me dide nasandin ku karîna pêşvebirin û ber bi pêş ve bûnê nîne. Lewra bersiva wê ya derbarê bûyeran de tê zanîn.”* Lê amadebûnek berbiçav heye, gelek caran bandorê li karakterên din dike. Wisa lê dike ku jî xaleke guhertinê ve hemû jiyana wî bigûherîne. Herwiha ew karakter di warê hest û dîtînê de ne xwediyê baskên cûr be cûr e. Belkî di berdewama qonaxa vegêrandinê di astekê de dimîne û pêşde naçe. *“Di vegêrana romanê de tenê giringiyê dide rol û dîtînê xwe. Ligel wî bi ti awayî ne girînge ku taybetmendiyeke xwe ber bi pêş ve bibe.”*<sup>81</sup> Ango ev karakter li gor helwestê nayê guhertin, ev jî taybetmendiya vê karakterê ye.

<sup>79</sup> Mihemed Xenîmî Hîlal, *El-Neqid El-Edebî El-Hedîs*, Dar El-Seqafet, Beyrût, Libnan, S. 1973, R565

<sup>80</sup> Ebdûlmelîk Mertazî, *Fînezeriyet El-Rîwayet, Behs Fî Teqniyat El-Sirt*, Sîlsîlete Kîtap Alem El-Meerîfet, El-Meclîs El-Wetenî El-Seqafet Wel Finûn Wel Edeb, El-Kwêt, S.1998, R 89

<sup>81</sup> Dawid Xetaşe, *Qezaya El-Neqid El-Erebî Qedîmeha Hedîsaha*, Dar El-Seqafete Lîl Neşir Wel Tewzêh, Emman, El-Erden, S.2000, R 126

"Kesayetiyeke dema bûyer tên serê wê/wî neyê gûhertin an jî gûhertinek kêr tê serê wî/wê ye. Di dawiya romanê de her weke ya despêkê hatî serê wî/wê be, cihê bûyerên romanê li ser nebe, şertê cihê wê çêker be û kêr bûbe ye." <sup>82</sup> Afirandina karakterê Nayê Gûhertin ji aliyê romannivîs ve ne bê armance, belkî erkê vî karakterî tiştên veşartî yên karaktere ber bi pêş ve bibe ye.

## CÛRÊN DIN ÊN KAREKTERAN

### A-Karektera pir awayî

Karektera Pir Awayî, Awayê derdixe ku taybetmendiyan gelek tîm an jî çînekê ji xelkê û kesên din cûda dike. Ji bo afirandinek wiha, pêwîste kesayetiyeke rast ji çend mînakên rast û zindî werbigire. Bi hûnermendî beşdar bike, heta karakterê awayê em dixwazin diafirîne. Mercê di dirêjahiya demê de taybetmendiyan gelek civakî yan jî çîna kesayetiya gelek awa rastî gûhertinê dibin. Eger ev taybetmendiyan cihê wan negire, êdî ew karakterê nikare weke karakterê bê hêjmartin. Belkî mirov weke gelek kesayetiyan sozdayî bi nav bike.

### B-Karakterê nîmayîşkirî (niwandî)

"Karakterê nîmayîşkirî kesê ku berhemê hemû kiryar û gotinan e. Xwendekar ber bi tiştêkî ji xwe zêdetir ve bibe û amojgariyan lê bike ku weke anîna berçav a karke ne xerîb yan jî hêzeke rizgarkirî yan jî derxistinê ji hêviya dîtinê ye." <sup>83</sup>

Gelek nivîskar ji bo berfirehbûna wateya romanê, sûd ji nîmayîşkirinê werdigirin. Nîmayîşkirin, bi serhatî, bûyer, tişt, girêdan an jî wêneyek balê bikişîne ser tiştêkî ji bilî

<sup>82</sup> Cemal Mîr Sadiqî, *Edebiyat Dastan*, R 71

<sup>83</sup> Con Bîrîn, *Kîtabet El-Rîwayet*, Wer. Mecîd Yasîn Mûraceut: Dr. Methî El-Dirûsî, Dar El-Şûun El-Seqafet El-Amet, Bexdat, 1993, R 89

weke xwe be, ev jî hizir û hest zêdetir derdixe. Di wêjeyê de dû awayên nîmayîşkirinê hene:

Sahî û nîmayîşkirinek sozdare û li her cihekê nîmayîşkirin giringiyek zêde yan jî hizrên weke germa, berhme û ronahiyê taybet e. Xebitîna nîmayîşkirinê ew e ku nivîskar nîşan dide ku pirsekê bi giringiyek zêdetir nîşan bide. Bêyî sûdwergirtina ji hevoka giştî û hevokên helbestvanên wateya wan a kêr heyî, hizir, bilind kirin û dîtinên wê derbixe. Bi awayek giştî her tişt dikare bê nîşan dan. Hemû tiştên pêwîstî pê heye, ew e ku di çarçoveya riwalefî û maddî de wateyeke wê hebe. Hinek caran kesên nîmayîşkar li cihê qehremanan, pêwendiyê datînin. Hinek caran weke vegêrandana romanê yan wateya kurdane le tê. An jî di nav de kiryar, mirov, tişt, hizrên taybet felsefeyê li dijî ol (dîn, bawerî) in.

" *Karakterê nîmayîşkirî, wê karîne dide nivîskar ku wateyên exlaqê bilind an jî çawaniya rih û rewşenbîriyê bixe di çarçoveya kiryarê de. Dema kiryar û gotara kesayetiyeke, hizir an jî fikreke pêşkêş dike, dibe ku weke yê karakterê nîmayîşkirî bê danîn. Ger wiha be, kesayeti nikarin nîmayîşkirî be. Eger ew tişteki din pêşkêş bike, ew tişt tenê bi awayê nîmayîşkirî xwe têgihişt, gelek jîre.*" <sup>84</sup>

---

<sup>84</sup> Mîmînit Cemal Mîr Sadiqî, *Wajename Hinerî Dastan Nîwîsî*, Ketîbî Menaze, Tehran, S. 1377, R107

#### 4. KAREKTER DI ROMANA "*HESAR Û SEGÊN BAVÊ MIN*" DE YA ŞÊRZAD HESEN

##### KAREKTER

Romana 'Hesar û Seyên Bavê Min' di aliyê curê romanê de, romanekî derûnî (pîskolojî) ye. Cûrekî romanê yê derûniye ku mijara wê eniya 'Awayê Zincîrî (Yek li pey yekê) û Nehatî Qûtîkirin' e. Gûhertî û di dawiya wijdanê de, hestê agahdariya wî jê heyî yê kesek an jî çend kesan e. Li vir armanca peyva 'Wijdan an jî hestê agadariya gelek zanyarên cûda, li dijî kiryar, mantiq û hestên ferdin. Ev komele qonaxa herî nizim a berî şekil wergirtina devkî û axaftinê; heta gimika (lutke, zîrve) qonaxa peydabûna dîtin û behsa mejiyê pejirandî digire nava xwe. Herwiha li vir armanc ew e ku mejiyê ferd "Eniya Pêla Mejî"

Zaraveya Şepola Mejî-Stream of Consionsness" cara yekemîn Wilyem Cîms di pirtûka bi navê 'Bingehên Pîskolojiyê' de li sala 1980'an bikaranî. Ew romannivîs di dema diyarkirî de, di asta cûdahiya agehdarî, eniya berdewamiya hestan, fikir, xeyal û daxwaza dîtinan de ye. Yan jî mirov bi awayekî din dikare bêje piraniya romanên derûnî (pîskolojî) pêkhatiye. Çi dema biryar hat dayîn ku naverokê temam û rast, bê şîrovekirin û wesif kirin. (Mejî yan jî Aga) Divê ev regeza cûr be cûr û wekhevîyê, bêyî peywendî û derveyî mantiqî weke pêleke wêne, wêneyên xeyalî û fikir derbixin. (Ango raste, weke eniya tevlihev weke nerêkûpêkiya mejiyê.) . Romana pîskolojî sûd ji ji gelek rêbazên cûr be cûr werdigire, heta bi xwe agehdariya mirov temamtir û bihêztir dibe.

Em dikarin bi awayekî giştî bêjin ku piraniya romanên pîskolojî, yan weke 'Henrî Cîms' û 'Dostoveskî' eniya agehdarî ji xwe heyî bi awayekî rêkûpêk hestê wan şîrove kiriye. Yan jî weke Marsîl Porst di romana 'Ji Soraxa Zemenî Win bû' (1913-1927) de, bi rêya gûman birina wateyek ji ber wateyek din, rûpelê bîranînên borî nû dike û nivîsîne. Lê romana Eniya Pêla Hiş ya pîskolojî, herî zêde giringiyê dide qonaxa berî awayê pêkanîna devkî û gotar. Ango 'Wateya asta nedevkî û ne gotarî mirove.' Di vê qonaxê de wêneyê xeyal dibe cûrê wê dij kiryarîyê û bersiv bê dayîn nehatibin keşif



kirin. Herwiha nexistine çarçoveya peyvan, ji ber di cîhanek wiha de lojîkek rêzimanî nîne.

Karakterên serekî yê vê romanê Perjîn û Segeyên Bavê Min behsa kesekê dike ku kurê mezin ê male ye, ketiye bin bandor û zexta xwestekên giran ên bavê xwe. Ew di rewşekî xirab de dijî. Ji aliyekê ve ji ber zexta bav û ji aliyekî din ve jî dayîk, bira û xwişkên wî dengên nerazîbûnê li hemberî wî nîşan didin. Lewra ew dixwaze ji kelhê derbikeve û rizgar bibe. Herwiha ew wisa evîndar bûye ku heskirinekî nepaqije û ji aliyê jinbava xwe ve tûş bûye, rastî kiriyara seksî hatiye. Lê ew vê yekê red dike.

Ew destana xwe bi vî awayî vedibêje ku di bin sîbera bavê xwe de jiyana xwe berdewam dike. Lê bavek ku hemû biryar û daxwazekê bi zorê li ser ferz dike û di vê navberê de jî kesayetiya xwe winda dike û girêdayî destê bavê xwe bûye.

*“Ew mêrê di dirêjiya temenê xwe de ez kirime sîbera xwe. Sîberek kal, sîberek ku tîrêjên roja zivistanê bi nîv mijî wêneyê wê çêke. Her wê roja ku ez girtîm û ji golikê ketim, her ji wê demê ve engoçkê feqyane keyim degirt û diketim xefîka wê. Ez satme dikirim û li pey diketim... Diviyabû ez negiriyabam û min ne gotiban, off... Diviyabû min herdu piyên xwe sivik kiriban, hinek caran jî dovîkê gopalê xwe dida destê min an jî serekê qamçiyê xwe yê sê ziman. (Şerzad Hesên, 18-17: 1998)*

Heta wê kêliya ku kesên di nava kelhê de rastî serdestî û nexweşiya bavê xwe û zordariyên wî dibûn. Lewra timî kurê xwe pal dida û ji bo hewl bide ku cihê bavê xwe bigire û wan ji vê zordariyê rizgar bike.

Qehremanê romanê xwediyê kesayetiyekek pileदार û bihêze. Ji despêka romanê ve di ware kesayeti de xwediyê cihekî giring e. Lê bi berdewamî ji aliyê derdora xwe ve rastî rexneyan tê, çima tû li hemberî zordariya bavê xwe ranawestî. Lê di dawiyê de destê radike, dawî li jiyana bavê xwe tene û dike.

Rabîkarakterêkî diyar ê di nava romanê de ye. Kesayetiyek ku bi berdewamî hewl dida ku hevsera xwe tune bike. Ji ber ku ew evîndarê baxçevanek li derveyî kelhê bû. Ji bo bigihe vê armancê jî pîlan datîna û di wî karî de jî gelek serkeftî bû. Rabî her di meha yekemîn a hevseriya xwe ji fikrê jinavbirina bavê xwe de ye û di heman demê de bi vî awayî kesayetiya Rawî lihevda ku ew kur kesek bê dil û tirsoneke. Lê her di nava hewldanan de bû û ji bo bavê xwe bikuje.

*"Eger tû ne jina dawiyê bûya, jina xweşik û pir ezîz, min ne dikarî bikujim. Rabî ciwane, ji hemû dayîkên min ciwantir û biçûktir bû... Pir ezîz... Wey li Rabî hê jî bûka mehekê bû, rojekê ez li se naûrê girtim û sitlek ligel bû, li beramberî min rawestiya û awirek da. Xwe li ser naûrê de şor kir, gotinek kir û li derdora bazinê naûrê zivirî. Rast ket beramberî min, zêdetir xwe li ser naûrê de şor kir û naz dikir. Sing û giraniya herdu memikên wê, sityanên wê didirand û paxila kirasê wê yê tenik hê zêdetir dadiket jêr. Cûya tenik a di navbera herdu memikên wê de ez gêj kirim. Gelek nemabû serê min gêj bibe û bikevim di nava bîrê de." (Şêrzad hesen, 1998)*

Hemû hewldanên Rabî ji bo wê yekê bûn bigihe heskiriye xwe û divê ji wî cihî rizgar bibe. Lewra plana kuştina mêrê xwe danî û ji bo bigihe wî kurî jî, dive sûd ji ciwaniya xwe wergire. Rabî dizanî ew û hemû kesên di nava kelhê de hemû jî weke girtiyan in, tenê ji bo armancên cinsî tînan bikaranîn. Lewra li vir fikra wê yekê kiriye ku tenê rêya kuştina hevserê wê, kurê mezin ê xêzanê ji bo xwe rakêşe û bi awayekê wî evîndarê xwe bike û bi vî awayî jî dikare bigihe armanca xwe. Li vir bwêj pal dide ku bavê xwe bikuje.

*"Piştî sê şevan, sê şevên piştî awira ku Rabî li min kirî. Wê awirê ez wêran kirim. Wisa li min kir Her li ser hewzê hespê ereb ê bavê min av dida. Min destê xwe yê rastê xist nava hewzê, ji bo ev nava lepên xwe ji wê xwînê paqij bikim hesp berî vexwarina avê, zîmanê xwe pêve anî bû. Min Rabî dît bi awayek westiyayî dihat, li ser beramberî min rawestiya û gotinek kir... Zû derbas bû û hinekê li wir ve tir, dolikê xwe xist nava bîrê de. Wê xezalê wekî ku bêhna nêçîrvan kiribe û tirsîya be, bi çep û rast awir dida..."*

*Herî dawî dengek jê hat... Hêdî-hêdî dengek ji xwe derdixist û dûbare dikir... ( Şêzad hesen, 23: 1998 )*

Piştî kuştina bav, Rabî kesa yekemîn bû xebera xweşî û şahî ji kesên di nava kelhê de dibir.

*“Tû dibêjî Rabî ji berî vê xwîn riştinê... Zêdetir xwîna sed mêran dîtibe, qet têk neçû... Weke ji hemamê hatibe derve û kirasê bûkîniyê kiribe ber xwe... Kirasê xwe kir ber xwe û xwîna meyyayî ya li ser pencereyan di alast. Bavê wî bi birîndarî hewl da ku ber bi kurê xwe ve biçê û ji bo êrişî wî bike. Rabî ji dergeh ve çû aliyê din... û ... Êdî wînda bû... Diviya bû min êdî nehiştiba tiştek din li min kiriba...” (He sin, 32-35: 1998)*

Ew bi vî karî gihişt armanca xwe û ligel baxçevan direve. Herweke me berê behs kirî, Rabî di vê romanê de xwediyê kesayetiyek bilind e.

## **KAREKTER Û CIH**

Di romana ‘Hesar û Segên Bavê Min De’ cihek girtî heye. Romannivîs behsa nava hesarê û cihek girtî dike. Ew cih mezinahî û sinorekî diyarkirî heye. Behsa cihê diyarkirî dike. Bi wateyek din ango cihê girtî. *“Li pêşiya mirovan girtî, sinorkiriye û rûpîvaneke wê coxraftî ya diyarkirî heye. Hemû kes nikare bi serbestî di nav de tevbigere. Ji bilî kesek an jî çend kesan.”*<sup>85</sup>

Her di nava romanê de bavê di nava hesarê de wiha dibêje: *“Deriyê kelhê bi yekcarî girtiye û ti kes nikare kelhê bi cî bihêle. Bavo xwe xwediyê ser, mal û canê candaran dibîne. Ligel bav wisaye ku li derveyê hesar û dûrî çavê bav, ti kes nikare bijî. Her li cihê wî jî divê hemû kur û keç, heta xizmeta hesarê bikin. Heta fikir û xeyalên xirab jî di nava hesarê de tawanên (sûc) wan hene. Cezayê her xeyalek xirab deh celte û her xewneke xiyaretê jî deh qamçiyê.”* (Şêzad Hesên, R. 21) Yan *“Ew cihin ên ku di*

---

<sup>85</sup> Îzelddîn Îsmâîl, *El-Edeb We Finûnet (Dîraset Neqdiyê)*, Dar el-Fikir El-Erebî, Çapa Şeşemîn, Qahîret, S. 1976, R 68

*warê bikaranîna taybet bi kesek an jî komek kesan, li ser hinek kesan hatî girtine. Hemû kes nikare bikarbêne. Awayek taybet ê weke; girtîgeh, mal, hesar, ode û htd... heye.”<sup>86</sup>*

Diyare di romana Şêrzad Hesen de jî di warê cih de, cihek girtî hatiye bikaranîn. Ew jî hesar e. Hesarek jî sinorek diyar kirî heye. Lewra ji bo karakteran weke girtîgehê bû û kesê nedikarî di nava hesarê de bi serbestî tevbigere. Herwiha hesara bav... Girtîgeha kur û keçên wî, tewêleya hesp û hêstirên wî. Qefesa bilbilan, koxik û kolana se, pişik, kêvroşk, kevok, rawestgeha dawî ya yekemîn û dawî ya jinên wî bû. Hestê bav... Girtîgeha kur û keçên wê, tewêliya hesp û hêstirên wî, qefesa bilbilên wî, kûlîna se, pişik, kêvroşk û kevokên wî, yekemîn û rawestgeha dawî ya jinên wî.

## **KAREKTERÊN ROMANÊ**

### **KAREKTERÊ BIWÊJ 'KURÊ MEZIN'**

Biwêja romanê, kurekî ciwane û di girtîgehê de ye. Biwêja romanê hesarek nizim li goristanê di girtîgehê de ye û zimanê wî ji tirsan nagire. Roman ji goşenîgaya hewlên kes ve tê vegeêrandin.

Biwêja romanê di nava xwe de daxive û her ligel xwe daxive. Di vê romanê de biwêja romanê piştî kuştina bavê xwe, jêre derdikeve holê ku zindî û mirina bavê wî her weke hev e. Mirina bavê wî her weke zindî û mirî, fêl (hîle) e. Mirina bavê wî giringiyekî zêdetir daye yê. Roman bi vegeêrandina biwêjê destpê dike. Çalakiyên hewldanên romanê ye. Kurê mezin ê bave û qehremanê romanê, sar û xemgîn di nava cerik de ye, dike qêr û hewar.

Karakterê xebera Romana Hesar û Segên Bavê Min, çîrokbêjê romanê ye. Roman romaneke dijwar, tevgerkirin û gotina zalimane yên bav ên ligel zarokên xwe di nava hestên wî de ye. Çîroka 'Bijî' ya romanê ku kurê mezin ê bavê xwe ye, bi hevdestiya ciwan a bavê xwe ku bi xwe jî çîrokbêjî heskirinekî eşkere bi wê jenîne heye û bavê xwe dikûje. Nivîskarê romanê di çend rûpelên hewlên romanê de, çawaniya romanê vedigêre

---

<sup>86</sup> Tenya Asad Mihmmmed Salih, *Binyatî şiwên le dû nimuney Romani kurdî da( hêlane , Ajdiha )*, çap yekem, dezgay çap û pexşî serdem, silêmanî, s.2011, R 115

û xwendekarên romanê zû bi zû ji vê romanê fêr dikin. Lê dema xwendekarê romanê ji romanê fêr dike, dîsa keyfxweş e ku çawaniya romanê bibîne. Çîrok bêjê romanê ji xwendekaran re behsa cîhanekê dike. Cîhanek gelek paşketî û derveyî pêşketinan, ti nîşaneke cîhana pêşketî li wê cîhanê de heye. Ne otomobîlek, ne cadeyek û ne jî tiştekî din ku weke cîhana pêşketî û nûjen (modern) be.

Ev gotinên vegêrandinê yê romana 'Hesar û Segên Bavê Min', gilê û gazindên kurek bavkuj ku hem ji aliyekê ve ji destê tawanbariyê dinalêne. Li aliyê din jî şerm dike ku bavek dilreq û zalim kuştîye. Bavek ku weke xwîna bi destên wî ve reşbûyî girêdayî, ji milên wî nabe. Ji aliyekî din ve jî piştî xwe dide bêrêzî, kolefî û êşên rizgarbûna ji nava hesarê. Li bendê bû weke qehremanek mezin destxweşiyê lê bikin û navê wî di dîrokê de weke nemir bimîne. Lê tama qehremantiyê ji bo wî tenê şevêk bû. Şevêk ku bi sê darbeyên xencerê bavê xwe kuştî. Di demek ku ew di gimika (lûtke, zîrve) tam wergirtin, di himbêza jina xwe ya herî ciwan û xweşiktir de bû. Ango di himbêza Rabî de bû. Şeva şahî, qêr û xweşiyê, şeva vekirina dergehê, dergehên hesar, şikandina qefesan, qetandina zincîran, şeva azadkirina komêk hesp, kerî (celeb), kêvroşk, pişik, baz û bilbilan. Şeva derbaskirin, xweşî, kenîn, şeva qerebalixî û kernevala azadiyê. Ew şeva ku tû dibêjî qey şeva bi sedan dest bilind kirin, zivirandin û derdora wê girtin. Maç kirin, alastin û hêdî-hêdî bi çavê xwe dît ku dayîk, xwişk û birayên wî weke tû dibêjî dû çav û du zimanên wan hene. Bi yekê dinalandin û bi yê din jî pêdikenîyan. Bi çavekê rondikên reş û bi çavê din jî rondikên aramiyê dibarandin. Şevêk bû û nefret.... Şevêk ku bi zorî, çend caran ajal, balinde, mezin û biçukên hesarê jiqefesan rizgar bibûn û hatibûn derxistin. Bi wê ecêbmayîne hemû veqerîyan nava hesar û qefesan. Ew xeberên dabûnê, nefret li wan kiribûn. Şeva ku dayîk giriya û bi girî ve got: "Nedibû wisa bibûya."

Vêca yê vedigêre bi çavê xwe dît ku çawa bavê wî yê zalim, dilreq û hevezbazê hesarê, bû kesek pîroz. Hemû kesên zilim dîtine û kole, ketin pey cenazeyê pîroz. Dayîka wî gotibû, te çima guhdariya bavê xwe nekiribû û bi wê destê ve çûbû:... Mebesta wî termê dayîka wî be û weke hewarê kiribû.

*Dayîka min Hebê destê min digirt û digiriya... Di got:*

"Tû... Temam... Tû Temam e"

*Bi awayek dînane di ber me re derbas dibû, serê min xist di nava cûya herdû memikên xwe yê çilmisî de... "Dayê çî li te hatiye... Tû çîma wisa dikî?"*

*Bi dengêkî nizim û bi nalîn ve di got: "Pêwîst nedibû tû wisa bûya zarokê min." Herî dawî bi awayek bê hêvî û bi hesretê ve, xwîn rijîya ser herdu çavên wê û ji min re got: "Ma gûhê te ne lê bû, dikir hawar: Temam nefret lê be... Ger tû jinê jî bênî, ocaxa te kûre bibe."*

*"Çawa ma te ne bihîst...? Ew hewara ku çend stêr li asîman vejandî!"*

*"Hoo segên min ên bêwefa, nehêlin ew bavê kûjer pê bihese"*

*Dema min çavê xwe dayê... Di karwan... Ji tevayî çêkiriyên hesar, ji termê pir hêja û samî, bav li ser milê kurên wî ye... Min dît: "Dû nazikan ji vir û ji wir daxwaza xwînê ji min û laşê bavê min dikirin... Bi qeftekê. Xetêke stortir a xwîn û piştire cûda dibin. Xwîna bav li ser xwîna ala min de reştir, piştî mirinê jî xwîna min ji min tê dizîn... Piştî awirdanê min çî dît? Weke tiştê ecêbe... Hemû hesp, hêstir, kêvroşk, seg, sivorî, kevok, kew, bilbil, meymûn, rovî û totî li pey karwanê wê şevê pêlê dide... Bi awayek bê şermî siwarî hev dibin, li ser hev difetisîn, ew jî li zerera kavihbûyî neman û ketine pey termê pîroz ê bavê xwe. Tewêl, kolane, koxik û qefes bi cî hiştin... Ajalên (heywan) lixafên xwe di wê erdê de dixiştandin û bêhna bi xwîn a xwediyê xwe nas dikirin*

*Dû nazik piştî xwînê, li vir xwar û li wir rast, dû rêz li karwanê heywanan.... Êdî ez nizanim, ez bi temamî ketibûm nav. Segên bavê min, lixavê ji wê xwînê hilnedidan ku ji min dirijîya bi nefret kirin. We çawa fêr kir? Hespê erebî bi qehran dihêriya. Bi hêrîna wê re diyar dibû ku dixwest tiştêkê bêje. Çî bû? Ez nizanim... Seg jî piştî bêhna xwînê kirin, rû û meha hilhatî dilorand... Di hewîn... Bavo timî wisa di got:*

*"Ev ne komek seg û çêlikên wan in. Belkî rihê min in... Dibe ku hûn bêxêr bin... Lê segên min... Hîç."*

*Di got û vedigot:*

*"Erê xizmeta segên min bike, ez ji te razî me"*

*Di got: "Rojên ku ez şivanê berxikan bûm, bav û bapîrên wan segan li cihê min şev û roj, mî û bizinên me ji gorg û çeçelan diparast. Ez timî xwediyê hest, jin, kur û keçên xwe bûm, ezê çawa dest ji wan berdim? Eger ew segên biwefa nebûna, divê heta ez li cîhanê mabûma, divê ez nêçîrvan û koçberbûma. Di nava gir û çiyayan de timî barek li ser milê min bû... Eger ew seyê çav vekirî û guh sivik nebûya, ev hesar wisa ava nedibû. Ma li taxên xwe û ligel segên xwe çil derbiçim?" (Şerzad Hesên, 54: 1998)*

Karakterê despêkê yê romanê ku tevahiya romanê ji mejiyê wî re tê vegêrandin, kesek tenê û di nava komek welatîyan de ye. Hemû dayîk, bira û xwişkên wî, xwîna wan di cîhanek xerîb û bê serwet de. Hemû kesên di wê hesarê de, keç û kurên di nava hesarê de nexweşiya cinsî hene.

Ji hemû mijarên bêbeş bûne ji (siks) nexweş in. Kesê romanê vedigêre li gelek cihan behsa vî derdî dike û dibêje: *"Ez çî li wan xwişkên xwe yên di mal de mane bikim, heta wê şeva ku bêhna zilaman nekirîn, ji heybetê diçûn bejna hespên bavê min, nêr û koviyên wî. Min ew pişik bi dizî radikir ku bavê min ji bo nêçîra mişkan kelih (hesare) jê teji kiribû, ew xwişkên min ên bextreş (Bê siûd bûn)... Heta wê şevê aliyê din ê surhên wê kelha bilind nedîtibûn... Bêzar bûne..Bêhna wan a sar ez pal (dehf) didam ku bikûjim... Min dizanî... Her şev heta nîva şevê bahol, boxçe û sindoqên xwe tevlihev dikin. Ji derzî, sincaq û mêxekbendê heta digihe jêra kiras, sityan û pêlavên wan ên Yemenî... Cilên bûkîniyê derdixin, ev nîşa yê din dike û ew dide yê din... Piştî bêhn dide ser wan, hêdî-hêdî wan tiştan digirin û dipûnijin. Zilamek li xêlek din û hesarek din rêya xwe şaş bike û li dergehê bilind ê kelha wan xwişkên min ên di mal de manebide... Kelha bavê min... Girtîgeha kur û keçên wî, tewêla hesp û hêstirên wî, qefesa bilbilên wî, koxika ferxikên seg, pişîle, kêvroşk û kevokên wî. Menzîleya (Stargeh) yekem û dawî jinên wî. (Şerzad Hesên, 14: 1998)*

Ew endamên malbatekê ne û di bin deshilata bavê xwe de dijîn. Bav bi wê deshilata xwe deshilatdariya wan dike. Kes newêre li hember raweste. Ew çawaniya jiyana kesên di bin destê xwe de diyar dike û nabe ti kes gazindan jî jê bike.

*“Dayikên xemgîn... Yên wiha di nava cihek girtî de... Vaye ew kurê we yê dilşikestî... Xwişkên nefesa wan sar (dilşikestî, bextreş û bêhn sar û bê mired... Vaye birayê we yê bextreş... Yê ketî ber nefreta Xweda û bavê we, vaye di nava vê çalê û nemirî, her ewe xema we û ketina hesar zûji bîrî... Tirsê lal kiriye, nexweşe û ji ber wî sûcê mezin heta nîva şevê ji dest û pê ketiye... Hinek caran jî heta sibehê serê xwe li ser dîwar şor dike û weke pilingekê temaşe dike; yek bi yek navê hemûyan têne... Eger bermayên xwe yên li ser sifê nedimê, wê bimire. Ew wê bi wê xemê bimire ku hûn bi kur û birayên xwe nizanin... De bila dayîka mîhrîban û xwişka baş bin... De bila maçeke we mûcîze be... De bila ji himbêz û soza we bê par nebe... (Şerzad Hesên, 12: 1998)*

Yê çîrokê vedibêje di berdewama çîrokê de gelek caran behsa çewisandin û kurkirina darayiya jin û zarokên xwe dike. Lê tiştê wan ji bavê wan bêzar kirî, ne tenê ew zilm û zordariye ye. Belkî tiştê wan wisa lê dike ku daxwaza wan mirina bavê wan be, bêparkirina wan a ji bo cotbûn û gankirinê ye.

*“Ez çî van xwişkên xwe yên di mal de mane ku heta wê şeva mêr bêhn nekirine, ji heybata diçûn gel hespên bavê min, nêrî, pişikên nêr didizîn û dianîn ku bav ji bo nêçîra mişkan amade kiribûn. Ev xwişkên min bextreş bûn.” (Şerzad Hesên, 14:1998)*

Perwerdekirina kesayetiyan di çîrokan de bi awayek cur be tê kirin û li ser bingehê felsefeyek taybet tê dariştin. Di çîroka klasîkî ya kesayetî de ne serbixwe ye û yê tevgera kesayetiyan destnîşan dike, ango civak e. Di çîroka romanekê de kesayetî xwediyê 'Min' e. Lê ew 'Min' ji soz û xwestekên dil tê çêkirin. Di awayê realîzmê de 'Rastî' bingehê kesayetiyan e. Di awayê nûjen de jî kesayetî, hebûnek terîkkewtû ye, li cîhanek perîşan de ye û di gûşenîgaya dengvedana cîhana derveyî mejî de ye. Berî wê yekê min nivîsand û min got ku naveroka hesar, çîrokek nûjen e. Kesayetiye serekî yê çîrokê, bi xwe çîrokê vedigêre. Ew jî keseke û di nava gelek mirovan de, bi awayek biyanî û di cîhanek aloz a bi tenê de dijî. Hemû çîrok ji aliyê wî ve tê gêrandin. Tû bêjî û nebêjî vegêrandina wî felsefe û dîtinê li pişt heye, wê yekê derdixe. Tevgerkirina kesayetiye çîrokê, li ser bingehê wê dîtinê û têgihîştinek taybet di mirov de dadirêje. Hemûyan jî sûda seks û cotbûnê hene. Tevgerkirin û gotinên wan hemû di bazinê bêparbûna ji gan û cotbûna



wan dixûliqêne. Hemû jî ji ber wê xwesteka ku bavê wan ji wan standî ve dinalênin. Kiryara herî giring a çîrokê yanî kuştina bav, bihane û niyeta xirab a rakirina astengiya li pêşiya wê niyet û xwestekê ye.

Di nerazîbûna yê çîrokê vedigêre ku hinek caran Frûyd û piştî jî şagirtê wî Karl Gustaw Yung behs dikin û lêkolîn kirine. Frûyd hemû nexweşiyên xwe, mirovji serkutkiriyên milî cinsî dizane û dibêje. "*hemû efsane behsa hêvî, tirs û zayendî (cinsî) yên di dema zarokatiyê de hatine serkutkirin dikin*".<sup>87</sup>

Di vê romanê de beşa herî giring kuştina bav e û ew jî vedigere ser nezeriya Frûyd (Nezeriye Fruyd). Di dibistana çîrokbêjiya Fruyd de zarokê kur, li pey gihiştina heskirina dayîkê digere. Di wê heskirinê de bavê xwe weke hevrik (reqîb) dibîne. Ji ber vê yekê ji bîr çûyîna bav û gihiştina dayîkê, hêviya zarokê ye. Di 'Romana Hesar û Segên Bavê Min' de mirov dibîne ku karakterê hewla romanê gelek caran jenîna bav û hemû bi navê dayîkê bang dike. Eger wisa be jiyana herî baş a bav e û divê ji bo wî weke dayîkê be. Ew aşîqê 'Rabî' ango dibe evîndarê dayîka xwe. Ji bo gihiştina dayîka xwe, bavê xwe dikûje. Ev nezerî di rewannasiya Fruyd de hatiye pênasekirin.

Yê vedibêje di dawiyê de bi tenê, bêtê kesek piştgiriya wî bike dikeve û jêre êşkere dibe nekû nebûye qehremanê di nava girseya li hesarê de, belkî niha bûye tawanbarek ku tif û nefreta bavê wî lê dibare. Xêrên bavê wî dest jê bernedidan, ew jî tirsê û ziravê wî bistiya.

Bi vî awayî tamam e... "*Êdî heta ez mabin, nahesêm. Ez ketime ber nefret û tifa dayîk, xwişk û bira... Serpereştyar, karakter û meyter ketin, min ne dizanî heta ez mabim ezê bi kuştina wî bikevim nava cihek girtî.. Û ezê hemû temenê ciwaniya xwe jî ligel segên bavê xwe derbas bikim. Bi şev jî dema xem min digire, stranên serdemê wisa li bîra min nemane û ligel segên bavê xwe direyîm. Weke wan pozê (difin) xwe nava piyana (legen) şorbeyê û êvara Şeley Zêwan ji kolanan ji min re têne. Heta ez carekê bi parçeyêke îskanekê li testê (geneke) werdidim, seg deh caran bi zimanê xwe dalêsin.*

---

<sup>87</sup> Mîran EL-wt, *Rman be riwayit Rman niwîsî*, wer. Alî Mihimmed hqşnas, mirkiz, Tehran, S.1368, R 23

*Gaz ji tiliyên min digirin û gilzê li ser herdu destên min dirêjîn... Min çi anî serê xwe?... Xwedê... Hewar e... Firsyar Resêk. (Şerzad Hesên, 16:1998)*

Ji vir û pê ve, acizbûn û nerazîbûn, tirsîya, ‘Ker û lal’ Gurî û xesandiye’ xwe avêt ser gora bavê xwe. Miriyek ku timî jê qutbûyî, niha qirika wî girtiye û hest gewdeyê sar ê mirî dike. Destê xwe davêje stoyê mirî yê bavê xwe û ligel wî dijî. Di hesarê de û di nava wê xelkê de yên ku xwe bi çanda merg ve girtine. Li wê hesarê de Dibe ku çend sedsal derbas kiribe’ û xwe daye ser goristanekê ku ji wê yekê jî zêdetir Temenê dibe ku hezar sal be.

*“Hewara xwe digihînim laşê bavê: Hewar ji ber te... Min ji segên xwe rizgar bike û bike kurê xwe... Carek din wisa bike ku ez hewayê paqij wergirim...” (Şerzad Hesên, 74: 1998)*

Tirs, dūdilî û tevlîheviya vê yekê jî bandor li ser hemû yê vedigêre, hesar û goristanê de girtiye. Dibe ku her di wê tevlîheviya ku ji despêke vedigêre de xwendekar rastî dijwarî û paradoksona, zimanek li ser lêvê, tejî naronî (ne eşkereyî) û xwaze dike. Çavkaniya vî zimanê manelog her ew çand, merg (mirin) û civaka sehr lê hatî kirine û efsane ye.

*“Lê Efsûs... Reyîna segan ji hawar û nalîna min bilindtîre, na... Ma kengê hewar li bîra min maye? Segên min asayî direyîn... Ez pozê xwe dixim nava piyana şorbeyê ku bêhna mîzê xizmetkar jê tê. Ew xizmetkara li cihê xizmeta her rojekê dikir û min lîreyek didayê..Ew lîraneyên di depoyê de hene, me dît û bêhna laşê rizî yê bavê min, guhê seg û mîzê xwe ez dîn dikirim. Ez bê çarebûm...” (Şerzad Hesên, 17: 1998)*

## **BAV WEKE KAREKTERÊ DI NAVA ROMANÊ DE**

Yek ji kesayetiyan din ên romanê ‘Bav’ e. Di romanê de ti gotin û nexşeyek nîne û mirov dikare bêje karekterek vala ye. Bav di romanê de weke miroveke zalim tê nasandin û kesayetiyeke ji aliyê karekter de kes dide nasandin. Çîrokbêjê romana bavê xwe bim û bi vî awayî min pênase dike: *“Ew zîlamê bi dirêjiya temenê min kirî sihbera xwe. Sihberek kal, sihberek ku tava zivistanek mij û duman wêne bike. Her wê roja ku*

*min girtî û li ser çar lepên xwe ketim. Her ji wê demê ve min tiliyên feqeyên xwe digirt û diketim li pey... Nabe ez bigirîm û bikim, off... Divê ez bi herdu piyên xwe lezê bikim, hinek caran jî min dovikê gopalê xwe dida destê xwe, yan jî serekî qumçiya sê zimanên wî. Çêlika se bi asayî direyiya.... Bi cih dimam û pêngavên min ên kurt nedigihîştin wî... Çi qehreke û pê dêşim, sihbera wî ya bilind: Min û sihbera min balol dida û rojê bi dehan car li ber piyên wî dirûniştim. Diviya bû ez bi ciwanî kilaşa (şikala) wî jêre bigirim. Nedibû têk biçim û şaşitiyan bikim. Herdu klaşênwî yên weke qayîke biçûk, cara yekemîn rast û piştîre çep; bi xwesteka xwe piyên xwe dixist di nav de. Ez aciz dikirim. Min hemû temenê xwe yê ciwanîyê bi rêzgirtin û danîna kevçikên ji bo mêvanên wî yên ne ji çî re (xirab) derbas kir. (Şerzad Hesen, 18-17: 1998)*

Kesê çîrokê vedibêje li her cihê behsa bavê xwe dike, vegêrandinek li ser behsa evîndarbûn û xweperestiye. Hemû tam ji bo bavên û hemû rê jî diçin pêşiya wî. Bavek ku gelejek li berdeste, dikare çî dema bixwaze yan aloş bizwêt û heramî rabû, di cih de jinek amade be, hevesa wî daşkîne. Ji bilî vemirîna hevesa xwe, beşek giring a temenê bavê xwe yê dîktator li bazinê şiddet û kavihbûnê de ye. Ji hemû ajal û mirovên derdora xwe weke amrazek ji bo tamwergirtina şiddeta sûd werdigire. Ji qemçîdanê heta bigihe girtin, kuştin û hemû tamedê dideyê.

Herwekî çawa hestê xwedîderketinê, bi awayê dîtina şiddetê de tamê dide kesên di nava hesarê de û bi vî awayî tamê dideyê. Wekî çawa dîtina şiddet di nava sînema û televizyonê de ji bo kesên li tevayî cîhanê tamê dide. Weke tû bêjî şiddet bi xwe curekî destdirêjiya zayendî (seksî) ye. Yan jî bi xwe weke wê yekê ye ku ewka xwe (heramek) xwe bixi di nava yeke din de. Ger wisa be wê dema ku bav gonê pişikê xwe derdixe, dibê qasî ganeke Rabî tamê jê wergire. Yan jî dema ku keçên wî fermana wî tînin xesandin, ji ber ku di hesarê de tenê şêrek heye û ew jî bi xwe ye. Yê din jî her ji kelûpelan bigre heta hemû cihgirtî û paşgoya wî ne. Ger wisa be hemû hêza jiyane, vedigere aliyê wî, ji wir çavkaniyê werdigire û di hundirê xwe de kom dike. Weke tû bêjî ligel dildariyê dike û ligel xwe şer dike. Rabî jî beşeke ji wê û ew enerjîyeke heta asta teqîn dayî jiyana wî, digihe sînorê teqînê û mirinê.

Weke tû bêjî hemû vegêrandin geşteke ji hesarê ber bi goristanê ve. Ji memikê dayîkê heta mirinê. Hem ji bo yê vedigêre û hem jî ji bo bavoyî. Weke tû bêjî dû cemserên ji hev cûda. Lê yek li gimika deshilat û xweşiyê de, yê din jî di kûrahiya bêpariyê de û di dema mirinê de digihin hev.

Bav di hest de dadwerê (hakim) bê pirs û bersiv e. Mafê kesê nîne li ser baxive. Her çendî bi xwe dibêje, *“Ev hest ne li gor xwesteka kê be, bila biçe...”* (Şerzad Hesên: 21) Lê deriyê kelhê bi yekcarî hat girtin û ti kes nizane çi hatiye serê wê. Bav xwe weke xwediyê mal û can dizane. Ligel bav wisa ye ku li derveyî hesar û dûrî çavên bav, ti kes nikare bijî. Her li cihê wî jî divê hemû kur û keç, xizmeta hesarê bikin. Heta fikir û xeyalên xirab jî di nava hest de xwediyê sûcên xirab in. Cezayê her xeyalek xirab deh celde ye û her xewneke xiyanetê jî deh qamçiyê. *“Eger hikmeta min nebûya wê ev hest wêran bibûya... Ez ewqas pêve westiyam, mafê min ê wê yekê heye yê zimanê xwe dirêj bike; zimanê wî ji kokê qût bikim... Xeyalên xwe xirab nekin... Ji derveyî vî hestê min û dûrî çavên min ti kes jiyan nake. Ger ew bi heq keç û kurên min in, bila xizmeta hesarê bikin. Bila her yek karê xwe bi ciwanî bike. Ew kurê serê xwe jî li hemberî rake, sedî sed divê serê wî bê jê kirin û were xesandin. Yên xwe ji vî hestî dizîne û reviyane bajaran, qaşo îro yan sibe wê bi çek û pereyên zêde ve bîn û wisa bikin min çok bikin; ew jî her xewne. Ez ne ew zilamim ji kurên xwe bitirsim... Hemû kesên ku xwestin serê min şor bikin, reviyân... Ez kirim zadê teyr û tewalan... Destê min ewqas dirêje, digihe binê cîhanê... Berî keç an jî kurekê min xeyala tiştên xirab bikin, ez xewn bi wan ve dibînim... Hûn di dilê xwe de baxivin... Ez dibihîsim... Jiyana baş bin û ji kurên xwe re bêjin: “Kes ne yê wê yekê ne cihê min bigirin. Ezê ji îro û pê de li dîwanxaneyan rûnim, li ser hemû xeyal û xewnek ku xirab be, ezê we ceza bikim. Cezayê her xeyalek xirab deh celde ye û her xewnek xiyanetkarî jî, deh qamçî ye. Soz be ez dilê xwe bi keçên xwe neşewitînim û li tewêlan ligel makerên xwe girê bidim... Xwedê jin li pêş çavê min benîşt bicûn an jî avê vexwin, yan jî ger min dît ku keçên min li pêş çavê min bi awayek bê şermî kezî û biskên xwe berdidin û pora xwe datînin... Soz bi hesar, hemû pencereyan bişkênim, rêz di vê hesarê de nemaye. Tê guhê min, keç û kurên nû baliq bûyî di bin lêvên xwe de stranan*

*dibêjin... Şerm û eyb nemaye... Di dem û ne deman de guhê min pêkenîna wan e..."*  
(Şerzad Hesen, 21-22:1998)

Wisa diyar dibe ku di civaka Rojhilata Navîn de yan jî her nebe li welat û çanda me de, ji ber ku me yasayek weke ya Rojavayîyan nîne ku me li ser lihev kiribe, hebe. Bi berdewamî awayê sîstem û deshilatek hatiye hîlbijartin, êdî me pejirand û me wisa bawer kir ku timî şiddet gotina yekemîn dike û Kurd bi tenê 'Bi pênekêji cennetê hatiye' û deshilata asayîş û aramiyê çêdike.

*"Eger ew kafîr, hesp, hêstir, seg û sivorî ji me zêdetir hez dikirin, pêwîst bû... Her pêwîst bû min kuştiban, ger min kuştiban jî her ezê di nav de çûbam."* (Şerzad Hesen, 41:1998)

### **XWIŞKÊN BIWÊJÊ KURÊ MEZIN**

*Di vê romanê de Rawîbehsa xwişkên xwe dike. Xwişkên gelek ên di hesarê de, bi dilekî nexweş û dûrî xweşiyê jiyana xwe didomînin.*

*Em hemû ji sibehê heta şevê, em nedirazan. Xwişkeke min ji sibehê heta êvarê cil pîne dikir. Ya din çêl (manga) didûşa. Ya din bizin û yek din jî mî (mih) didoşa. Yekê jî keftî (refte) diçînî û ya din jî komik didûrî. Yekê meşk dihejand û yekê teşî dirêst. Av ji bîrê derdixistin û dewlikê xwe serûbin dikir û dixistin nava sitlan.. Gêzik li odeyê dida û yekê jî pîvaz paqij dikir. Yeke din jî keshahî dibijart û yekê jî ron (duhn) sor dikir. Herwiha yekê dan dida kevokan û ya din jî giya ji bo kêvroşkan kom dikir. Herwiha yekê jî qefesa bilbil û kuxikê segan ji pîsatî û go paqij dikir. Sibehê zû ev yek dikirin... Hemû xizmetkar, serpereştyar û karkeran li pêşiyê dibûn rêz. Xizmetkar, kesê xesandî yan jî nermûk (nêremû) bûn. Me ji aso temaşe dikir û me çavê xwe nedigirt. Berî tîrêjên rojê derbikeve, dest digihand qamçî û goçanekey. Bi destê rastê qamçî û bi destê çepê jî serê gopalê digirt. Xwe davêt li ser. Hemû xizmetkar, serpereştyar û karakter xwe li pêşiyê dikirin rêz. Ew xizmetkar, xesû yan jî nêremûk (nermûk, nemêr) bûn. Me ji asoyê temaşeyî dikirin û me çavê xwe nedigirt. Berî tav bide destê wî, digihand qamçî û gopalê wî, bi destê rastê qamçî û bi destê çepê jî jora gopalê xwe digirt. Xwe li ser digirt. Ew*

*gopal berî xwar bibe li hemû kefel û navşeqê me hemûyan ketibû. Kunek bi berdewamî em tengezar dikirîn, hewarek ku her ji agirê komê biçe û em hemû li erdê didan. Dayîkên min... Ew dayîkên ku tenê razabûn. (Şerzad Hesên, 23: 1998)*

*Xwişkêk ku heta niha bêhna mêran nekirine, bi tevayî hesp, nêrî û pişikên hesar diçin. Xwişkên ku Bwêjê Roman bi bextreş bi nav dike. "Ez çî li wan xwişkên xwe yên di mal de mane bikim ku heta wê şevê bêhna mêran nekirine. Ji heybetê diçûn nik hespên bavê min. Pişikên nêr didiziyên, bi dizî ew pişikên nêr didiziyên û hesar tejî pişikên nêr kiribû. Bextreşiya wan xwişkên min... Heta wê şevê, aliyê din sûrhên bilind ên hesar nedîtibûn. Wersî û ... Nefesa wan a sar ez pal didam ku bikûjim. Min dizanî..."*

*Hespên bûkîniyên derdikevin û ew nîşa yê din dike... Piştî bêhn kirinê, davêjin ser wan tiştan û ji ber xwe ve dike qêr. Zilamek ji çadirek din û ji hesarekî din rêya xwe şaş bike, li dergehê bilind ê wan xwişkên min ên di mal de mane bide... (Şerzad Hesên, 14: 1998)*

*Biwêja roman, gelek bi nexweşî behsa çîrokên xwişkên xwe dike. Xwişkên ku temenê wan ji hev ketî û ji bo veşartina pîrbûna xwe, hewara xwe digihînin birayên xwe. "Wey ji qehrê xwişkên xwe, nedihîşt ti kes... Ti nêrek wan bibîne. Min bi qeçaxî hina (xina) ji bo wan xwişkên xwe dikirî û heta temenê wan derbas bû. Dixwestin pora maş û birincê xwe pê veşêrin. Her min bi dizî ve sorav û spiyav, kilçivî, mîçing (Mûkêş) û şe yek bi yek ji wan re dibir. Neynika (awêne, eyne) telx û zengarî, ji bo rûyê xwe yê qûrmiçî û neciwan nebînin. Hemû qurmiçînên li pişt çavê wan û xalên reş ên xwişkên min ên di mal de mayî." (Şerzad Hesên, 18:1998)*

*Şerzad Hesên di romanê de gelek caran behsa pîrsgirêkên civakî dike. Dema behsa xwişkên xwe dike, derdekî giring ê jiyana Kurdan dîne rojevê û ji nû ve behs dike. Sinetkirina keçan di dîroka Kurdewarî de, weke pîrsgirêkek nexweş a niha bi nav dike. Biwêja romanê bi ax û hesreteke zêde ya sinetkirina xwişkên xwe dike û dibêje: "Wey li vê xwişka pîr bextreş (bêsiûd), nefes sar û xemgîn a min heyî, ew xwişkên ji dayîka min û yên zir dayîkê. Wey li hesret, şerm û şikestina wê êvara ku li derdora her pîrekê dayîkek û li dora herdu piyên keça xwe belav kirî. Ji hemûyê nexweştir jî dest û tiliyên dilerize,*

*bi lorandinek kûl ew sinet kirin. Hesareya me li ser deng û hewara xwişkên me de wêran dibû. Tenê min karî wê yekê bikim ku du ji wan di nava koxikê mirîşkan de veşêrim. Yek di nava tewêle û duyên din jî li ser serban û ya ji hemûyan biçûktir jî min xist di nava sindoqê de. Min dû-sê caran maç kir jî bo didanên xwe tund li ser hev de biqerisêne, jî bo kesek neyê odayê û dengê didanên wî biçeyê... Di nava wê dara tû ya min xwe bi bêdengî di nav çeq û pelên wê de veşartî...*

*Serê min gêj bibû û ditirsam ku li ser dara tûyê bikevim xwar... Ne tenê ez... Birayên min ên bê xîret jî di nava tewalan û li pişt pencereyan digiriyan. Heta dor digihişt yek ji wan. Yê li kêlekê ji hişê xwe diçû.... (Şerzad Hesen, 18:1998)*

Di vî warî de Şerzad Hesen bi hesret, derd û kûlan ve behs dike û yê romanê vedibêje jî ji bo wî bi êş e. Sinetkirina keçan, derdekî civakiye, dîtîna û ramana komek kesên paşketî ye. Komek ku ji bo encama vî karî, şerîetê dikin bihane: "*Dayîkê nedibû tû wê keçika biçûk sinet bikî.*"

*Xwîn rijîya ser herdu çavan û avêt:*

*"Kurê min... Tû ji şerîetê fêm dikî, ne ji karê jinan... Piştî dû rojên din wê ava destê xwişkên te heram bibe... Wê nanê destê wan... Êdî bêhna xwe vedidin.... Eger baliq jî bibin, wê kêmtir xewnê bi tiştên heram ve bibînin...!" (Şerzad Hesen,18:1998)*

Her çendî ku biwêja romanê li gelek cihan bi temamî behsa xwişkan dike, lê di romanê de bi tenê behsa çend xwişkên xwe yên weke; Zelîxa û Zêba dike... Herwiha piştî yek bi yek bi cûda behsa van xwişkên xwe dike.

## ZÛHRÎ

Di romana 'Hesar û Segên Bavê Min' de, Şêrzad Hesen di gelek rûpelan de behsa xwişk, bê pariya wan a ji jiyana û mêran dike. Armanca wî bibîrxistina çend caran a van derdane ye. "Hemû xwişkên min ên di mal de mane (keçek ku heta temenek dirêj zewac nekirî) ne... Ew xwişkên ku kezî û biskên xwe yê dirêj bi şîşên hêsî û zengî yê pencereyê ve girêdayî, nekû di nîva şevê de bêyî agehdariya xwe û di xew de bikevin nava mêrên baz stûr û simbêl boq de. Dest bavêjin hespên bavê min û wisa têbigihin ku destê xwe li milê Yûsîfekê alandine. Di nîvê şevan de ji ber hewar û nalîna wan, xew nediket çavê min. Navê wan mêran dianîn ku yê diketin nava xewnên wan. Di nîva şevan de diketin pey ew nexweşiyane, tewêl bi dergê û pencereyan dikêşandin. Sibehan dema ji xew radibûn, nedizanîn ew xwîna meyyayî ya di di çengê wan de dihat xwar çîye."

Di romanê de yek ji xwişkên biwêjê yê ku êşên zayendî (cinsî) dibîne, Zûhra ye. Zûhra weke pîraniya xwişkên xwe, nebûna mêrek ji bo wê bûye sedemê karesatek dilgiran. Şevê ku Zûhra weke xwişkên xwe xewnê bi mêrekê ve dibîne, bi bihîstina dengê piyên hespê erêb ê bavê xwe re; serê xwe ji tewêl derdixê û di dawiyê de bi destê bavê xwe tê kuştin. "Hemû jî ditirsan ku weke Zûhra were serê wan... Şeva ku hîley (dengê hespan) hespê erêb ê ne rêkûpêk û ne di cihê xwe hat ber gûhê wê, hîleyek di xewa şîrîn de derket... Bi awayek acizbûyî û dînanê dergê tewêlê vekiribû... Bavê Zûhra ew dîtibû ku destê xwe li milê hesp alandibû. Hespê bi nalet jî lixavê xwe xistibû di nava herdu memikên wê de. Agehdariya min ji bavê min nîne. Li hesar, li cîhanê Zûhra dilerizî û xenî dibû. Her wê şevê bêdengiyê kuşt û her di hewşa hesarê de jî hat veşartin. Ji bo keçên din jî bizanin û êdî xewnê bi tiştên heram ve nebînin.

Şev-heft ji bira û xwişkên wê heta sibehê li ser cenazeyê Zûhra digiriyan û heta karîn giriyan. Pehniya xwe li erdê ve dibirin û heta xwîn jê dihat. Dema rojê li hewşê da, ji xema Zûhra çî kirin. Her sibehê jî dayîk û xwişkên deh torbeyên (ferde, telîs) pîvazan hûr dikirin û ji bo rondikan veşêrin. Bavê ku xwe weke Xweda nîşan dida, fermana xwe derxist û eger nîze nîza kê ji we bê guhê min, ezê we bi pirça (por) we ve



*hilawêsim. Dema pîvaz hûr dikirin, rondik ji çavê wan dibariya û ji ber bavê xwe gelek digiriyan. (Şerzad Hesên, 23-24: 1998)*

## **ZÎBA**

Xwişkek din a Bwêjî ya ketî ber xezeba bavê xwe, Zîba ye. Her wekî Bwêja behsa Zîba dike, şeveke xweş û dilrefîn a havînê sing û himbêza xwe jêre vedike û xwe bi tazî ji serban dixê nava tîrêjên heyvê yên di nava şevê de. Zîba bêyî agehdariya wê jê hebe, bêyî fikra hesar û heşîmetiya di nava hesar hebe, li ser serban dest bi govendê (dîlan) dike. Deng û qêra wê digihe gûhê bavê wê û herî dawî ji aliyê bavê xwe ve di jêzemînê (budrum) de tê girtin. *“Bi bihaneya ku qaşo (guya) wê ji Germiyan gelek mêvan ji bavê min re werin û di rê de ne. Ditirsan ku weke xwişka min Zîba di jêzemînê de û heta hetayê dergêh li ser girtî bimîne. Zîbaya nazdar, timê lêv bi ken, çav xûmarî û nû memikên wê çêbûyîn... Şevê ku hê jî meh 14 rojî bû û bi dizî çû ser serban. Şevê xweş û dilgerîn a havînê; sing û himbêza jêre vekirî bû. Sing û hembêza wê ya biçûk. Herdu memikên wê qasî du hilûkan (hilo) bûn, li ber tîrêjên heyva di şevê de nû derketî dirijiyên. .... Bêyî agehdariya wê ji hesar, ji cîhan û xezeba bavê min hebe; bi panî û dirêjîya wî serbanî xwe badida û laşê xwe yê xwihdayî li wê toza hişk a serban werdida. Heta sibehê bi singê xwe ve mijûl bû. Rabûye ser xwe û li derdora xwe govend kiriye. Ji xweşiyê kiriye qêr û hewar. Kiriye qêr û weke dengê avek ku ji şebik birije... Ji sergermiya govendê bi herdu piyên xwe li ser serban govend kiriye, ne carek û ne dû caran... Her ew pêkûtîn û qêrîna sermest (sergerm) wisa li bavê min kir ku lezûbez sê bi sê pilleyên kaldirmeyê bibire, bike selikê û bi wî gunehê ku wî bigire, jîyan û keçên hesar jî di hewşê de bi tirs û şermiya xwe de bi çend peykerên ji ber diçûn. Hemû di meha fêlbaz (hîlebaz) û pêkenînê de temaşeyî me dikir. Ew meha her tenê Xweda dizane ku ji kengê ve Zîbaya evdal û sewda serkiriye, me hemû bi çavê xwe dît. Bavo, her bi pora ji bo semaya berî tîrêjên heyvê pexş kiribû. Li pey xwe û dilber de radikêşa. Bi qasî pileyên qaldirmeyê, laşê nîv rût (tazî) yê Zîba hildikişiya... Heta nîva hewşê û bi qasî gewdeyê xwe rêyek paqij kiriye. Laşê bi xwihdan û şelalî çî bêhnek li wê hewşê gêrand. Bêhnek ku em kirin heyranê xwe. Weke xezala serî û milê wî şikestî, ji destê bavê min kerixî û şepirze bû... Bir... Bir... Heta ku bermayên wê di vê jêzemîna tarî ya hesarê de*

veşêre. Gûhê me li dengê zirîna zincîr bû, li dest û piyên Zîba dişidan... Em hemû dan sondê ku heta Zîba dimire tîrêjên rojê bibîne û zad jêre bavêje zêrzemînê. Sond xwar ku heta Zîba dimire, nabe bi ti awayî tîrêjên rojê bibîne. (Şerzad Hesên, 24-25: 1998)

*Piştî zindî veşartina Zûhra û girtina Zîba ya di jêrzemînê de, xwişkên min sivikî temaşeyî min dikirin. Di guhê hev de daxivîn, li ser bêdengî û bêdemariya min daxivîn. Lêvên xwe li hev diqurtandin. Di çûna li ser gov (gova pez), bîr û di nava tewêlan de, xwe ji min diparastin û weke ez mirovek xirab û pîs bim. Ti xemsariya min tune bû... Ji destê qestan cil û cilûbergên min li nava wir diketin û nedîşûştin. Min zanî... Êdî bi dawî bû û tamam... Ez ji biratiya wan ketibûm. Dayîkên min taştêya sar dixist pêşiya wan û çaya tehl (tal) ji min re dadigirtin. Di bin re awir didan min. Dema şev bêdeng dibû û dema ez şevê ji hesp û hêstirên di nava tewêl de piştrast dibûm, ez li keleka pencereya timî girtî ya yek bi yek ên xwişkên xwe radiwestam. Bê hest û bêyî xwestek... Min ji qehran lêvên xwe gez dikir, çend zehmete bi ser şorî û di nava tenêtiyê de diketin himbêza hev... Xwedayoo... Ma ez dikarim çi ji wan re bikim? Wey li wan xwişkên min ên şerm di nivê de kirîn dû parçe, şermekî heta mirinê şikandibû; dûrî tavê... Bêhna paqij... Xemek veşartî ya weke zehferanê rû zer kiribû. Ji xema zêde ya xwînek germ a di demarên her yekê de çavzivirî berê xwe didan hev. Xwedê heware... Vêca di tarîtiyê de çi rûnade..? Hilhîla xeniqî ya teji şerm û bitirs a di bin lêvên min de dibihîst. Lerizînek tevlîhev demarên min digirt, min bi neynûkan çermê herdu ranên xwe dikirand û heta min xwîn jê dianî. Tif li wê xîreta birayê mezin... Nexriyê (Zarokê yekem ê male) ser şor... Kekê me yê xesiyayî...! Her şevê yek ji wan cotane dibû nêr û ya din dibû mê. Dema dibû roj, me şerm dikir em temaşeyî hev bikin... Qet nedihat texmîn kirin ku ew keç bikarin xewnê bi tiştên heram ve bibînin! (Şerzad Hesên, 25-26: 1998)*

### **BIRAYÊN BIWÊJÊ, KURÊ MEZIN**

Bwêjên romanê her weke xwişkên ku me behsa wan kir, çend bira hene û di hesar de bi bêhna sar û dûrî xelkê dijîn. Birayên wî ti lîstokekê nizanin. Ti carî kenî li ser lêvên wan nehatiye dîtin, bêyî ku carekê li ser avdestê. Birayên ku şev û roj xizmeta

hesar, hesp, çêl, seg û bavê xwe dikirin. Ji tirsê bavê xwe gelek caran xwe ter (şil) dikirin.

*"Di nava wan pawan û mêrgan de, mî, bizin û çêlên me diçêrand û şorey bo kirdbûn. Miyek, bizinek, berxek û karikêk wînda bibûya, wê em hilawistiban... Hê em zarok bûyîn... Me dûa dikir û me di got, xwedayoo: Çima tû bi hespeke me yê dîn bi coteke kelleyê serê wan nateqênî? Carek ji caran nagihê ku milê wê naşikê: Kirîzîne girt û ez maç kirim ku wî dêwî bikûjim. Hemû li benda dest û mistên min bûn: Birayê mezin û nexriyê malê...*

*Birayên min ji min re di gotin: "Keko... Tû berê nexriyî... Erê tû wê heta kengê li hemberî zilma bavê min bêdeng bimênî...?!"*

*Eger ji dizî ve... Eger na diçû wî aliyên din ê şûraya bilind a hesarê, ti lîstikê nedizanînin û eger ne li avdestê bûna, em pê nedikeniyan. Ji sibehê heta êvarê tewêl paqij dikir. Ew birayên ku bavo dişand, mîz bi xwe ve dikirin... Tika ji min kirin, xwe diavêtin ber bextê min û bi dengê nizim di gotin... Ji min re wiha gotin:*

*"Netirse... Em hemû li piştê te ne... Şerte me bixesênî... Ma heta kengê em bi şevan biçin gel makerê, biçin alifê maker û hêstiran?!" (Şerzad Hesên, 27: 1998)*

## **GUFTÛGOYÊN KAREKTERAN**

*"Dê êdî bes jinan bêne.. Wisa li te hatiye ku tû êdî navê keç û kurên xwe nizanî."*

*"Çima ez neyînim..? Temen... Heye.. Ez hê jî li ser hêz û qûweta xwe me... Hesar mezin e û dikarim sedên din jî xwedî bikim... Nefêmiye, hûn dizanin zûryet çêkirin çend xêre... Hûn dizanin Silêman Pêximber... Îbrahîm Pêximber çend jinên wan hebûn...?"*

*"Ew pêximberin û tû çiyî?"*

*"Dev dirêjî rûreşîye... Her mêr di hesara xwe de pêximber e... Bi min wisa başe ku ev hesar, dereng an zû bibe bajarek pir mezin."*

"Jêbigire kur û keçên te jî di bajarkirina hesar de cih bigirin... Wisa li wan neke ku berê xwe bidin teht û niwalan?" (Şerzad Hesên, 21: 1998)

"Bêdeng be... Ti kes ti deng ji xwe dernaxe... Ezim daxivim... Dema ez pirsyarê jî dikim, bila ti kes bersiva min nede... Ji ber ku ez bersivan jî dizanin... Bila ti kes pirsan ji min nepirse... Bi bêdengî were vir... Tû bûyî te ji Hebê pirsî bû, ka ji min bipirse gelo her sal û mehekê diçim kûderê û çima winda dibim... Divê wan têr bikim... Hûn nabêjin ev xelke bi çi dijîn... Tenê hûn dikarin tiştêkê bizanin... Sibehan zû ji xew rabin û dema dinya tarî bû, dergehê hesarê bigirin... Ez li vir bim an na...? Qet min nexapînin... Ez biçim kûderê, rihê min weke ewir li ser hesar weke sîberê ye. Lewra min xwe ji bajar û gundên din dûrxistiye, ji bo hemû tiştên we ew bin yên ez dixwazim... Ne li benda ti tiştêkê bin... Mal û milk vaye ligel mine, bila ti kes jî nezane ez pîr bûme û ezê di demek kurt de bimirim. Min xewn dîtiye û ezê qasî Nûh Pêximber bijîm..." (Şerzad Hesên, 22: 1998)

Her divê ez bikûjim... Lê min ji bilî bavê xwe ti kesek din nedîtibû, hem gopal û hem jî qamçî ligel hebe... Timî wisa di got:

"Nabe mêr bi destê vala be."

Ti carî tizbîh hilnedigirt... Timî ji me re di got:

"Mêrê rast ewe yê sê tiştan hildigire: Gopal, qamçî û xencer."

Timî di got:

"Gelek zehmete zilam bêyî qamçî bê nava mal û zarokên xwe:

Kî li vî hesarî hebû, ji keç, kur, jin, wezîr, karakter û xizmetkarên xesûyê zêdetir... Ger qamçî liberneketibe... Timî di got:

"Her zarokê min yê qamçîma lê neketibe, ne qelew dibe û ne jî temenê wî dirêj dibe... Mane ne bi belaş bûye 'Simayîl.' Gerdana xwe xistiye ber kêra 'Brahîm' pêximberê bavê xwe... Ha...?" (Şerzad Hesên, 26-27: 1998)

*"Eger ez nebûma ji mêj de bû wê ev hesar li ser serê we de hatiba. Dûa bikin ku hûn li vê dinyayê mane... Ka hinekê mezintir bibin, hûnê wê demê fêhm bikin ku çend ji min hez bikin. Di nava hemû xeber û tifên min de nîmet heye. Heta ez nemirim hûn qedrê min nizanin. Piştî jî ez bavê we me... Tenê ez dizanim çi ji we re xêr û çi jî şer e. Çima lehî, volqan, ba û bahozê dişîne... Çima li vir sermaye û li wir germa..? Zarok jî her wisa... Nikarin fermana bavê xwe bişkênin. Kur û keçên min wisa li ber dilê min şirîn dibin ku guh bidin fermanên min û bênin cih. Pirtûkên pîroz jî her wisa behs dikin... Hûn dizanin çima zarokên min ên biçûk zêdetir ji min hez dikin. Ez dibînim: Heta nan xwarin, cilûberg xistina ber xwe û koxînê jî her texlîdê min dikin... Ez wisa me û gelek ji sîbera xwe hez dikim..."(Şerzad Hesên, 27: 1998)*

*"Lezê nekin...Îro jî nebe, ezê her sibehê we bikûjim." Her şev min dergeh li pişt xwe digirt û min xwe li pêş neynikê (awêne, ayna) fêrî xencer lêdanê dikir. Min yek li bavê xwe dida û dida ber xencerê. Xencerek, dû, sê û deh... Heta ez digihiştim ser avê û xwihdanê, ti deshilata wê nedima... Textê tewêl bi bandor e... Yan jî ser dilê wî..? (şêzad hesên 29: 1998)*

*Her hemû hatin, demû her ez bi xwe bi tenê xistim di nav de. Vaye di nava gorekî sar û sir, ligel laşê dare yê rizî û yê kirm ketiyê; ligel bavek nemirî... Ne zindî... Ez bi tenê, xemgîn û westiyayî.. Sê peleyên xwîna sor ên ku mijûlin ez têkelî kifnê wî bibim. Vaye li ser kifnê wî ye û cihê sê serên xencerê li ser laşê wî diyar e. Xencera sêyemîn tevahiya qulinca wî dirandibû û tam li cihê ku diçe ser dilê wî... (şêzad hesên, 30: 1998)*

## ZÎWAN

Yek ji karakterên din ên romanê, Jîwan e. Jîwan keseke goran dikule, kesek pîr û şile, li goristanek nêzî hesar dijî. Zîwan karekterek nexweşê cinsiye û bi baweriya Biwêjê romanê, miriyan jî efû nake. “Zêwanê goristanê jî dibêje û bi gopalê di destê xwe de hevsengiya xwe radigirt. Xwe badîda, dida vî alî û aliyê din; bi sistî di hat û milê xwe li milê min da... Wekî ku em li şahiyê bin ne li şînê. Weke dêweke sê pê hat pêşiya min” (Hesin, 14: 1998) bwêj rûyekî nexweş û dilreq nîşa Zîwan dike. Zîwan pir zû sê xwişkên bwêja dibe. Zîwan sembola karekterek cinsiye, zemannasî û wek ‘Nihad’ a di dîtina Rroyd de ye. Bi dîtina Froyd de, mejiyê mirov tê bêpar kirin. “Nihad, bi xwe û Fraxud”.

Bi dîtina Froyd, mejiyê mirov tê bêpar kirin. Hemû nexweşî û dîtînen wan cûda ne, weke nexweşiyên cinsî, şer û nakokî di nav de hene û vedigerin ser ‘Nihad’.

"Nihad li ser lezet û xweşiya mirov kar dike. Ji bo bidestxistina lezet û xweşiyê, berê xwe dide xeyal û fikirînê."<sup>88</sup> bwêja Roman dema bavê wî dixwaze wî li goristanê veşêre, Zîwan dibîne. Tirs di gewdeyê Biwêjê romanê de heye. Zîwan wek mirovek dilreq dibîne û bi neçarî ji bo bêdengkirna Zîwan, xwişkên xwe pêşkêşî Zîwan dike. "Weke jinek nazdar ji te pirs bikim:

"Bavê we ye... Ha?"

Xemgîn û lal, bi wî baskê xwe yê xwar û xar xwarî, nedizanî raweste. Tiliya şahidiyê radikêşa, di bin lêvên xwe de gor dijimart û li ser digeriya... Tirsiyam... Ji çavên wî... Pijîngêk sor û ez dişewitandim... Ji gopalê di destê wî de, ji pirs û gumanên wî... Ji wê birsîtf, fehlbazeke û bi hêsanî temaşeyî sing, memik û kirasên xwişkên min... Titara xwe dekroşt, pişikê asa simêlî dilastewe. Min ji tirsan Sara û Zûleyxa veşart. Hespê ereb ê bavê min ê rext û zînê wê ji Ecem bû, ji min re dianî... Ew hespê bavê min, mehîn û cehşikên kêrhatî dianî, berdidan tewêlan. Dema hesp diperî, bavo keyfxweş dibû. Dikir hewar... Bira û xwişkên min jî li pişt perwerde, pencere, kuna derî û kelişteyên wê dihat. Pora hev digirtin, qûrîncek li lamên hev didan. Hevûdin dideqandin.

---

<sup>88</sup>Pitir Wêstland, Enwae Destan Nîwîsî, R 44

*Hev gez dikirin, xwîn ji wan dihat û agehdariya wan ji wê yekê nebû. Heryek ji wan bi wê yekê ve mijûl bûn çî li ya din bike, bi xwe guhdariya dengê hesp û nala mayîne yên tevlîhev dibû... Wek dîmenê ku agir berdide hinavan. Ew xwişkên min jî yên perkem darbûn, her guh li wê hîleye dibûn... Dizanîn ewhîley tejî tirs û hespê fehl ê bavo ye. Bi yekcarî dikirin hewar....*

*Ji min re got:*

*"Kekê Zêwan heta zû bixesênê... Ev goristan pîroze, bila ava wî mêrî nerije ser kêl û goran... Ez rica ji te dikim bixesêne." (şêrzad hesen, 56: 1998)*

"Zîwan" kesayetiyeke din e di nava romanê de ye. Rûyekî ne ciwan e Zîwan hebû û karê wî veşartina miriyan bû. Kesek pir ji jinan hez dikir û tenê li pey lezet û xweşiya xwe bû.

Biwêj dema di vê romanê de behsa kesayetiya Zîwan dike, dibêje; dema bavê xwe dike neçar dibe ku ji bo veşartina bavê xwe bangî Zîwan bike. Ji bo kuştinê ji bîra Zîwan bibe, neçar dibe ku hespê xwe yê erebî û xwişkeke xwe bide Zîwan.

*"Erê kî wê guhdarî Zîwanek fehlbaz bigire. Zîwanek ku her wê şevê me hemûyan bi hev re bavê min veşart. Min hespê ereb dayê, jib o ji ber tawanê kuştina bavê min; ti gotinekê neke û bêdeng bibe. Pêwîst nedibû bawerî daban mêrekê... Wisa li Zêwan bike ku xem bi mirinê ve xwaribû." ( şêrzad hesen, 13: 1998)*

Zêwan di vê romanê de weke kesayetiyeke fehlbaz hatiye nas kirin, heta dawîya romanê reftar û kiryarên wî nehatine guhertin û wek xwe mane.

*"Guhê min lêye Zêwane naletlê dibare hewara xwe digihîne...Bê gûman niha bi wê fêla heramzade dest li sing û memikên wan dide, qurîncek li ranê wan dida û çî tişteke ji miriyan tê çaverêkirin?" (şêrzad hesen,12: 1998)*

Zîwan di derfetek ku jêre çêbûyî, xwe nêzî Rawî dike û daxwazê jê dike ku xwişkên xwe efû bike.

*"Ji wan xwişkên te yên ciwan, tû dikarî yekê bidî min..."*

*Dû ji wan cenazeyê bavê min kirin bihane... Em ji zimanê Zêwan ghiştin ku berî xwe bavên ser term de û kirasê wê ji serî heta dawiyê diriya. Yên din jî gelek bêşermî li enîşka xwe didan, xwe davêtin pêşiya wî û çavê xwe li Zêwan zîq dikirin. Xwe bi nazdarî li derdora termê wî digirtin û taw natawê beqireşke û zirîkeyek xamaosî goristan deşkan....*

*Ez çî li wan xwişkên xwe bikim ên ku heta niha bêhna mêran nekirine. Ji heybetê diçûn alifê hespên bavê min. Nêrî û pezên kovî, min ew pişik bi dizî dibirin ku bavê biwêjê hesar tejî mişk kiribû. Ew xwişkên min bextreş bûn... Heta wê şevê aliyê din ê şûrên bilind ên hesar nedîtibûn... Bêzar bû û... Nefesa wan a sar ez pal didam ku bikujim... Min dizanî... Şevane bawil, baxçe û sindoqên buraq vedikirin. Ji derzî, sincaq û mêxebend heta digihe jêra kiras, sityan û babucî yemenî (Pêlava jinan a binê wê bilind)... Tiştên xwe yê bûkaniyê derdixin û nîşa hev didin. Û... Bêhn li derdorê belav bibû, mêrek ji çadirek û hesarek din rêya xwe şaş bike, li dergehê bilind ê wan xwişkên min yê di mal de mane bide.... Hesara bav... Girtîgeha kur û keçên wî, tewêla hesp û hêstirên wî... Qefesa bilbilên wî, koxik, koxikên seg, pişik, kêvroşk û kevokan. Rawestgeha dawî ya jinên wî. (şêrzad hesen, 14: 1998)*

## **KESAYETÎ RABÎ**

Mînaka dawî ya ji wê tevgerkirina li ser bingehê hejîna aloşî kesayetiyên, emê behsa Rabî bikin. Ew jina herî ciwan a bavê xwe vedigêre, lê ji baxçevanê çavşîn hez dike. Heskirin û evîndariyek ku di rewşa hesarê de jêre nabêje û rêk nakevin ku tame ji hev wergirin. Rabî dizane ku yê vedigêre jê hez dike û pal dide ku bavê xwe bikuje. Tevger û kiriyara çîrokê, ango kuştina bav çavkaniya xwe ji wê kiryarê wergirtiye. Heta dîmenê kuştina bavê xwe û di himbêza Rabî de, ji ber ku tenê di wan deman de ye ku mejî û aqilê wî ligel xwe namîne. Di demek ku ‘Xerîze’ ya kovî bi erkê xwe yê serekî ve mijûle, ‘Awez’ yan jî ‘Xûd’ erkê xwe diyar kir û bi agehdarî, beziyaye û rûniştîye ser çokan. Li gor dîtina Froyd “(ID) xerîze û ‘EGO’ weke nûnerê mejî, awez, Superego weke nûnerê wijdan xwediyê sê beşên serekî yê gewdeyê kesayetîya mirov in.



‘Superego’ yan jî wijdan, li gor normên civakê ne û di mejiyê mirovan de hatine bi cih kirin. Bûye beşek ji mejî û di nava dil de hatiye çandin. Ew nirxên ku civak ji despêkê ve bi rêya dayîk, bav û mezinên xwe ve, piştî jî bi rêyên cur be cur li ser mejiyê ferd dibe deshilatdar û deshilatdariyê dike. Hesar semboleke ji ‘Superego’. Di rastiya xwe de ya bingehên nava çîrokên hesarê girtî nava xwe, kirî parçe û qet kirî, hesar nîne ku kelpîç (blokên ji heriyê tên çêkirin), blok û amêrên madî çêkiribin, belkî bawerî û nirxên wî cihîye ku ew lê dijîn.

*"Her wê şeva Rabî li odeya jêr bû, fehl bibû (şehwet), xwîn hat derve û dengek hat... Ket nava... Tû dibêjî qey her yek ji wan dû devê wan hene, bi yekê dinalêne û bi yê din dixenî. Bi çavê çepê rondikên reş dibarîne û bi çavê rastê rondikên arambûnê. Ne çar destên wî. Tû dibêjî qey bi sed destan ez bilind kirim.... Di aliyê stêran de ez pal didim û himbêza nermbûnê ji bo min vedikirin. Di bin re jî min hemû çavên wî didîtin ku weke stêrekên biçû derdiketin... (şêzad hesen, 44: 1998)*

*Xwîna bav hê jî bi destê min ve hişk nebibû... Bi nefret be 'Rabî', wey li wan lêvên lerizî yên dibiriqîn, zîrey xilxal, bazin li pê û destên wê... Bi dengekeî fehlbûnê (şehwestbazaney) ji min re di gotin:*

*"Tû bikûje... Ya piştî ez dizanim...!"*

*Tevî ku jina zarok hê jî memikên wê bi tamamî nerisabûn, her wê şevê min destê bi xwîna bavo sor bûyî bi cî hişt û li pey wî baxçevanê çavşîn ket ku ti fêlek nedît derbasî nava hesar bibe. (şêzad hesen, 46: 1998)*

Li gor dîtina derûniya Froyd, heta cihê ku wijdan li ser mirovan de deshilate û hikim dike. Xerîze beşa çîrokwergirtina ferde, paşde dide û wisa lê dike çokê dane. Lê ger wijdan ji ber her sedemekê were lewaz kirin, êdî Xerîze dike roja xwe û hevsar diqetîne.

Ji ber ku bêparbûna ji cotbûnê, wisa li me kiriye ku qet baweriya me bi bavê me nemîne. Derbarê vegêranê de jî nekû her bêparbûna ji seksêye ku wijdana wî, wî bédeng dike û wî neçar dike ku bavê xwe bikuje. Bi wateyek din ew baweriya ku baweriya bavê

wî jêre çêkir û bide hesarê, ne baweriyek zêde xorte. Ji bo wêne, keresteyên razandinê û bêhna xweş a ji bo dayîk û xwişkên xwe vediqetîne. Yan jî li beramberî sinetkirina keçên xwe nerazîbûnê nîşan dide, hinekan vedişêre û ji bo neyên sinet kirin. Lê êşa kesên di nava hesarê de wê têşîne. Di cîhana ‘Hesarê’ de tevgerkirinên bi vî awayî yên rû bi rûbûna hesar, şikandina tabo û derbaskirina sînoran. Dayîka wî jêre dibêje: *“Kurê min... Tû şerîetê fem dike, ne ji karê jinan. Piştî du rojên din we ava destê xwişkên te heram bibûya. Nanê destê wan. Eger baliq jî bibin, wê kêmtir xewnan bi tiştên heram ve bibînin..!”*

*Marîtiya Rabî torikek lîre, 3 hespên kihêl, 20 çêl, 3 xezak, sed mî, û segek pêşeng bû. Piştî pîlanê min fêma kir ku ew jine eyare, hem nefêmaye û meyla derewan daye min. Hemû çavgirtin û bireh bilind kirin, çavlêgerandina fêl, bi dû gotin û gotinekê ez avêtim. Di dawiyê de min zanî ku ji baxçevanê çavşîn hez kiriye...*

*“Tif li wan şevên ku li cihê ez di himbêza te de bim... Ezê di himbêza bavoyê de binivim.”*

*Li ser hewz, bîr û li gel bîrê her carê axaftinek dikir. Gelek caran ji qestan nedihîşt agehdariya min ji çirîsk û pirtikên di nava lêvên wî de fêr bibim...*

*Di got: Mafê mine wisa be.... Ger kur bê demar û xesayî bin, çima bavên wan wisa nekin..? (şêzad hesen, 35-36: 1998)*

Vegêrê ku bi xwe evîndarê Rabiye, dikeve ber bandora alîgirên wê. Tenê mehek piştî şahiya Rabî û bavê wê re derbas bibû, sitlekê li ser birayê xwe de ditewîne û bi awayek bêşermî jêre dibêje:

Di heftiya yekemîn a bûkîniyê d ji hemû hewiyên xwe re gotibû:

*“Jinîno yan ezê xwe bikujim an jî vî mêrê we... Eger hûn bikarin li gel mêrekê binivin ku bêhna tewêl jê bê...? Ez qet nikarim.” (şêzad hesen, 35: 1998)*

Bwêj tekane jina di nava hesarê de bû, ji roja yekemîn ve bêzarbûna xwe ji wê şahiyê venaşêre.

*"Ew baxçevanê çavşîn deh caran hewl da ku xwe dirêjî nava hesara me bike û bi çî fêlekê be bifirêne. Gelek bergên giro û rupoş (maske) li ser danî bû... Ez li derveyî hesar dîtîm û ji min re di got: "Kurê baş dema birîna darên mêwan e."*

*Nedigihîşt armanca xwe... Xwe kir nalbend, çerxvan û hwd... Herî dawî jî xwe kir derwêş û siwalkar (Kesên ji xwe re digerin)... Bavê min ji giyanê (rih) xwe teqîkir û bi werîs ve got, baxçevan be yan jî çerxvan; ger nexesiyaye bila neyêt di nava hesara me de... Ez naxwazim ti biyaniyek nehêniya vir û we bizane..." (şçrzed hesen, 35-36)*

Herçendî ku kesê vedibêje wê yekê venaşêre ku dizane Rabî peywendî ligel kesek din hebû, baxçevan bû û li nêzî baxçe dijiya. Ew mêrik ji bo Rabî bidestbêne, sûd ji her tiştêkê werdigre; lê bi wî awayî jî dibe dîl û koleyê evîna Rabî.

*"Wey li wêrekî û bê pakiya wê jina biçûk, Rabî... Rabî lêvên xwe lêqurtand û ew lêvên ku min dixwest li cihê bavê hez dikir ku maç bikim... Bi sedan sibehên wiha û heta ger gotin jî nebûya, em radigirtin. Li pêşiya me digeriya û pêngavên weke yên şahan diavêt. Pên li berên li pêşiya xwe dida, gelek caran ber bilind dibûn, li ejnî, belek û sîneman diketin... Nedibû ez bêjim: Off... Hinek birayên min nedikarîn mîz xwe li wan bigirin û hinek xwişkên min jî... Bi dengê qamçiyên li me dida, rêz hildiweşand. Dengê qamçiyek û di rê de me ji tirsan mîz bi xwe de dikir, di ber piyên me de dirija nava pêlavan de. Dema me belav dikir, weke ez gêj bibim min xwe digihand ser hewûzê, min serê xwe yê gêj dixist nava avê de û ji bêxîretiya xwe re digiriyam. Rondikên min... Bi xwîn in... Diriyên di nava hewzê de... Şermek mezin bû wan ew rondikên min dîtîn... Min di bin avê de dikir hewar... Hawarek... Her carê çend refên masiyên di nava hewzê de diteqand, ziravê wan diçû û serav dibûn... Pir serbestî avek xeniqî di nava hewzê min dikir qêr û hewar:*

Biwêj ku berî 'Ez' an fikir kiribû *"Xwedayoo... Wê kengê were û ez bavê xwe bikûjim, ji bo ez bikarim bi serbestî jinekê himbêz bikim."*

Kesê vedigêre bi berdewamî behsa jîrî û ciwaniya Rabî dike û bêyî veşêre, hestên xwe ji Rabî re vedibêje:

*“Wê kengê were û bikarim dergehên hesarê vekim; emê kengê bi xwişk û birayên xwe yên di nava hesarê de şad bibin. Bê û xwe bavêjin himbêza dayikên me, bigirîn û behsa xerîbiya bajaran bikin...?” (şêzad hesen, 36-37: 1998)*

*Ger jina dawî nebûya, min qet nedikarî jina hez jê dikim bikûji. 'Rabî' ciwane, ji hemû dayikên min şengtir, hêjatir û ezîztir e... Pir hêjatir e... Wey li Rabî, hê jî bûka mehê bû û rojekê ez parastim. Li ser bîrê, bi sitla xwe ve, li derdora bîrê dizivirî û radiwestiya. Xwe li şorî bîrê kir û di nava bazinê li derdora bîrê zivirî û rasterast ket beramber. Zêdetir xwe li ser şureyê de şor kir, giraniya herdu memikên biçûk dadirî û paxila kirasê xwe yê tenik zêdetir ji bo jêrtir dirêj dikir. Coyên gelek teng ên di nava herdu memikan de ez gêj kirim. Gelek nemabû serê min gêj bibe û bikevim di nava bîrê de... Bi awayek bê şermî ji min re got:*

*"Tû temaşeyî çî dikî, namerdê xesiyayî, tû derewan dikî... Ger xîret di demarên te de hebe, îşev were himbêza min... Şevan norim..."*

*Min dizanî eger ne di himbêza jineke xwe de be, zehmete ez bikûjim. Ti tîr û xencereyek goştê bavan nedibirî. Tenê dema jehra spermê (şehwe, ava zilam) wî diket nava hinavê dayikên min, tenê wê demê masûlkeyên laşê wî xav dibûn û benê demarên wî vedikirin. Bi şevan wî bi xwe hemû qûfî, mûm, çira, lampe û fanosên di nava hesar de vedimirand. Yek bi yek piş dikirê (vedimirand). Pişek wisa ku di demekê de çira bi hev re vemirin... Erê mûm... Ji bilî çirayên di nava tewîle de, ligel çiraya timî di nava hemam kevin de pêkirî ku berî demekê kesê nediwêra xwe di nav de bişû. (şêzad hesen, 30: 1998)*

*"Piştî sê şevan, sê şev piştî yekemîn plarî cergbirî Rabî ku ez girtim, ew plarey ez wêran kirîm. Dû qatên din zêdetir anî serê min... Her li ser hewzê hespê ereb ê bavê min av dida. Min destê xwe yê rastê xistibû di nava hewzê û ji bo ez nava lepên xwe ji wê xwînê paqij bikim ku hesp berî avê vexwe zimanê xwe xistibû nav de. Min Rawî dît, lezûbez û bêhn teng hat li rasta min rawestiya û gotinek avêt... Zû derbas bû. Hinekê wîrdetir dewlikê xwe xist nav bîrê, weke bêhna nêçîrvan kiribe û tirs a be, çep û rast awir dida... Cara yekem bi çirpeçirpîn... Hêdî hêdî deng jê hat û dûbare dikir:*

*"Îşev jî tû wê ligel min bî... Ligel.... Min... Dibî..."*

*Bi destê çepê lixavê hespê min girti bû, min fitik jêre lêda... Ez li ser fitik lêdana xwe neketim, ne hesp têr av vedixwar û ne jî ez ji Rabî têr dibûm... Mil diket singê sitla tejî av...*

*Heta derengiya şevê di odeya tarî a min de serê xencerêvtûj dikir, min xwe li pêşiya neynikê danî û ji bo çawa biweşênim. Hesar bédeng û tarî, hesara gelek mandî, tejî xewnên tal, wêranî û rûyekî spî bûyî. Segên çill û çepel ên weke ku bêhna karesatekê bikin, li ser hev direyîn. Dûvikê xwe dihejandin. Divê ez sed çavî û hişyar bim û bikarim bi sed destan ve êriş bikim. Kesê ez ji plana wê şevê agehdar nekiribûm. Ez ji wê yekê tirsam ku yek ji wan xwişk û birayên min, nexşeya min hilweşînin. Ew tiştê veşartî ji devê dayîkek min bikeve xwar û weke agirê di nava pûş de hemû hesarê bigire nava xwe... Di nava dergeh de çend caran tirsê ez girtim û dûdilî ligel min peyda bibû. Rûyê acizbûyî yê bavê min dihat xeyalên min û min destê xwe datîna ser xencerê. Li aliyê navîn jî herdu komikên ejniyên min diketin ber hev. Ne lerizîna lêv û ne jî dilê tund, di ne dema xwe de bû. Herdu navlepên min xwihdan didan, min zû bi zû bi mendîlê paqij dikir û zûtir ter dibû. Weke kesek mirî mest dibûm, bêyî agehdariya min jê hebe digihiştim li ber dergeh. Min destê xwe da ber dergeh û min wisa hest dikir ku yek ji aliyê din ve dergeh digire û nahêle ez biçin hûndir.*

*Rabî rastiye jî naxwaze... Nehiştibû, bavo kilîl lêda yan jî sermestê listik, xapandiye an jî derizînek xistê... Hebûn û li beramberî alaveke bavê min û Rabî, serê min êşand, min derizîn kir meydan... Odeyê ronahiyek zêdetir a asîman bi xwe ve dît... Gûhê min lê bû, bavo ji Rabî re di got:*

*"Îşev te aqlêt kiriye rihê Yasemîn û zeyt li xwe daye.... Ev bêhne min aram dike..."*

*Serê xwe xistibû serê sing, piştê wî li min û cîhanê bû. Weke wê yekê bû di nava singê biçûkê Rabî de ji gewherekê, tiştê veşartî... Lezeteke xweş bigire, weke bixeniqe her çar pelên wê li her derdorê diavêt. Ketibû li pey rihê Yasemînê û nedihat. Herdu memikên Rabî ber bi herdu guhên bavê min de girê didan. Bêhna Yasemîn û xeniqîn, di*

nava dûla teng a herdu memikan de xîretek da min... Bêyî agehdariya wî ji wî hebe, ji min, hesp, hêstir, dîk, sivûrî û segên wî... Ji mexmûlata hesar, bêyî agehdariya ji pîlanê û di pêşbîniya jina qereç de, ji bo carekê tîrêjên heyvê li ser pişta rût û ji xwîhdana zêde, weke bazekê bû... Rabî di bin wî dêwî de xeniqî bû... Te di got qey parçeyek ji çiya bi ser de hatiye, nekû tileyek dest û nehên pê, heta mûyekî porê jî: Ti tişteke ligel min diyar nebû. Ji bilî gewdeyê rût ê bavoyî ku bibû demarek çilmisî, mezin û rep. Di lîstika masûlkeyên herdu mil û pişta wî de, ez dibûm hêlmeke tenik û li ser pişta wî bilind dibû. Weke wê hêlma ku li cihekê bilind dibe. Di dem û kêliya av rijandinê de (ava mêran) hêlm xwest û min bazek dayê, ez li benda şatekan û kêliya dawiyê bûm... Min bi mêranî xwe gihand ser piştê û min nehêla... Xwe bigihîne lezzeta dawiyê... Di nefesa dawiyê de û bi nefek aram, di maça dawî ya teji tamgihîştîmê û xwe dihejand... Ji wê dema ku hemû şahdemar, hûcre û masûlkeyên wî xav bibûn. Min destê xwe bi tundî li ser xencerê şidand û qasî min karî min rakir hewayê. Min bi awayekî dînane sê xencer lê weşandin... Min danî ser milê çepê û herî dawî zextê lê dike.... Ew ava xwe ya zehrî dirijand di nava hinavê Rabî de û min jî qehra xwe dirijand... Wey li wê dema ku lezet û mirin tevî hev dibe. Hevesa şehwet û nefesê... Her heman lêdan: Tekanên cotbûn û yên windabûnê, min nedizanî evane muçirkeya dawî ramûsane yan raçenîna dawî û xweparastina ji bazinê windabûnê xenî bû. Girî yan jî tirîqe ye? Ez nizanim... Dû dûleyên nazik û tenik ên xwîne kir û rijiyana nava herdu çavên min. Min herdu lepên destê xwe xistin ber çavên xwe, Rabî û bavê min... Herdu bi rûtî (tazî) di nava odeyekê de ku dîwarên wê bi xwîne bûn û li pêş çavê min sema dikirin. Rawle li ser kevilê xezalekê xwe dirêj kiribû. Bavê min kevilê pilingekê avêtibû ser qûna xwe. Rabî jî bernedida û bi tundî bi xwe ve girêdida. Baskên xwe yên nazik di nava hundirê wê de alandibû, ji bo ew xwîna germ nerije ser herdu dest, zend û bendên ji gewizan û negiha xwêlaneweya xwe. Dema bavo xwe bêdeng kir, Rabî ez dîtîm. Ez zeft kirim û bi niyeta ku darbeya xwe ya dawî li min bide û li hemberî min serkeftina xwe ragihîne. Ew jina biçûk, dixwest bizane tama dest ji milanê mirinê çawa ye... Bavo.. Wek dêweke ecêb (seyr) ê ku milê wî nezivire, piştire awirek da min û wekî spasiya min bike. Di nava dema herî xweş û di nava himbêza jina biçûkû pir heskirî de dimire, bêhna Yasemîn ez dîn û har kirim.... Tû bêjî ew girnijîn xweş be? Ger wisa be çima tenê bîstekê segên rezîl guhdariya min nakin? Xwedawoo..

*Bêhna vê xwînê wê kengê ji destên min biçê? Herî dawî Rabî herdu baskên xwe di nava himbêza bavoyî de şor kir û berda; bavo xwe bi dîwarên odeyê de dida û bi herdu lepên xwe yên bi xwîn nexşeya herdu destên xwe li ser dîwarna dihişt. Rabî weke tû bêjî ji vê xwînrijandinê... Zêdetir xwîna sed mêran dirêje, qet têkneçû... Weke ji serşûyê (hemam) hatibe derve û kirasê bûkîniyê bixe ber xwe... Kirasê xwe kir ber xwe û xwîna meyayî ya li ser tiliyên xwe di alast. Bavo bi destê bi xwîn ve wisa lê dihat ku êriş bike. Rabî ji aliyê din ê dergeh ve çû aliyê din... û ... Êdî winda bû... Diviyaba min nehiştta êdî ketiban...Herî dawî min guhdariya qêr û hewara Rabî bû û mizgêniya mirina bavê min ji hesarê re radigihand... Pêwîst bû min di kêliyên dawiyê de yên bavê xwe ew ramûsanda. Ditirsam ku di kêliya dawî ya jiyana xwe de destê wî bigihe qirika min û min bixeniqîne. Herku diçû tilîliya Rabî dîmir û qêre qêra di nava hesar de bilind dibû. Bavê min her bi zêdeyî û bi darbeya malê dinyayê, Rabî kirîbû... Ji hemû dayîk û xwişkên min re gotibû:*

*“Xwedêyo ya rebî ezê serê vî mêrikî bixwim...!” Dema xwişkên min ji keyfa bavê min tilîlî didan.... Gotibû:*

*“Ez bi tilîliya şah hatim nava hesarê, lê hûnê bibînin: Ezê bi lûleya şînê jê biçim derve...!” (şêrzad hesen, 32-35: 1998)*

## **KARESATA JIN ANÎNÊ KAREKTERAN**

*“Mêriko ez hatibûm ji te re bêjim, piraniya kur û keçên te vaye pîr (kal) bûne.. Mane tû wan ji tov re hilnagirî û tû dixwazî çi bikî...Ha...? Ser û rihên kurê te yê nexrî (Kurê yekemîn) spî bû û vaye erkê hemû hesarê li ser milê wî ye... De bila dilê te hinekê nerm be û xema jinekê jêre bixwe...Dayîkên we lal bin... Dengê gelek keçên te derketin...”*

*Bi awayek dînane, di nava kuxikên kêvroşk, sivorî, pişik û bilbilan de mezin bibû... Her wê şevê bi lezûbez ji dîwanxaneyê hatibû derve û heta asîmanê hesar dikir hawar... Li her çar aliyên xwe dizivirî, ji qehir û xema gotina jina mezin a piyê wê nediket li pey du kêvroşkan... Herdu di cih de mirin, pişikêk ku di destê wê de bû û bêyî agehdariya wê jê hebe; heta ji dihat li dîwar dida. Ligel wê hawar û naletiyê, bilbilên ditirsîyan çûbûn*

nava qefesên xwe de. Ji tirsaxezeba bavê xwe, dil û baskên wan diteziyan. Herwiha baskên wan ewqas diweriyan di nava qefesan de, nava wê teji perên zer û sor bibiûn. Nedizanîn her tayek ji niha û pêde keyfxweşi û ji nişka li pey çî wisa har bûye. Pişikê jî bi nire nira di nava hesarê de, rû û bîreke girtibû, bê agehî û têkçûyî biribû nava bîrê. Herdu kêvroşkên mirî xistibû di destê xwe de... Piştî jî her yek avêt aliyekê... Dikir nire nir... Hemû xwişk û birayên min... Dema dayîkên min ji vê hewarê agehdar bûn, hatin ber derî. Hinekan li pişt pencereyan temaşeyî bavo dikirin ku şeş-heft gotin dikirin... Kit û cot xîreta xwe didan ber xwe û dihatin di nava hewşê de.

“Guhê xwe bidin min... Ji bo cara dawî... Li vê hesara min ne kur jinê têne û neji neçare ku keç bizewice... Ya xwe weke keç min bibîne, dive di nava tarîtiya odayê de jî rêzê li xwe, li min û li hesarê bigire... Bila agehdariya we ji we hebe... Çavên min hene... Kengê min zanî ezê we bidim şû... Ezê jinê jib o kuran bînim... Ev gotina yekemîn û dawiyê. Hûn têgihiştin? Dema ez mam û dikarim jin bînim, ezê her salê çend dawetan bigêrînim... Êdî hûn ji min re nabêjin ji vê zêdetir çî ji bo we pêwîste? Her ew mabû kur bikevin li pey quna jinên xwe, keç bikevin pey wan û ev hesara nazdar weke berê dest vala be... Hûn ji min re nabêjin eger ez mirim, ev hesar wê ji bo kê be? Ez bi hevî bûm, navê min kûr nekin... Vir derbas bikin.. Weke segên min ên biwefa û ji dûriya bi hezara ferxikên segan bêhna xelkên biyanî û xerîb bikin. Weke teyr û bazên min... Ji wan jî dûrtir bibînin...

*Başê... Gelek başê kerem bike... Hûn hemû ez çî bêjim... Bila ez bi tenê di vê hesarê de bimirim û piştî jî bila pişik min bixwin...” (Şêrzad hesen, 40-41: 1998)*

## **AZADÎ KAREKTERAN**

Ji min re gotin: "Erê çîma xîret we nagire, her vê şevê em jî hesarê bi cî bihêlin û serî rakin... Bila îşeva şeva dawî li bendewarî û kolebûna di nava hesarê de bê û şeva yekemîn a serfiraziyê be."

*Her hemûyan gotin: "Em biçîn kûderê?"*



*"Bê guman eger em biçin cihekê, tû pêjî li derveyî vê hesarê cîhan kaviîl û bi dawî bibe?"*

*Birayeke min bi mêranî rabû ser xwe û got:*

*"Guh bidinê wisa başe ku em biçin, van kêvroşk, pişîle û sivorîyan bênin."*

*"A... Dû rê li pêşiya me hene. Ew jî yan revîn an jî anîna hemû kelûpel û firindeyên di nava hesarê de ye."*

*"Korînoo... Em ewqas bê xîret nebin... Emê jêrê bêjim: Em bêzar bûn ku em ewqasî xizmeta hesp, hêstir û segên bi bêhn dikîn"*

*"Kî wê jêre bêje?"*

*Kesê deng nekir.*

*"Başe... Sibehê... An jî sibe bi şev emê hemû hesarê razî bikin û heta bavo nehatî, emê destê hev bigirin û bêyî awirdanê emê pêşî lê bigirin..." (şêrzad hesen, 50-51: 1998)*

### **CIHÊ MANA HEYWANAN (GOV):**

*"Em di wê guftûgoya tund de bûn û me ji dûr ve di dît... Çavên girtî û bi sedan pişik temaşeyî me dikin; heta em nêzîk dibûn zêdetir kêvroşkên min ji pişikan cûda dikir... Em dihatin û pal dida... Dengê wan dihat... Me destê xwe di ber xwe de şûr kir û rabûn ser piyan, bi awayek bê hêvî... Em çûn nava hesarê... Hatina heywanên dîl û serşor li rastê hat û heta em bawerîya xwişkên xwe bikin bihane... Bihaneya destjêberdana ji xewnên rev û xirabkirîr... Min dît her yekê pişîkek, sivorîyek, kêvroşkek xistin himbêza xwe, em bi awayek aram û aramî çûn di nava hesarê de..."*

*Seg jî ji werînê nediketin, weke tû bêjî bêhna karesatekê kiribin. Min ji tirsan dergehê hemû kolanan vekir. Di nava hewşê de ketim lîstinê. Me bi alîkariya hemûyan karî segan derbixin.*

*Ji vir û ji wir em ketin pey wan... Ji hewşê ber bi aliyê din ê şûraya dergehê hesarê, me hemû dergehên hesarê û hemû dergeh girtin... Me vekirin... Bêsûd bû... Heta sibehê ligel seg û pişikên... Sivorî, bilbil û meymûnên wî.... Ker û kevok bi wê yekê ve mijûl bûn, birîndar û westîbûnê serşor bibûn. Tenê balindeyekê jî ne dikarî bifire. Heta tenê sivoriyekê xîreta wê yekê nebû biçê ser darên gozê... Lawira (heywan) herî kovî ya di nava dergeh de serê wan dizivirî, piştire vedigeriyan. Em ketin ber dergehê hesarê, weke em bikevin ber xefîkekê de û neçîn... Ewqas derbas nebû, ji înetî xêzana di nava kolan, şaneşîn, tewêla û qefesê de... Serê daran, afir û jêra eywan, wey nalet li ajalên bê sûd. Baskên we veweşin. Hîç û serhişk nebû, di nava daristan, şer û dehlan de dima... Hûn bûn... Ger hûn ne dilê di nava qefesê û zincîrê de bûna, ezê serbest û azad bûma... Te û 'Rabî' we fêl li min kir... (şêrzad hesen, 51: 1998)*

#### **REVA XWIŞK JINBAVAN**

*Hinek xwişkên min ligel seg, pişik, sivorî, kevok, meymûn û roviyan de xerizîn û venegeriyan... Karwanê bavkuj ket tevgerê û ket ser rê. Wan xwe li pişt hiştin û hinek jinbavanan bi navê tamamnekirina fatîheye xwe dereng dikirin... Wey ketina tewêlan, şikandina qefesan, rûxana hêlînan, bêdengiya hesara me... Ti firindeyek bê nav gora xwe bi cî nehiştin... Karwan deng veda û em vegeriyan... Em ketin pey wan... Me bi çepik û firîna beran, me balind difirand... Dema min serê xwe bilind kir, pelên ewir jî yê weke yê firinde û dêwên bavê min xwe nîşan didan... Mil nedidan û ... Zêdetir diazirandin..*

*Di nava ax û xweliyê de razan... Bûn gustîlkek û li derdora gorê surhek ava kirin... Bazinek... û... Dû... Sê... û ... Deh... Her ez bi tenê mam. Karwan weke tezbîheke hezar û yek lib qetiya û libên wê ji hev cûda bûn... Bi vî awayî xwişk û birayên min ji dest çûn, çav û piştî xwe dan min... Bê sûd bû... Yek bi yek di nava rê de xwe dizîn, ji karwan vediqetiyan, xwe di nava şikeftên li çiya û di bin daran de diveşartin. Di nava rêya vegerê de gelek çûn, serî rakirin, ciwan û yên nû baliq bûyî jî ji tirsî xwîna bavê xwe serê xwe dixistin di bin şikeftên li çiya de. Heta wê tilîliyên dibarîn, keçan ter û hişk lihev didan... (şêrzad hesen, 56: 1998)*

## MÎRATÊN KAREKTERAN

*Vegeriyam hesar... Ez çûm wî cihê ku birayên min ên di bin bergê seyr û ecêb de li ser mîrat şer dikirin. Her yekê bi zimanekê... Dema ji hev tenedigihîştin, dengê wan bilindtir dibû...*

*Ava di nava bîran de hişk dibû... Min nas nedikirin... Tevî ku ji hemûyan zêdetir hat û destê xwe danî ser milê min... Behsa gotinên birayên xwe dikir, tekane kes bû bi zimanê min diaxivî. Hewarek bi mêrane ji min kir ku êdî ew şerê weke yê segan û bila êdî dawî li şerê li ser mîrat bê. Ferman da ku hemû piştgiriya min bikin... Ji min re got: "Em hemû birayê te ne û bavo em lal kirin..."*

*Lezûbez kiras û kurtek kir ber xwe û got:*

*"Vaye ev jî nîşan e.... Bi dîqet bila agehdariya te ji wan birinên kur ên li ser pişt te hebe..." (şêrzad hesen, 58-59: 1998)*

## HEWARA KAREKTERÊN:

Li min kom dibûn û di gotin:

*"Hoo birayê me yê nepak... Kurê xirab û ne ji çi re.... Te çi anî serê me û xwe? Li hewara me were... Li hewara xwişk û birayên xwe yên timî bextreş (Bêsiûd) û timî bindikevin were... Em hemû xerîbiyê dikin.... Ka te çi li bavê me yê mêrsax û qehreman kir? Ka te çi li mêrê me kir? Ji wî zîlamê ku zarokên di nava landikan de jê ditirsiyan, ew mêrê ku siwarê herî mêr û heyranbêjê herî baş bû... Vaye tû dibînî hesar bêyî wî vale ye, ava aşî rawestiya ye, ji seg û pişikên nazdar vala ye; ka dengê hesp û çivçîva bilbilan... Qediya... Te ez bê hêvî kirim, yên tên di nava cihên me de, bi ti awayî ne mêrin..."*

*Ka ti kes piştî bavê wêrek yê qamçî li laşê sar û sermayê dida nema. Mêrek... Nêrek di vê hesarê de name. Bi heyzeranê kefel, nema li ran û laşê me bide, ji bo laşê me*

şîn û mor bike. Wey ji bo nêre mêrek ku dijûnan ji me re dike. Me sivik bike (Bêrêziyê li me bike), em xwe bavêjin ser pêlavên wî û me xwe avêt.. Serê klaşa (pêlav, şikal) xwe li coya di navbera herdu memik, jêra çeng û nêvrana me bide.. Zelamek bike hawar û weke dêwan bike qîr. Erşê felekê bihejîne, hawarek weke hawara bavoyî, ne timî derbikeve... Bigre heta jêra kiras û laşê me ter bike... Ka mêrek nema tifê li me bike... Me tif bike, nehêle em bi destmal (mendîl) û xewliyê paqij bikîn... Hezar heyf û mixabin... Piştî ku ti kes nema pişikên nêr bixesîne, wey li vê bexreşiya me. Nefesa sar... Bextreşî... Bê kesê... Hiş bi serê... Bê sîberê... Mêr nema ku tamekê bide me, ji jêr ve... Bi dizî xewnê bi tiştên heram bibînîn û bi her awayê ku keyfa şeytan jêre were. Wey ji destê te birayê me... Xwedê xêra te nenivîse, cihê te dogeh (cehenem) be ku te em ji xewnên xweş dûr xistin... Te em destvala hiştin... Ew mîrên ku dihatin nava xewnên me de, bi sedcarî ji van gamêşana camêrtir, ciwantir û bêhnxeştir bûn. Tû wê çi bêntî serê me nexriyê hesarê... Tû bûyî sedem ku em vir vala bikin... Bila ev mîrat her ji te re be. Hesarek ku egîd û mêrxwazên weke bavê te di nav de nemînin, bila sed caran kavi û wêran bibe. Û ... Hêlaney şemşeme kwere u kone pepû..." (şêrzad hesen, 60-61: 1998)

### **DÛ DILIYA KAREKTERÊN:**

"Bi roj wisa... Bi şev jî nizanim çima ez maç dikirim... Tenê vedimirandin û pê nedikirin... Ne carekê direviyan, carekê diçûn û carekê vedigeriyan. Her xwişk û birayekî min sond dixwar ku heta cîhan mabe serê xwe nexe vê hesarê... Lê derew dikirin... Yên ji sîbera xwişkên xwe ditirsiyan... Berî xatira dawî bixwaze, me dîwarên derdora hesarê dirûxand; ez, bavê min û kurên wî yê me derxistibûn. Eger dengê ji davên dayîkeke min hatiban, ev dîwarek nû ye... Dîwarek din li derdora hesarê lêdida, dîwarê keçê ji yê kur bilindtir... Digiriyan û rûmeta xwe dax dikirin... Ber bi şaşitiya sema û xezebê ve digiriyan: Em çi li hesarekê bikin ku dîwarên wê, kerete, şeqlê, pencereyên wê, kevir, dergeh, qemtere, tewêlê, afîr, hêlîn û qefesên wê şikestin; hilweşiya û me derdixist. Di nav de çûn... Kekên me yê nemerd em jî di nav de çûn... Bi şev em li pişt mast û miyan bûn.... Em ketin ser avê û gera lezetê... Hemû jinên por dirêj

*ên hesarê ez radikêşam, ez ji memikê şor û du danik ê hinek ji wan ditirsiyam... Eger min xwe xistiban destê zilamên xerîb û keşel, wê weke berxika qurbanê ez li erdê xistibam û wê ez zeft kiribam... Xwişkên min wê herî û qur avêtiban min... Li ser lep û herdu çokan... Wê ez biribam li ser gora bavo û ji bo li wir hemû bi hev re, nêr û mê binalênîn... û ... (şêzad hesen, 61-62: 1998)*

### **GUHERTINA AJALAN WEK KAREKTERN**

*"Piştî bi dehan şevan, hemû hesp û hêstir lewaz bûn. Seg û pişik kerbûn. Sivorî kore bûn û bilbil jî yek bi yek niklê wan diweriyan. Kêvroşk jî çar pelên wan bi erdê ve dibûn yek. Meymûn bibûn mêweyê hiş ê li ser darên di nava goristanê de. Ne hêza hesî mabû deng ji xwe derxîne, ne bilbil deng ji xwe derxîne, ne pişik bike miyew miyew, ne seg bireyîn û ne jî kevok bigimênê... Birsîtî û ténîtî... Serşor û niv mirî... Tariya şevê bû û me dît ku pişikên ji birsan bilbil dixwarin. Segan jî sivorî û kevok dixwarin... Hesp û hêstiran jî ji bilî axa sar a li ser korekan, hîçyan şî nedebird. Tû ne diwêrayî destê xwe bixî ser piştê wan, nekû birbira piştê wan bişkê. Meymûnên ku mabûn jî, pel bi daran ve nehiştin... (şêzad hesen, 62: 1998)*

Ew mînakên ku min di nava kesayetiya romanê de anîne û behs kirî, ji bo wê yekê bû em bizanin ser û mînaka kesayetiyên li wir çawa ye. Mînakek li pêşiya min avêt. Lê razîbûna wê rewşê kêmkirin û biçûkirina çîrokê ya di beşek biçûk de ye. Raste li gor dîtina Froyd û di dîtina bingehîn a wê çîrokê de gotina serekî dikin, lê hesar... "Her di wê yekê de nayê kurt kirin." Hêvênê serekî yê çîrokê, 'Deshilat' e. Deshilata ku di wateya xwe ya giştî de, vêca deshilata bav a li ser xêzanê be yan jî deshilata siyasî li ser civakê deshilat be. Çi tiştê diparêze û berhemtêne? Deshilatbûn û deshilatdariya li ser civakê de... Bi zorê û dorpeçkirina beşek ji formên deshilat û parastina wê. Deshilata siyasî di formên hikûmetan de çek, girtîgeh, yasayên wna hene, diyare rê û derfetên wan ên aborî jî hene. Lê ew ji nebûna deshilata li ser dîtinê de, armanc û encamên baş bi xwe re naîne. Çêkirina astengiyên derûnî yên bi awayê ku xelk û di astek belav de, civak di

wê baweriyê de be bi xwe ew astengê danîne. Ev jî di çavê forma derve de deshilatek giringtir e.

Di çîroka hesar de... Bav hem qamçî heye, hem xencer û hem jî gopal. Yekem û duyem, nîşana hêzek eşkere ne, lê bi dîtina min gopal nîşana piştgiriyeke ye ku çavkaniya xwe ji baweriyê girtiye. Tevî ku sûdwergirtina bav ji gopalê xwe, bi dîtina yên din dîtina min dixê nava pirsgirêkan de. Lê mirov dikare bingehê van xalan di beşeke din a çîrokê de bibîne. Bavo di cihekê de dibêje: “Çi kesê bi vê hesarê razî nebe, bila biçe derve.... Ez baş dizanim li derveyî vê hesarê wê çi were serê wî. Eger hikmeta min nebûya, wê heta niha ev hesar kaviil bibûya. Cihê tiliyên min bûst bi bûst li ser diyare. Xeyalên vala nekin... Ji derveyî vê hesarê û dûrî çavê min, ti kes ji we nikarin bijîn... (şêzad hesen:R49-50)

Di cihekî din de dibêje: “Her çi ji zarokên min ên ku tama qamçiyên min nedîtibe, ne qelew dibe û ne jî temenê wî dirêj dibe... Ev şahiya qûrbanîkirinê ne ji rêzê bû, bavê wan kêl li ser qirika (gewrî) kurê xwe danî... (şêzad hesenR56)

Li cihekî din de “Ez dizanim başiya we di çi de ye... Mafê min ê wê yekê nîne...” (şêzad hesen R. 57)

Armanca bavê wan ji van amojgarî (şîret) û gotinan çêkirina wijdana deshilata xwe ya di dilê jin, zarok û hemû yên di nava bazinê deshilata wî de ye. Ev berdewama qamçî û girtûgehan in. Wijdana deshilatgerî, kesên ji dil ve neçar dikin li gor deshilata bavê xwe tevbigerin. Ev wijdan taboyek ji deshilat û deshilatdariyê çêdike, wisa lê dike ku çi dema ferd piştguh xist; di dilê xwe de rastî dijwarî û paradoksê bibê, hes bi tawan bike û xwe weke tawanbar bizane. Tiştên bav dibêje, ne tenê dîtina wî ye. Yên din jî di çêkirina wê baweriyê de hevkarê wî ne. Hesar her ev dîtinane ye. Hestê xwe sûcdarkirinê yê piştî kuştina bavê xwe, her çavkaniya xwe ji van baweriyên werdigire. Di cikava pêşketî, kevneşopî û Rojavayî de, bi berdewamî bav bûn kurên xwe di kuştin. Bi ti awayî jî hest bi şermê nedikirin û têkneçûne. Rûstem, Zorab dikuje û her bi Rûstem jî dimîne. Li beamber ne kuştina bav, heta fikirindina wî jî weke tawan binavkiriye. Ji ber ku di vê civakê de bav nîşana deshilat û sîstema civakê ye. Ew sîstema civakî ya bavîksalarî û

piyawsalarî (Deshilata Bav), kole tiştên wan ên giring bûn. Piştî kuştina bavê xwe (Yê vedigêre), rastî paradoksê dibe û serê wî têkdiçe. Ji ber ku bi wê wijdanê ve karê xwe dinirxîne ku ji bavê wî jêre weke mîrat maye. Ew bi xwe yek ji sîberên bavê xwe ye. Sîberêk (sihber) ku di gelek çîrokan de sûd jê hatiye wergirtin, jiyan aram a bav di dilê xav û xêzana xwe de. Weke çawa seg di nirxên bav de nûnerê parêzvanin. Sîber û seg beşek ji hesarê ne.

Çîroka hesarê û... Rewşeke siyasî jî heye. Civakek ku bi hêviya reform û başbûna rewşê, sîstema kevin têk dide. Lê sîstema nû jî ji bilî formek din, ew sîstem kevne û ne tişteke dine. Di çend cihên din ên çîrokê de behsa wan zarokên fikra rûbirûban hesarê dikin tê kirin.

Tevgerên bav di çîroka hesarê de û ... Ecêbin, bendên wê... Lê divê em bêjin em ligel cîhanek destanî de ber bi pêş ve diçin. Ji bilî vê yekê eger di dîtina deshilat û berdewambûnê ve, temaşeyî tevgerên bav bikin. Wê demê ti tişteke ligel me ecêb nabe. Her deshilatek, çi bavê di nava malbata kevneşopî û çi deshilata siyasî ya di civakê de, pêwîstî bi kontrolkirina peywendiyên navbera kesên de heye. Peywendiyên navbera jin û mêr de yek ji peywendiyên herî giring e. Heta hewldanên ayînî jî ji bo kontrolkirina van pêwendiyên û bi armanca xwesepandin û deshilata li ser mirovan de. Bav di hesar de û... Bi kontrolkirin û pêdiviyên kesên di nava hesarê de, xwe bi ser de ferz kirin. Tabokirina peywendiyên seksî yên di civaka kevneşopî û Rojhilatî de, ne ji bo tendirûstiya exlaqê civakê ye. Belkî ji bo parastina deshilata deshilatdaran e. Deshilatek ku bikare heskirin, seks, kenîn, sema û guhertina xelkê control bike, xwe bi se hemû rehenên jiyanê de îspat kiriye.

## ENCAM

Şêzrad Hesen di romana 'Hesar û Segên Bavê Min De' giringî daye herdû karakteran, ango karakterê serekî û karakterê navîn. Bêyî cûdahî, rol, erk û pêkhateya wê diyar kiriye. Herwiha di romanê de ji bilî karakterê romanê, ajal xistiye berî rolê karakter. Wek; seg, meymûn û pişik. Rojnamevan bi awayek serkeftî navên kurdî yên weke; 'Zûlêxa, Hebê, Rabî û Zîba' ji bo karakteran bikaraniye. Vegêrandina çîrokê jî daye karakterê serekî û ew jî kurê mezin ê bav e. Di romanê de navê wî nehatiye û weke bav bê nav e. Romannivîs tevî sûdwegirtina ji beş û teoriyên derûnî, sûd ji pêlên hiş wergirtiye.

Romana Hesar û Segên Bavê Min, yek ji corên romana nûjen a Kurdiye. Xwendekarên romanê her ji despêka romanê ve digihin encama dawî ya romanê ku bavo dimire. Lê çima hest bi çawaniya wî karî, ber bi dawiya romanê ve diçe. Karakterê despêkê yê romanê, kurê mezin ê bav e. Her weke bav, navek jêre nehatiye diyar kirin. Şêzrad Hesen di roman 'Hesar û Segên Bavê Min De' li hemberî deshîlata bavîksalarî (Deshîlatdariya Bav) radibe û bi rêbazên derûnî şîroveya Froydî di nava zererên vê pîrsgirêkê guftûgo dike. Ev romana kurt behsa bavek dîktator dike. Heta tû bêjî bi awayekî dîktatorî û dij-mirovane ligel zarok û jinên xwe tevdigere. Li aliyekî din jî heta serê çokên xwe di deryaya şehwetbazî (fehlbazî) û seksê de niqûm bû.

Ev mêrek bi awayekê komeke jinan heye û hemû jî di girtîgehek mezin de girtiye. Vê rewşê jî wisa kiriye ku kurê wî yê mezin vî bavê xwe yê hov bikuje, dawî li deshîlata adetî û dîktatorî bêne. Çiraya serdemek azad û serbestiyê pê bixe. Lê li pişt kuştina bavê xwe, di carekê de rêxistina xêzana wî xirab dibe û bi temamî belav dibin.. Jinbavên wî vedigerin gel mêr û dostên xwe yên kevin ên ku bavê wî berî bi zorê ji wan wergirtî. Xwişkên wî her şevê diçin himbêza mêrekê. Xwişkên wî Zûleyxa û Sara, xwe davêjin himbêza Zêwanê seqet. Bira jî li ser mîratê şer dikin. Ew jî rastî nexweşiyek mezin a derûnî (pîskolojî) dibe. Heta dawiya jiyana xwe bi wî derdî dinalêne. Diyare îlhama vê romanê ji yek ji teoriyên Froyd hatiye, (Grêy Odyom, Riq Bune û Hillbaw). Herçendî îlhama wê teoriyê ji dîroka kevin a Misrê ji Froyd re hatiye, ji ber ku di wê serdemê de



kuştina bav di nava firewnan de hebu. Tiştêk asayîye di nava civaka Kurdewariyê de jî girên derûnî yên bi vî awayî hebin. Di dema xwe de beşek zêde ya xêzanên Kurdî di malekê de dirazan. Gelek caran bi awayek lihevkerin kur ji xewê rabûye û bav di himbêza dayîka xwe de dîtiye. Ev jî rastî wê giriyê kiriye. Diyare gelek caran jî bavên bi wî awayî hovane û di xêzanên Kurdewarî de hebûna wan hene. Ango tiştê Şêrzad behs kirî, heta astekê rastiye tal a di nava civaka Kurdî de ye. Ev roman di cihekê de gelek mijarên giring û hesas girtiye nava xwe. Nivîskar bi herdu destên xwe, bi awayekî tund (dijwar) gûleyê li dergehê mezin yê bavîksalariyê dide. Hewl dide ku bi hemû awayekî bavên dîktator ên li ser zarokên xwe dibin zalim, bikuji. Di heman demê de jî xwe weke rizgarkerek ji bo zarok û jinên Kurd nîşan dide. Ji bilî vê yekê jî bi awayek din meseleya seksê pir diyar derdikeve. Şêrzad bi awayek edebî behsa rolê seksê li ser kur û keç (Nêr û Mê) kiriye û nivîsandiye

## LÎSTEYA ÇAVKANIYAN

A. M. Forstêr, *Erkan El-Rîwayet*, Wer: Mûsa El-Asî, Dar, Çirûsî, Çapa Yekem, Terablûs, Libnan, 1996

Bûşra Kesnezanî, *Plot Le Çîrokê Kurdî Da*, Çapxaney Lerya, Silêmanî, 2012

Cemal Mîr Sadiqî, *anasr Dastan*, nişaret sixn, Tehran, çep çiharim, 1380

Cemal Mîr Sadiqî, *Edebiyat Dastan*, Çapa Çarem, Behar, S .1382

Cîms Konradû Axûrûn, *Nezeriyet El-Rîwayet Fî El-Edeb Încîzî El-Hedîs*, Wer. T. Teeqdîm, D.Encîl Bitrasî Sîmaanî, *El-Hîet El-Meeriyet El-Amet*, Lîlteelîf Wel Neşir, Çap. Esseqafiyete, 1971

Con Bîrîn, *Kîtabet El-Rîwayet*, Wer. Mecîd Yasîn Mûraceet: Dr. Methî El-Dirûsî, Dar El-Şûun El-Seqafet El-Amet, Bexdat, 1993

Dawid Xetaşe, *Qezaya El-Neqid El-Erebî Qedîmeha Hedîsaha*, Dar El-Seqafete Lîl Neşir Wel Tewzêh, Emman, El-Erden, 2000

Dayn Watt Fayer, *Fen Raman Nîwîsî*, Wer. Mihemed Cewad Fîrûzî, Întîşarat Nîkah, Çap. Yekem, 1388

Dîmonnayt, *Dastan Niwîsî Niwî*, Wer. Mehdî Fatihî, Neşir Çişmeh, Çap. Dûyemîn, Tehran, 1388

Ebdûllah Seraç, *Berew Astaney Roman û Gûşenîgakan*, Dezgeya Çap û Pexşî Serdem, Silêmanî, S. 2007

Ebdûlmelîk Mertazî, *Fînezeriyet El-Rîwayet Behs Fî Teqniyat El-Sirt*, Sîlsîlete Kîtap Alem El-Meerîfet, El-Meclîs El-Wetenî El-Seqafet Wel Finûn Wel Edeb, El-Kwêt, 1998

Elîzabet Dîbîl, *Pîrîng*, Wer. Mesûd Cehferî, El-Neşir Merkez, Çap. Yekem, 1389

Hejarî Mûkiryanî, *Henbane Borîne*, Ferhengî Kurdî-Farisî, Çapa Pêncem, Tehran, 1385

- Hemze Fadil Yûsif, *Hereket Neqid El-Qiset Fî El-Êraq (1968-80)*, Rîsalet Macêstêr, Camîet Silahedîn, 1988
- Hesen Besrawî, *Beniyet El-Şekir El-Rîwaî*, El-Merkez Seqafî, El-Erebî, Beyrût, 1990
- Hûsên Cemal, *Merahhelî Roman*, Întîşarat Şibahing, Çapa Yekemîn, Tehran, 1380
- Hûsên Hedad, *Birisê Henasir Dastan*, Tehran, 1387
- Hûseyîn Talîbyan, *Tewsîf Dir Dastan*, El-Neşir Rişis, Çapa Yekemîn, 1383
- Îbrahîm Cindarî, *El-Xezae El-Rîwaî Înde Cebra Îbrahîm*, Dar El-Şiûn El-Seqafiyete El-Amet, Çapa Yekemîn, Bexda, 2001
- Îdward Hêriş, *anwah şexsiyet*, nişr sixn, Tehran, 1377
- Îdward Morgan Forstêr, *Cenbanekanî Dastan*, Wer. Mûhsenî Sûleymanî, Neşir Negahe, Tehran, 1369
- Îdwîn Mîwît, *Bînae Rîwayet*, Wer. Îbrahîm Cebir Fî Dar El-Cîl Lî Tebeet, Misir, 1965
- Îzelddîn Îsmâîl, *El-Edeb We Finûnet (Dîraset Neqdiyete)*, Dar el-Fikir El-Erebî, Çapa Şeşemîn, Qahîret, 1976
- Kamûz Mehdî, *Enwae Şexsiyet Ha Cihan Ra Dastan*, Neşir Nî Tehran, 1377
- Leyla Yûsifî, *Dîdet Zawyet*, Mûcelet Temûzeşî Zeban û Edebî Farisî, Şûmarey (46), 1381
- Lîwîs Basgir, *Finûn Emûzûş Dastan*, Neşir Ixtirat, Çapa Yekemîn, 1384
- Lîwsyan Koldman We Xirûn, *El-Benîwye El-Teekwîniyet*, Welneqit El-Edî, El-Naşirî Mûsed El-Behat, El-Erebiyet, Çapî Yekem, 1984
- Mecdî Wehbet, *Meecem Mûstelahaatil El-Edebî*, Mekteb Lubnan, 1974
- Mehmût Fitûhî, *Terhî, Pezû Hîşî Nexdit Edebiyat Dastan*, Cehat Daniştgahî, Tehran, 1376

- Mihemed Emîn Ebdûllah, *Şakas Le Romanî Kurdî-Kurdistanî Êraq Da*, (1990-1997), Namey Master, Zankoy Selahedîn, 2000
- Mihemed Henîf, *Merahelî Xelqî Dastan*, Neşir Tehûrî, Tehran, 1372
- Mihemed Hesan Ebdûllah, *El-Rîh Fî El-Rîwayet El-Erebiyat*, Sîlsîleta Alem El-Erfet, Dewlet El-Kiwêt, 1983
- Mihemed Şerîfî, *Ferheng Edebiyat Farisî*, Întîşarat Meîn, Çapa Dûyemîn, Tehran, 1387
- Mihemed Xenîmî Hîlal, *El-Neqid El-Edebî El-Hedîs*, Dar El-Seqafet, Beyrût, Libnan, 1973
- Mîmînî Cemal Mîr Sadiqî, *Wajename Hinerî Dastan Nîwîsî*, Ketîbî Menaze, Tehran, 1377
- Mîr Celal Mihemed, *Binyatî Rûdaw Le Romanî Kurdî Başûr De*, Namey Master, 2008
- Mîran EL-wt, *Rman be riwayit Riman niwîsî*, wer. Alî Mihimmed hqşnas, mirkiz, Tehran, 1368
- Mîşal Bitul, *Bihûz El-Fî El-Rîwayet El-Cedîdet*, Wer. Ferîd Întînîwîs, Menşûrat Dar Wîdat, Beyrût, Libnan, 1371
- Monîka Wûd, *Tewsîf Dar Dastan*, Wer. Nîlûfirarbabî, Neşir, Risiş, Çapa Yekemîn, S. 1388
- Morîs, Ebû Nazir, *El-Lesînet Wel Neqde El-Edebî Fî Nezeriyet Wel Mariset*, Dar El-Nehar Lî Neşir, Beyrût, 1979
- Nansî Krês, *Texniyat Kîtabete El-Rîxayet*, Wer. Zînet Cabir Idrîs, El-Dar El-Erebiyet Lîl Ulum Lînaşarûn, Çapa Yekemîn, Beyrût, 2009
- Nasir Êranî, *Hiner Dastan*, El-Neşir Nî, Çapa Dûyemîn, Tabîstan, 1380
- Nawendî Lêkolînewey Îslamî Lebarey Roman Da, Tehran, Sûrey Mîhrî, 1378

Necim Xalid Necmedîn Elewenî, *Bînay Kat Le Sê Nimûney Romanî Kurdî da (Janî Gel, Şar, Raz)*, Dezgay Çapî Serdem, Silêmanî, 2004

Necmedîn Xalît Elewenî, *Karketersazî Le Êwarey Perwaney Bextiyar Elîda*, Çapxaneyaya Mûkiryani, 2009

Nîko Bext Niwrûzî, *Mûqaye Terhû Pîring Le Dû Menzûmey Bêjin û Menîzey Fîrdewsî Xosrewî Şîrînî Nezamî Da*, Fesilnamey Pez û Hîşekanî Ilûmî Îslamî, Daniştgeha Zehra, Şimare 178

Perês Sabîr, *Bînay Hûnerî Çîrokî Kurdî-Le Seretawe Ta Kotayî Cengî Dûwemî Cîhanî*, Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Silêmanî, 2001

Pitir Wêstland, *Enwae Destan Nîwîsî*, Wer. Mihemed Hûsên Ebasî, Portemîcanî, Întîşarat Mîna, Tehran, 1371

R.M.Albîrîs, *Tarîx El-Rîwayet, El-Hedîf*, Wer: Corc Salim El-Baedet El-Maliwî, Mensûrat Erîdat, Beyrût, Libnan, 1967

Rabirt Sikûliz, *Henase Dastan*, Wer. Ferzane Tahîr, Neşir Merkez, Tehran, 1377

Reza Brahinî, *Qise Niwîsî*, Neşir El-Birz, Çapa Çaremîn, Tehran, 1368

Rêzan Osman Mistefa, *Binyatî Le Corekanî Rûdaw Le Romanî Kurdî Başûr De*, Çapxaneyaya Sbîrîz, Çapa Yekemîn, Hewlêr, 2010

Rêzan Rehman Xidir, *Teknîkî Gêranewe Le Romanekanî Abdûllah Serac Da*, Çap. Rohilat, Hewlêr, 2012

Seît Sibizyanim, D.Mîr Celaledîn Kizazî, *Ferheng Nezariyet û Ennexde Edebî*, Çapa Yekemîn, Neşir Mirwarît, Tehran, 1388

Sîma Dat, *Ferheng Îstilahat Edebî*, Neşir Merkez, Çap. Sêyem, 1385

Sîrûs Şemîse, *Enwaa Edebî*, Neşir Fîrdews, Tehran, 1375

Sîza Ehmed Qasim, *Bîna el-Rîwayet*, Dîraset Meqarnet El-Silasete Necîb Mehfûs, El-Hîyete El-Mîhreyte El-Amete El-Kîtab, 1984

Şêzad Hesên, *Hesar û segên bavê min*, Çapa Yekem , Hewlêr, 1988

Tenya Asad Mihmmed Salih, *Binyatî şiwên le dû nimuney Romanî kurdî da ( Hêlane , Ajdîha )*, çap yekem, dezgay çap û pexşî serdem, silêmanî, 2011

Tondro Salih, *Tofet Manî Skot*, Neşir Merkez, Çapa Yekemîn, Tehran, 1379

Wer. Abdûlxaliq Yaqûbî, *Rexney Edebî û Qûtabxanekanî*, Pêşekiyek Bo Tiyorî Çarlis Brêslêr, Çapî Dûwem, Hewlêr, 2007

Wer. Cewad Mistefa, Komelêk Nûser, *Roman Çiye*, Dezgay Mûkiryanî, Çapa Yekem, 2008

Wer. Ezîz Gerdî, *Hûnerî Şîrî Arîsto*, Çap û Pexşî Nima, Silêmanî, 2004

Yemnî El-Îd, *Teqniyat El-Sirt El-Rîwaî Fî Zûû El-Menhec El-Benîwe*, Dar El-Farbî, Çapa Yekemîn, Beyrût, 1990

Yonis Ebrahim, *hinr dastan niwîsî*, neşir El-merkez, Tehran, 1369